
Bernamegeh

Dergehê Kurd û Kurdewariyê

Sal: 1 Hejmar: 1 | Kovareke Azad, Serbixwe, Bêteref û Xelkî

Ez Mecbûrî Te Me **Sedat Yurttaş**	**Wergera Pirtûka Shakespeare û Bêcidiyeta Wergêrê Kurd** **Lokman Polat**	**Sê Mêrên Rûrehman** **Ayhan Erkmen**	**Jin û Wêje** **Mihemed Hemkoçer**



LATİF EPÖZDEMİR
OCCO MAHABAD
AYHAN ERKMEN

NÎHAD GÛLTEKÎN
NARÎN OMER
MIHEMED HEMKOÇER

HÜSAMETTİN TURAN
ÇORÊ ARDA
TÊNGÎZ SIYABENDÎ

MIHEMED HESKO
YAQÛB KURMANC
MERVAN SERHILDAN

PEYAM XORASANÎ
EDNAN DOGAN
MEHMÛD BADILÎ

MEHMED DEHSİWAR
RÛMET MED
MİHEMED ERZURUM

HEJARÊ FARQÎNÎ
KURDÎ SPACE

SEDAT YURTTAŞ
LOKMAN POLAT
ÎKRAM OGUZ

ALÎ GURDÎLÎ
ELIND MIZÛRÎ
EYYUP GÛVEN

CÎHAN HESEN
EMÎN AKSÛ
PAŞA AMEDÎ

YASEMÎN ELBAN
MOUHEMED EHMED
DİLBİRÎNÊ D. MÛŞÊ

ZANYAR PAKRİST
SEYFEDÎNÊ WELEKORÎ
AZAD EKKAŞ

QENDÎL ŞEYXBİZÎNÎ
ŞEVGER ÇOLO

WELAT BAZÎDÎ
HOGIR AR

BI HUNERMEND ARMANC RE
HEVPEYVÎNEK BALKÊŞ

NIVÎSKARÎ Û XWEKUŞTIN
OCCO MAHABAD

www.arsivekurdi.org

Bernamegeh
Dergehê Kurd û Kurdewariyê

KOVAREKE AZAD, SERBIXWE, BÊTEREF Û XELKÎ

ÇAND, HÛNER, EDEBIYAT, ZARGOTIN, CIVAK, ZANIST, ZARGOTIN, KLAM, STRAN, DENGBÊJÎ, XWARIN, TEKNÎK Û BI MIJARÊN DIN.

• **Koordînatorê Gişti yê Bernamegeh Groupe:** Occo Mahabad

• **Edîtor:** Mihemed Keskîn, Cîhan Soylu

• **Qapax, Rûpelsazî, Dîzayn:** Rezan Kaya

• **Ji Bo Têkîlî:** bernamegeh@gmail.com

www.bernamegeh.org

Her nivîskar ji nivîsên xwe berpirsiyar in.



JI EDÎTOR

Merheba xwendevanên hêja û qedirbilind. Em wek Bernamegeh bi naverok û rûpelsaziyeke cuda bi hejmara xwe ya yekê ji bo çand û hunera Kurdî dixebitin. Di vê hejmarê de gellek nivîskar bi kedên xwe li ber we ne. Hêvîdar im hûn ê herdem bi destekên xwe yên xurt pişta me bigrin.

Hûn ê jî di dema xwendina kovarê de bibînin ku hinek nivîskarên me li gor rêz û qaydeya Alfabeya Celadet ku hîma wê ji berê ve hatibû qebûlkirin gotarên xwe nivîsandine. Lê hin nivîskarên me jî li gorî Rêbera Rastnivîsê ku hê niha jî tê nîqaşkirin ku çiqas rast e an jî nerast e zerar û feydeyên wî hene tunene, li gorî Rêberê nivîsandine. Mixabin tê dîtin ku zimanê me yê ku berê çiqas kêmasiyên wî hebin jî gihîştibû standartekê lê niha ev hîm û standart ji destê çend kesên ku xwestine xizmetê bikin zimanê Kurdî belawela bûye. Êdî her Kurd li gorî kêf û hişmendiya xwe nivîsên xwe dinivîsin. Ji aliyê gramer û nivîsandinê de anarşiyeke mezin derketiye holê. Hêvîdar im em xeta û kêmasiyên xwe bi lez û bez bibînin ku bi destê xwe zimanê xwe xera nekin.

Pirsgirêka duyemîn jî mixabin hîn kovarên Kurdî yên tên weşandin mîna eşîret, terîqet an jî cimeatên biçûk xizmet dikin. Zêdetirîn kovarên dost, nas û cînaran tevdigerin. Hûn nikarin di van kovarên weşandî de nivîskar û rûyên cihê cihê bibînin û bixwînin. Bi tenê reklam û danasîna çend nivîskar û aliyan dikin. Hûn ê bibêjin ku şev û roj bi hev re digerin, dixwin an jî ken û henekan dikin.

Lewma Bernamegeh deriyên xwe vedike her der, dor û kesên ku heya niha nikaribûne xwe îfade bikin. Bernamegeh XELKÎ ye ne elîtîst e. Bernamegeh platformake azad e ne girêdayî siyaset an jî sermiyaderekî ye.

Bernamegeh wek mala we di xizmeta we de ye. Kerem bikin bi hemû fikr û ramanên xwe hûn jî tevlî vê platforma azad û serbixwe bibin.

NAVEROK

3- Editor

4 - Naverok

5- Nivîskarî û Xwekuştin - Occo Mahabad

10 - Bi Hunermend Armanc re Roportajeke Balkêş - Mihemed Keskîn

13- Helbest - Welat Bazîdî

13- Ber Bi Sêdarê - Mouhemed Ehmed

14- Ez mecbûrê te me - Sedat Yurttaş

18- Evînname - Emîn Aksû

19- Jin û Wêje - Mihemed Hemkoçer

24- Dengbêj Seyîd Fadil Cizîrî

25- Wergera Pirtûka Shakespeare û Bêcidiyeta Wergêrê Kurd - Lokman Polat

28- Helbest - Cîhan Hesen

29- Sê Mêrên Rûrehman - Ayhan Erkmen

31- Heq - Dilbirînê Deşta Mûşê

31– Di Bin Siya Avê De - Hejarê Farqînî

32- Çîroka Serdestan û Qilûlikên Bindestan - Îkram Oguz

33- Şîneçivîk - Azad Ekkaş

34- Afirandin û Pêşketina Alfabeya Kurdî Kurmancî li Ermenistana Sovyetê de (1921-1991) - Têngîz Siyabendî

38- Thales, Anaximandros û Anaximenes - Çorê Arda

42– Keledoş

43- "Zêro" nevîyê êşê, ristevanê evînê Xwendinek di romana "Zêro" de ya nivîskar Ezîz Xemcivîn - Mehmûd Badilî

45- Birano..! - Mihemed Hesko (Birasoz)

45- Oxirbe ji te re - Zanyar Pakrist

46- Çima Ên Hişmend Zêdetir Xemgîn in - Yaqûb Kurmanc

48- Ditirsim (Lênûsa Dilê Min) - Ednan Dogan

48- Dayika Botî - Şevger Çolo

49- Dêrika Çiyayê Mazî - Eyyup Gûven

51- Rolê Edebiyatê Li Ser Demê Koronayê - Elind Mizûrî

52– Di Kultura Kurdî De Kofî - Hüsamettin Turan

53- Biharîstan- Seyfedînê Welekorî

54- Gula Ermenî (Gula Keşe) Evîniya Stranê - Narîn Omer

56- Hesenê Metê, Nivîskarê Deryaya Ramanan - Mehmed Dehsiwar

58- Peyvin Ku Ajalvanên Xorasanî Bi Kar Tînin - Peyam Xorasanî

60- Bextewarî, Hevaltî, Trajedî û Huner di Ramanên Arîstotalesî de - Alî Gurdilî

62- Çîrokek Li Ser Çîroka 'SOSINÊ' - Mervan Serhildan

67- Xweşî û Vegotina Çîrçîrokê - Paşa Amedî

69- Gotin û Bêjîn Di Reh û Rîşeya Xwe De - Qendîl Şeyxbizînî

71- Salnameya Gel- Yasemîn Elban

73- Siwarê Gogerçînê Tahirxanê Qelenyê - Mihemed Erzurum

74- Evdelê Zeynê û Şêx Silê Dengbêj Kerem Behsa Wan Dike - Nihat Gültekin

80- Neynik û çavên xwezaya jiyanê: Krzysztof Kieslowski - Rûmet Med

82– Hal û Merc—Latîf Epözdemîr

83– Feza Çi Ye? Kurdî Space


85- Teknolojî Hûnera Hemdem Diafirîne - Hogir Ar

Nivîskarî û Xwekuştin

Occo Mahabad

Di dîrokê de gellek kes û nivîskar hene ku xwe kuştine. Her xwekuştin sedemên cuda dihewîne. Di vê çalakî û biryara kesane de mirov di tûrika jiyana xwe de gellek raz û hestên tevlihev û nefambar vedişêrin. Em nikarin mijara xwekuştinê bi pêşdarazên beredayî mehkûm bikin. Divê baş bê fêmkirin ku nakokî û aloziyên heyî yên jiyanê xwe bi siya mirinê ve nîşanî civatê didin. Loma pirsa "Gelo çima xwe kuşt?" piştî mirinê giringiyê nade wate û sedemê. Hûn rast bibînin an jî nebînin her xwekuştin ji sedî sed mijareke şexsî ye ku li gorî mantalîte û hebûna xwe sedemên rewa û mafdar dihewîne. Mirin û xwekuştin jin, mêr, zarok, netew nas nakin.
Ramyar û fîlozofên serdema pêşîn û nûjen di vê diyarde û bûyera girîng de cuda cuda fikirîne û tevgeriyane.

Sokrat canê mirovan milk û sermiyana Xwedayan dibîne lewma ne alîgirê xwekuştinê ye lê dibêje ger mirov mecbûr bimîne xwekuştin ferz e.




SOKRAT

Eflatun jî wekî Sokrat întixarê rê û rêbazeke rast nabîne, taswîp nake ji xêncî sedemên mecbûrî.

Arîsto bi temamî li dijî xwekuştinê derdikeve. Întixarê karê hemwelatiyên bêkêr û xerab dibîne û rave dike. Li gorî Arîsto jiyan diyariyeke mezin e ku ji me re hatiye dayîn divê qedr û qîmeta wê bê zanîn. Întixarê wek emelê ehmaqan şîrove dike. Arîsto arîstokratekî ye alîgirê hêzdaran e. Bi dîtina wî, mirina xelkê feqîr û reben girîng nîne.

Epikuros ger mirov bextreş û bêsiûd be dikare bi mafdarî xwe bikuje loma întixarê çalakiyeke rewa dibîne. Li gorî wî her mirov azad e ku xwe bikuje. Epikuros giringiyê dide azadiya fikr û ramanên mirovan.

Cicero ji ber sedemên olî û civakî li dijî xwekuştinê disekine.



EPÎKUROS

Platonparêzên Nû yên **wekî Pythagoras, Plotinos** û **Porphyrios** jî li dijî xwekuştinê derdikevin.

Seneca heke mirov zehf kal be û zewqa jiyanê nemabê xwekuştinê rêyeke mafdar teswîr dike.

Albert Camus bi hêrs dipirse: "Gelo jiyan tiştekî ewqas watedar e ku mirov bijî? Wate nemîne çîrok û serpêhatiya mirinê dest pê dike." Lewma di hişê Camus de xwekuştin mijareke pêwîst û watedar e.

Nietzsche xwekuştinê erênî dibîne û dibêje: "Mirov heyîneke xurt nîne, jiyan her roj lawaziyê bi bêhêvîtiyê ve derdixe pêşberî me. Ji ber vê carinan çalakiya herî mezin, esîl û şanaz xwekuştin e.
Întixarê biryara kesên azad qebûl dike.

www.arsivekurdi.org

Schopenhauer jiyanê tiştekî erjeng dibîne xwekuştinê bi dildarî dipejirîne. Bi fikra wî ev civat bi dizî, kuştin, şêlandin û bi hezaran xerabiyan cihekî kambax, rezîl û kepaze ye lewre întixarê wek rêya xelasbûnê dipejirîne. Civaknasên serdema nûjen jî li ser întixarê ji hev cudatir fikirîne û sekinîne.

Emil Durkheim xwekuştinê rastiyeke civakî şîrove dike. Li gorî wî kesên ku xwe dikujin êdî bi civatê re li hev nayên bi zanebûn qestî canê xwe dikin. Durkheim di întixarê de siya tenêtî, bêhêvîtî û belengaziyê digere.

Kant xwekuştinê naperijîne wekî tiştekî şermdêr û kerixîner dibîne.



KANT

Javata û **Melvin Seeman** di bingeha xwekuştinê de biyanîbûna mirov û civatê dibînin. Li gorî wan mirovên modern, belengaz û tenê ne rizgarbûnê di xwekuştinê de digerin.

Li ser întixarê gellek teoriyên psikolojîk jî hene dixwazim fikrên çend psîkologan bînim ziman.

Li gorî **Sigmund Freud** ji bo mirov tişta herî girîng diyardeya zayendîtiyê ye. Freud întixarê wek sadîzmeke rihî îfade dike. Li gorî wî mirovên ku rihê wan birîndar û nexweş dikarin xwe bikujin.

Di teoriya **Erich From** de ajoyên civakî girîng in ne tehnên kesane û zayendî. Li gorî wî her mirov di hundirê civakê de dibe mirov. From xwekuştinê pirsgirêkeke civatî qebûl dike û wisa dinirxîne.

Karl Menninger întixarê di navbera jiyan û mirinê de wekî şerekî dijwar û jêneger dibîne. Li gorî fikra wî kîjan xurt be ew qezenc dike.



KARL MENNINGER

Ol û baweriyên modern jî xwekuştinê li gorî xwe rave kirine.

Ola Îslamê xwekuştinê guneheke mezin dibîne bi teqez qedexe dike girîngiyê dide jiyana mirovan. Lewma rêjeya întixaran li gorî lêkolînên kirî di hundirê Misilmanan de pirr hindik in.

Piştî ferman û nêrînên alim û mirovê dînî yên **Augustin**, **Ola Xaçpareziyê** întixarê erênî nake û nasepîne. Di serdema kevn ya klasîk de rewş hinekî cudatir e carinan Xaçperestên bawermend ji bo ku ji zordestiyê xwe xelas bikin mecbûr dimînin bi komî an jî şexsî întixar dikin. Di roja me de otorîteyên Xirîstiyanî ji xeynî **mezheba Protestanî** xwekuştinê gunehekî erjeng dibînin û napejirînin.

www.arsivakurd.org

Ola Cihûtiyê xwekuştinê wekî olên din yên sereke gunehekî li hemberî Xwedê qebûl dike. Lewma li dijî xwekiştinê disekine. Cihûtî jiyanê pîroz dibîne.

Olên wek **Hînduîzm**, **Budîzm** û **Caynîzim** li hemberî întixarê hikmên dijwar negotine û neanîne ziman. Hema hema em dikarin bibêjin ku rê dane xwekuştinê û teşwîq kirine bi kirinên xwe.

Xwekuştin bi sedan reng, sedem û armancan dikarin derkevin pêşberî me. Lê dive em fêm bikin ku xwekuştin rastiyeke civakî ye mixabin herdem dê rastî me were. Dawiya dawî nivîskar jî mirovekî/ê ye dikene, digirî, bedbext an jî bextewar dibe. Hêza nivîskar qelema wî/wê ye. Bi qelem û fikrên xwe pêşengiya civatê dike. Civat fêm neke jî ew mecbûr e rola xwe ya dîrokî bilîze û bibe neynik û ûjdana civatê. Di dinyayê de gellek nivîskarên jêhatî bi sedemên cihê xwe kuştine.

Ez ê ji xwendevanan re behsa jiyana çend niviskarên Kurd û yên Biyanî bikim ku xwe kuştine.

Dema ku behsa xwekuştinê derbas bibe nivîskar û helbestvanê Kurd **Şikoyê Hesen** tê bîra min.

Şikoyê Hesen di sala 1928an de li gundê Camuşvana biçûk ku girêdayî navçeya Axbarana Ermenistanê ye tê dinyayê. Malbata Şiko piştî şerê cîhana yekemîn ji ber qetliyama dewletê xwe xelas bike mecbur dimîne ji Dîgora Qersê koçî Ermenistanê dike. Şiko hê pênc salî ye bavê wî Hesenê Mido dimire. Apê wî Sofî lê xwedî dike.

Şiko piştî xwendina xwe ya seretayî, navîn û ya dawî di sala 1948an de diçe zanîngeha Yêrîvanê beşa ziman û zanistiyê dixwîne. Bi xelaskirina zanîngehê ve di navbera salên 1954 û 1957an de mamostetiya zimanê Ermenkî dike.



ŞIKOYÊ HESEN

Şiko di beşa kurdî ya radyoya Yêrîvanê de dest bi edîtoriyê dike û di navbera salên 1959 û 1961'an de jî karê şêwirmendî û wergêriyê dike. Demekê edîtoriya Radyoya Rewanê dimeşîne. Di sala 1961'an de bi sedema perwerdehiyê diçe Leningrad'ê û ser zimannasiyê doktoraya xwe dike. Di sala 1965'an de di Enstîtuya Gelên Asya û Afrîkayê de beşa Kurdolojiyê temam dike.

Helbestên Şiko cara pêşî di rojnameya Zanîngehê de û dûre jî di rojnameya Rêya Teze de tên weşandin û car caran jî li radyoya Kurdî tên xwendin. Şiko dibîne ku dewleta Sovyetê pişta Kurdan digire, her derfetê radixîne pêşî wan, ziman, çand, huner û jiyana Kurdan mezin û bilindtir dike ji ber vê mebestê herdem dibe alîgirê dewleta Sovyetê.

Şairê dildar, qelemhêz û hestiyar Şikoyê Hesen di sala 1976an de xwe dikuje lê hê jî sedema xwekuştina wî ya rasteqîn nayê zanîn. Gora wî li paytexta Gurcistanê ya bajarê Tîflîsê ye.

Heta mirina Şiko sê heb pirtûkên wî çap dibin. Di sala 1961an de pirtûka Qalçîçek, di sala 1966an de pirtûka Tembûra Kurda, herî dawî di sala 1970an de Meremê Dilê Kurd.
Piştî mirina Şikoyê Hesen bi navê "Perwaza Welat" û "Payîz û Ba" du heb pirtûkên wî çap dibin.


www.kurdiaki.org

Ez çiqas qala wî şairê zimanhez, helbesthez, fîdekar û jêhatî bikim dilê min diêşe. Şiko nivîskarekî wêdetir însanekî ye. Divê xwendevan bizanibin û têbigihîjin ku her xwekuştin çalakiyeke kesane ye û li gorî xwe sedemên rast û mafdar dihewîne.

Divê neyê zenkirin ku xwekuştin qelsî an jî bêhêzî ye. Ji ber ku her xwekuştin bi zanebûnî tê kirin û xwestin. Ka ji xwe bipirsin "Gelo çend kes dikare ku xwe bikuje konê xwe bar bike ji vê dinyaya fanî".

Nivîskarê duyemîn yê Kurd ku xwe kuştiye dixwazim bi we bidim nasandin ew helbestvanê zîrek **Mihemed Omer Osman** e. **Mihemed Omer Osman** di sala 1957an de li taxa Dêrgezên bi ser bajarê Silêmaniye ye tê dinyayê. Dema pola sêşemê dixwend ji ber şerê di navbera Iraq û Îranê xwendina xwe nivî dihêle. Di sala 1975an de dest bi karê nivîsandin û rojnamegeriyê dike. Carinan ji ber sedemên darayî karkeriyê dike.

Helbestên wî ji aliyê ciwanên Kurd ve pirr tê hezkirin. Ji ber helbesta wî ya Generalê Payîzê ku di dîwana wî ya Li Xurbetê cih digirt navê wî wek Generalê Payîzê hat binavkirin.




Di sala 1991an de li Şeqlawayê di Kongreya Yekitiya Nivîskarên Kurd de dibe endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd.

Berhemên wî heta niha di gellek rojname, kovar û malperan de hatin weşandin. Pirtûka wî ya Li Xurbetê di sala 2013an de li Bakur ji aliyê weşanxaneya Avestayê tê çapkirin.
Ev şairê dilgeş di sala 2019an de mixabin di mala xwe de xwe darde dike. Mebesta xwekuştina wî ji raya giştî ve tucarî nehat zanîn.

Piştî helbestvanên Kurdan divê em hinek jî bala xwe bidin nivîskarên cîhanê. Gellek nivîskarên cîhanê yên întîxar kirine hene wek mînak; Virginia Woolf, Mayakovskî, Walter Benjamin, Sylvia Plath, Cesare Pavese, Stefan Zweig, Jerzy Kosinski û gellek navên din.

Lê ez ê ji we re bi tenê qala du nivîskarên cîhanê bikim ku bandoreke mezin li ser xwendevanên cîhanê hiştine.

Parêzvanê bizava futurizmê nivîskar û şanoger **Vladimir Mayakovski** di sala 1893yan de li Gurcistanê ji dayik dibe. Bi saya fikr û ramanên xwişka xwe Bolşevîkan nas dike di 15 saliya xwe de dibe endamê Partiya Qomînîst ya Bolşevîkan. Ji ber çalakî û nêrînên xwe yên Sosyalistî pirî caran tê girtin û dikeve hepsê.



www.kurdiyavan.org

Piştî damezrandina dewleta Sovyetê ji bo pêşxistin û fêmkirina bizava Futurizmê hewl dide, dixebite, gellek helbest û tekstên şanoyê dinivîsîne.

Dostê wî yê ku jê zehf hez dikir Sergey Yesenin li Leningradê întîxar dike. Ev bûyera întîxarî dilê wî pirr diêşîne û tesîreke mezin lê dike.

Mayakovski gellek caran ji ber fikrên xwe yên rexneyî tê şermezarkirin lewma ji aliyê nivîskarên din zêde nehatiye hezkirin û qebûlkirin.

Rihê Mayakovski weki zarekî biçûk û delodîn bû. Tucarî ji aliyê derdora xwe ve nehat fêmkirin. Em dikarin bêjin ku ew mirovekî tenê bû.

Vladimir Msyakovski di sala 1930yan de bi çeka xwe ya emegdar xwe dikuje. Nivîskara duyemin ya biyanî ku jiyana wê zêde zêde bandorker û balkêş e dixwazim hinek behs bikim ku bila xwendevanên me hinekî binasin.

Helbestvan û nivîskara Emerîkî ya zarxweş **Sylvia Plath** di sala 1832yan de li Massachusettsê ji diya xwe dibe.



SYLVIA PLATH

Plath helbesta xwe ya pêşî di heyşt saliya xwe de dinivîse. Di sala 1940an de bavê wê dimire.

Ev mirin jiyana Plath tevlihev û serobino dike. Piştî mirina bavê wê tê dîtin ku Plath nexweşê psîkiyatrik ya manik depresif e.

Di sala 1950an de li Smith Collegeê dixwaze xwe bikuje lê bi ser nakeve wek birîndar xelas dibe. Demeke kurt ji ber vê bûyera xêrnexwez li tîmarxaneyê dimîne.

Di sala 1955an de li koleja Smith diqedîne. Piştî kolejê zanîngeha Cambridgeê dixwîne û xebatên xwe yên nivîskî li wir didomîne. Gellek helbestên wê di rojnameya Varsity ya zanîngehê de tên weşandin.

Di sala 1956an de bi helbestvanê Înglizî Ted Hughes re dizewice jiyana xwe li Londonê didomîne. Lê ji ber nexweşiya wê ya psîkiyatrîk ya manik depresif zewaca wê zêde dewam nake mêrê xwe berdide jê vediqete bi zarên xwe re bar dike cihekî din maleke kevn û erzan kirê dike.

Di sala 1963yan de ji ber jiyana xwe ya feqîr, belengaz û dijwar zarokên xwe di odeyekê de kilît dike berê xwe dide mitbaxê serê xwe dixe hundirê firinê bi gaza firinê xwe dikuje.

Hûn jî dibînin ku xwekuştin rastiya jiyana cîhana me ye. Helbet gellek sedemên xwekuştinê hene: Sedemên psîkiyatrîk, felsefîk, olî, civakî, îdyolojîk, ekonomîk û yên şexsî.

Sedem her çi bibe jî ev tercîha kesan e. Hûn bûyer û rastiya xwekuştinê qebûl bikin an jî nekin ew ê herdem her roj şopa xwe bi siya mirinê ve derxe pêşberî we.

www.arsivakurdi.org

Bi Hunermend Armanc re Roportajeke Balkêş

Mihemed Keskîn

1. Niha bawer im xwendevanên me meraq dikin gelo Hunermend Armanc kî ye çawa jiyana xwe didomîne.


Ez di sala 1960'î de li Omeryayê gundê Herbê hatimê dinê, Omerya herêma di navbera Masertê (Omerlî) û Nisêbînê dikeve ku girêdayî Mêrdînê ye. Di sala 1970ê de em derbasî Îskenderûnê bûn û mala bavê min, hê jî li wiran e. Ez piştî salên 90î derketim ji derveyî welat û li Swêdê bi cîh bûme. 20 sal e bi karê bernameyên TV'yê mijûl im û di heman demê de karê hunerî dikim.

2. Gelo li gorî we rewşa muzîka kurdî ya îroyîn çawa ye?

Gellek helwest hene û di heman demê de di hemî rengê muzîkê derdikevin pêş, ev gellek hestê mirov pêş dixe û wek tê zanîn hunera kurdî ne tenê bi kurmancî ye, lê em dikarin bêjin bi hemî zaravayên din jî, pêşketinên baş hene. Lê ger ku mirov bi çavê rexneysî temaşe bike, helbet bi xwe re gellek kêmasî û tevlihevî jî tîne.

3. Em dibînin gellek hunermendên civan û ji ber bêderfetiyê nikarin deng û awaza xwe bigihînin





civatê, nikarin klîbekê bikşînin û xwe bidin nasandin. Bi we divê çi bikin ku xwe bidin nasandin.

-Ez baweri m ev dem ev pirsgirêk hatiye çareserkirin, ji ber ku niha tora civakî (sosyal medya) gellek derfetên baştir dide ev jî lê nû, li ser Youtube û malperên din bawer bike niha temaşevan û guhdar zêde bûne, ji ber alternatîfê zêde li pêşiyan wan hene. Di kanalê TV'yê de huner li gorî sîyasetê tê meşandin.

4- Gelo çima şîrketên muzîkan an jî medyayên sereke yên kurdan ji xêncî çend hunermendan cih nadin wan civanên zîrek. Hûn medyaya kurdî vedikin her meh her sal reklam, xeber û roportajên eynî kesan hene. Çima herdem eynî rûyên naskirî ser medyayên kurdî ne. Hûn vê rewşê çawa dinirxînin?

-Min li jor jî, hinek vekir. Baş e ku tora civakî li pêş ketiye. Niha derfetên hunermendên ciwan an jî,e m bêjin nû, bêtir heye.
Mixabin mirov dikare bêje sîstemek hatiye avakirin, û hunermendên nû, nikarin bi carekê re derkevin pêş, helbet mijarek gellek berfireh e rastî,ez naxwazim bibe polemîk, dibe kû şaş bê fêmkirin.

www.arsivakurdi.org



5- Em dibînin asîmîlasyon û oto-asîmîlasyoneke mezin heye çima kurdên me li zimanê xwe xwedî nakin. Bi we li dijî asîmîlasyonê muzîk dikare roleke çawa pêk bîne?

Dinya îro li ser teknolojî û dîjîtalê tê dîzayn kirin, Medya sîyaseta herî sereke dimeşîne. Di sala 1995'an de gava yekemîn kanala kurdî Med Tv. Dest bi weşanê kir kurd jî, fermî ketin nav vê sîstemê û biryarek gellek hêja û di cîh de bû. Lê mixabin her kuteknolojî li pêş ket, her çiqas kanalê kurdan zêde jî bû, lê li hemberî kapitalîzmê zêde nikarin li ber xwe bidin. Ji ber ku sedema yekemîn hemî kanalên me dibin baskên sîyasetê de ne,yan dî, kanalê dunyayê,bi reklam û bi sponsorê gellek mezin jîyana xwe didomînin. Ji bo Kanalên kurdan ew derfet tune. Bernameyên ku ji bo ciwanên îro bikarîbin xwe tê de bibînin pir kem in. Dîsa zimanek dibê ji mal dest pê bike. Mixabin ruhê me kurdewarî ye, lê mejîye me yê dagirkeran e. Jixwe ku beravajî vêna ba, niha her çar perçe rizgar dibû. Em aşiqê zimanê dijminê xwe ne. Heta carna jê, ji bo wî zimanî em ji wan xweştir biaxivin, em zêde xwe diwestînin. Ji xwe ez dikarim bêjim yê ku rola xwe dileyîzîne muzîk e. Ji TV'yan bêtir Hunera Kurdî bala gel dikşîne.

6- Em dizanin we demek karê dublajê jî kiribû. Gelo karê dublajê zor e yan na?

Karekî gellek bi wate ye, bawer bike ewqas mirov li pêş dixe mirov nikare bi tiştekî din re bide muqayesekirin. Helbet ez ji bo kesekî ku bi xwaze zimanê xwe li pêş bixe ez dibêjim. Dibe mirov bi rêk û pêk bimeşîne, Loma jî, rola rêvebirê dublajê gelek girîng e.

7- Ez carinan televizyonên Bakur vedikim xwe bi xwe dibêjim çima fîlmên biyanî nayên Kurdîkirin çima kurdên me hesreta fîlmekî ne. Televîzyonên kurdan şev û roj bi propaganda û ajîtasyon re mijûl in. Gelo hûn vê rewşa medyaya kurdî çawa dibînin?

Me gellek carî hewl da. Yek mafê telîfê yê fîlmên nû budceya (butçe) kanala me têr nedikir, yan dî fîlmê ku tu hilbijêrî ji aliyê revêbiriyê ve, wexta tê hilbijartin li naverok û konsepta wê dinêrin, çiqas li gor sîyaseta me ye, wê demê gava tu li erzan bigere û bijarebe, tu çiqasî dublajek xweş çêbikî jî, cîhê xwe nagire.
Loma jî, Medya zêde derfet bi dest naxîne. Niha dinêrim qanaleke bi navê Ava Tv dest pê kiriye, lê nizanim çima bi xwe çênakin û tenê rêzefîlmên Tirkan Dublaj dikin, ger bi rastî ji bo gel bixwazin tiştekî baştir bikin û derfeta wan ya Aborî heye, dikarin gellek alternatîfên din biafirînin û li hemberî helwestên hişk jî, namînin.



www.kurdiyakurd.org

8- Hûn jî zanin di nava Kurdan de çanda rexnekirinê tune. Hûn mijarekê rexne bikin ya we dikin bênamûs, xayîn yan jî heqeretên curecur dikin. Di vê meselê de fikrên we çi ne gelo? Kurdên ku ji sibê heta êvarê demoqrasiyê dixwazin çima rexnekirinê wek sûcekî dibînin?

Ji kurdan bêtir em bêjin, rêxistinên sîyasî . Hûn jî dizanin yekemîn hevoka rexne û rexnegirî di nav hêza PKK ê de dest pê kir. Ez jî bi xwe bi salan e di nav dezgêhê vê rêxistinê de kar dikim û wek sîyasî jî, bêtir nêzîkî xwe dibînim. Di her rêxistinê vê haraketê de civîn çêdibin, di van civînan de hemî hevalên ku beşdar dibin li hemberî hev ku pêwîst be, rexneyên gellek dijwar dikin û di wê civînê de her tişt çareser dibe. Lê mixabin ev demokrasî ji bo kes an jî saziyên ji derve tune ye. Kes an jî sazî gava tiştek PKK rexne dikin, li hemberî xwe gellek helwestên tund dibînin û li gorî min şaş e. Gellek carî li hemberî min jî ji aliyê hinek kesan nîqaşên sîyasî tên vedivin, lê ez gellek bi hemd li tev digerim, ji ber ku ez li xwe rêxistina xwe ji warê teorî be gellek serdest im. Ez ê çima hêrs bim? Hêrs bûn karê nezanan e.

9- Gava mesele û mijar Kurdên me bin meriv mixabin diweste. Gelo Kurdên me divê îro çi bikin ku pêş bikevin?

Mijarek gellek berfireh e, pirtukek têra vê pirsê nake. Tenê hemî kesayetî, sazî û rêxistin dibe li





hemberî hev bi tolerans bin, em vê li pêş xînin. Bala xwe bide dagirkerên kurdistanê hemî bi hev re di bin re şer dikin, lê ku mijar bû kurd û berjevendiyên kurda di 24 seetan de dibin birayên hev û civîn li ser civîna li dar dixin. Em Rêxistinên Kurd yekemîn em ji hev ne razî nin û ya herî xerab dijminên me ewqas bi dest û lingên xwe ketine nav me (ajan) di gellek mijaran de em nikarin serbixwe tev bigerin.

10- Roportajeke pirr xweş bû spas dikim bo we. Hûn dixwazin wek dawî çi bêjin ji xwendevanên kovarê re.

Gelê kurd hûn çi ol, çi zarava, ji çi herêmê bin, ji bîr nekin hûn berî her tiştî kurd in. Û dîsa ji bîr nekin hemî sazî û partîyê me yê çêbûne ew qebûl bikin û nekin, hûn herdem rexnê xwe bikin lê di heman demê de çalak bin ne tenê li ser tora medyayê. Alîkar bin li xizan û fêqîrên xwe, rê nedin ji bo dijmin bi dilê xwe bi me bilîze. Ez Ecem,Tirk û Ereban gellek baş dizanim. Di vê roja ku em bê dewlet in jî, bawer kin em ji wan gellek bêtir şareze, zana û jîrtir in. Xwe kêm nebînin li her qada ku hûn lê dijîn her yek ji we bila mîna sazûmankarek, serokek, rêxistinek û welatparêzêk gelê xwe be. Em dikarin bi wan lê, tenê dagirkeran bi sedsalan e di navbera herçar perça de sîstemek û sînorek xwe danîne. Perçekirina wê hinek zahmet e. Hemî ev e pirs girêk.
Ji kovara we re ez spas dikim ji bo vê firseta we da min, serkeftin ji we re dixwazim.

www.civaka-azad.org



Dema Dayik rondikên xwe
di landika hêvîyan de dilorînin
û li ber bayê payîza welêt
xewnên xwe dihêrin û dibarînin…!
wê çaxê evîna te …
di dilê min de hişyar dibe
û ez li ber pêlên lehiya hêsirên dayikan
roda diçim
Welatê min..

Diçim ji vêderê
Hinek hesret
Hinek xem
Hinek bendemana te
Hinek nehatina te
Hinek bêdengiya te
Hinekî ji te
Hinekî ji xwe
Hinekî ji me bi xwe re dibim û diçim.

Were
were eger rojekê tu hatî
bila keskesor
xwe li bedena me bipêçe
bê sînor.
bila şalûl û bilbil
stiranekê ji himêzkirina
min û te re bistirên
tenê li hember min rûnê
kêlî bi kêlî temenê min bidize
bibe perestgeha evîna xwe
bike şaneşîn ,
Tu tê da bibe gul,
Ez jî bibim gulîstan.

Welat Bazîdî



Ber Bi Sêdarê

Li keştiyekê siwar dibim
Di şeveke ezman sayî de li kolanê ji
stêrkan semayekê dardixim
Nikarim navê te bêjim Ditirsim qaqlîbaz
navê te li ser lêvê min birevînîn

Ji keştiya xeyalan dadikevim
Ber bi
sêdarekê ve dimeşim
Û dibêjim
Xwezî! min berdana lêvên te ye di nav
lêvên min de hêsîr mayî bi tu tiştî
nepejiranda

Sêdar nîvfetisî min davêje
Sêdar jî min bê te qebûl nake berxê

Bê te mîna demjimêra bi dîwar ve li
maleke bê xwedî lêdilim
Ji qehran rûyê xwe parçe dikim
Xwezî min tu nehêla porkurê

Dizûrim ji navkelîbûna xwe
Mirin jî min naxweze bê te canê
Kesekî ehil'îman jî tune niviştekê ji te re
çêkim
Li serê xewnan jî tu tune yî
Bi dereweke bedew jî min nikaribû tu li
ba xwe bisekinanda
Çiqas dem bihurî min nikaribû tu jibîr
bikira nikaribûm.

Mouhemed Ehmed

Ez mecbûrê te me
Sedat Yurttaş

Ez, pişt nîvro û bi hemû dirêjahiya şev a reş li benda xeberek jinikê sekinîbûm. Tû xeberek jê derneketibû. Pêsanîya di nava serê min de derneketibû. Heçkû di danê sibehê de, jê re, her çiqas saet ne belî buya jî, min çûyîna xwe ya bajarê wê qutebir gotibû. Ger nehatinek min biqewûmîya jî, dê miheqeq min xeberek bidaya wê. Lê him neçûm û him jî min tu xeberek nedabû wê. Min bi vî awayî, li gorî xwe haleke nediyar ava kiribû û hêvî kiribû ku dê jinik neçar bimaya û li min bigerîya. Sekna min, hêvîya xeberekê mizgînîya evîn ê bû. Lê sekna min bê bergîdan mabû.



Hinek qûrnaziya şerqî û hinek jî di esasê xwe de, bi bêhna helwesta vê bêrêtiyê, min hêvî kiribû ku careke din ez û jinikê bikaribin bi hevre têkiliyên xwe raxin ber çavan û bi vê rê ya xapînok bikaribin bi dor firehî, her tiştî dubare, sêbare bi hevre biaxivin. Hevî tezekirina axaftinê û hêza a hezkirin ê evîn bû.

Nebû. Hewla min vala derketibû. Serobinî bûbûm. Wisa têkçûbûm ku ji jinikê xeberek ji rêzê jî, dê ji bo min di qîmeta ava jiyanê de bû. Lê li min negeriyabû û jî, ji min re peyamek jî neşîyandibû. Wisa xûyabû ku hest û helwesta min, bi qasî mîsqalekê jî, jê re ne xem, ne derd û ne jî bar bû. Bêxemî belkî hinek hezkirin lê ev tu ne evîn bû.

Jinikê bi helwesta xwe, têkiliyên me ên ku pir li cihekê jî rûneniştî, dikaribû biqedanda û bi biryardariyeke mezin î bêqisûr nîşan bida ku hemû têkiliyên xwe ji min û ji bin ve bibirîya.

Ev hal ji bo min bi mane ya xwe ya gotinê, kerasatek rasteqîn bû. Bi bêhntengî û bi kabûsan ve tijî pişt nîvroyek, êvarek dilzîz û şevekê dirêj î bi nalîn şûnda, hal û hewala min ber bi ya herî xerab, bi nediyariyek bê hezkirî û bê evîndarîyê ve diçû.

Di tevahiya wê waxtê de, min qîma xwe pirî caran bi kontrola telefona xwe ya peyaman neanîbû û ji bo tedbîr facebooka xwe jî, ne ji peyik, ji ser browserê kontrol kiribû û sekinibû. Car caran jî bi hêviya rakirina wî ya astengkirina facebookê li qutîka lêgerînê nav û paşnavê wê bi lezgînî û bi elimandinî zûtirkê nivisandibû û di hê cihê vala da lêgeriya bûm. Dihate fahmkirin ku cihê min ê di lîste ya redkirinê de, nehatibû guhertin.

Mîna ronkahiya rojê li rastê bû ku, jinikê têkiliyên xwe û di nava min de, heye ku tu çênebûbû, qedandibû. Bêtêkilî bêhezkirin û bêevînî. Jinik bi biryardarî ji min dûr disekinî. Ji ber vê yekê min, serê sibehê heya ku dest dida zû, berovajiya her rojê, ji xwe re neskafeyek bi şîr çênekiribû û venexwaribû. Bi bayê bezê, xwe ji mal avêtibû der. Heye ku, ji fetisandinê filitibûm.

Ez serî di berde, li erebeya xwe siwar bûbûm. Berîya ku kontaxa erbeyê biçerixînim, careke din min li “whatsapp” ê mêze kiribû. Gelo, jinikê mîna ku demek dirêj bû, her sibeh ji min re “Rojbaş” dinivisand, heye ku careke din nivîsandibûya. Nivîsandin hezkirin,

nivîsandin evîn bû. Lê an. Whatsappê jî serê xwe kribû ber xwe. Lê min, dîsa jî mîna ku j imin re peyamek ahtibe jê re mesajek, bersîvek nivîsand.

"Rojbaş xweşikbûn!"

Mesaj, di tewrê têkiliyê me de, ber bi nezanînê ve şîyand. Bi bayê sibehê re birê kir.

Di pêy mesajê re erebe şixûland. Giran giran bi rê ketim. Ji aliyekê de guhên min, bi hatinek mesajekê re xwe bel kiribûn û li aliyekê jî bêdengiya dirêj î kûr û tarî guhdarî dikirin. Hedûrî nediketê min. Bi navberên pir kin, li ekrana peyaman, di cihê vikîvala da dinihêrîm.

Sekin jî, nerîn jî û hêvî jî bê encam bû. Rewş yekser li ser neyînî yê bû. Mîna ku jinikê çend roj berê ji min re nivîsandibû "Bi xatirê te!" û deriyê ku her dem jê min re li ser pişte vekirî, yê whatsappê xirp û hatibû girtin. Min dengê çerixîna kilîtê bi guhên xwe bihîstibû. Lê dîsa jî min bi xwe nikarî bû. Bi sekna xwe, bi gurpîna dilê xwe, bi hêviya xwe nikarî bû. Lê demjimêr, her dibihûrî.

Ji bo min, dinya bi carekê de bêmane bûbû. Ku bi piranî min erebeya xwe bi kêf diajot, ajovaniya xwe mîna cûreyek azadîyê, mîna xweserîyek cihêreng hîs dikir, wê sibehê ji bo min berovajî bûbû.

Rê yên ku jê derbas dibûm, derdor, dar û ber, avahî û pir, ezman û ewir û hemû tiştên ku li ber çavên min diketin ji naveroka xwe vala bûbûn. Her tiştên dorê dagerîbûn heyokên maneyên xwe wenda kiribûn. Bi tenê bi elimandinekê, erebeya xwe di nava bêdengiyek mezin, kûr û dip î dirêj de ber bi cihê xwe yê kar ve diajot. Lê mîna ku ber bi nezanînekê ve biçim. Min nedizanibû ku ve diherim û dê li wêrê çi bikim. Gelo min ê destê xwe li ser badokê bihişta an danîya ser vites ê. Porê xwe tevda, an rihê xwe bixûranda. Xweziya tekira xwar, an cam vekira û sînga xwe bida ber bayê sar. Di wê kêliyê de, destê min, bêyî iradeye min dirêjî bişkoka radyoyê bû. Mîna ku hinek ji min re bibêjin:

"Tu çi sekiniyî. De veke wê quzilqurta radyoyê!.."



Min, bi tevgerek heytehol radyo vekir û bi heman biryardariyê dengê wê bilind kir. Ji hoperloran dengê Samîme Sanay'a ku di rengê sûlavkê de gûr û zîz bilind dibû û bi heman xweşikahî û hestiyarîya xwe ve hundirê erebeyê tijî kir. Camên erebê û canê min bi hevre lerizî. Kelecan û coş û girûzî li laşê min belav bû. Helbest a navdar, ya Atilla İlhan "Ez mecbûrê te me, nikarî bizanîbî" bi meqamê "Nîhawend" de li ser derd û kulen min bi nalînan venişt.

Şaşî û dilxweşî di nava hev de bû. Kilamekê, şiîrekê, dengekê, awazekê ew û ruhê wî min ê şikestî, encax ewqas dikaribû fahm bike. Vebêje û ewqas pê re hevbeş be. Fahm kirin hezkirin, fahm kirin evîn bû.

www.kurdishakuracademy.org



Ji aliyekê de, gotinen helbestê hûzna, valahî û bîrkirina hundirê min yekser mezin, ji aliyekê de jî watedar dikir. Gotinên helbestê çend caran li pêy hev bi dengê bilind dubare kir şûnde bi lezgînî ji telefona erebeyê pê li bişkokên nimreyên telefona jinik a dilreq, xweşik, delal, xapînokû û xeyîdok kir.

Ax ger jinikê bersiva telefona min bidaya, telefona xwe vekiraya (!) dê bêsekin bi qasî ku helbest di bîra min de bû, dê jê re bi dengê xwe yê herî bikeser, şikestî û hewcedar bixwenda. Ji dûr ve bûya jî, dê min jê re mîna ku li ber wê cûnnî şikandibe, çok dabe, bê şik bi çavên xûmam, bi dilê xwe yê birîndar jê re serenat bikira.

"*Ez mecbûrê te me, nikarî bizanibî*

Navê te mîna mixekê di aqlê xwe de digrim
Çavên te mezin mezinî dibin.
Ez mecbûrê te me nikarî bizanibî
***Hundirê xwe bi te germ dikim …*"**

Encax di telefonê de sosretiyek hebû. Mîna ku telefon qet li alîye hember negere, bêhemdê xwe, bê îşaretek ji xwe bere bi dawî dibû. Tu dengek tunebû. Çend caran ceriband şûnda, bi bêhêvitî dev ji gerê berda.

Dihate fahm kirin ku di axaftina me ya herî dawî de, jinikê çawa ku ji min re gotibû "Ger tu careke din ji min re peyamekê biavêjî ez dê nimreya telefona xwe jî biguherim!" û wisa xûya dikir ku, gef û gura xwe xwe bi cih anîbû.

Jinikê, tişta ku herî bêîmkan dihate xûya kirin, di sînorên herî tûj de helwest nişan dabû.

Li ser vê îhtîmalê min bixwe bixwe re; "Baş e, lê min hîç jê re peyamek neavêt ku!" bi dengeke nizm î bêçare gote.

Di pêy qedandina kilamê re, di destê min de bi tenê girtina radyoyê mabû. Bi dilgiranî bişkoka radyo yê girt.

Rê ya kin a ku diçû cihê min ê kar, wê rojê mîna ku wê qet neqede wisa dirêj dihat. Ne ji biharê, ne jî ji rohnkayiya sibeha xweşik a wê sibehê hayedar bûbûm.

Dema derbasî ofîsa xwe bûm, min nedizanî bû e-mailên xwe jî li min asteng kirîye an na. Ger binivîsim, dê bigihîje ber destê wê an na. Lewra li cihê mijara maîlê: "Bi rastî ez nizanim ev maîl dihê bigihîje te an na!" nivîsand û tiştên ku wê sibehê min jiyabûn bi dor firehî, lê bêyî ku nivîsê rast bikim jê re şîyand.

Heman maîl şiyand û hem jî heman peyam şîyand whatsapp'a û sms'a wê. Bêyî ku li hişyarîya sînorên peyvan mêze bikim, hemû tikand in.

Di pêy mail, wathsapp û mesaja sms'ê, bi hestên kûr ên bi xwe heyf anînê hêdî hêdî pê li bişkokên nimreyên telefona wê kir. Du carên ewilî mîna dengê ku di erebeyê de bihîstibû, bêbersîv, valahîyek û tarîyek bihîst. Di ya sêyemîn de qêriyam "Xwedayo!" bi şaşwazî û şahî min fahm dikir ku telefona wê lê dide. Min nefesa xwe kûr kûr girt û da. Çend caran li ser hev min bi zimanê xwe lêvên xwe şil kirin. Hîn şaşiya min a bi şahî derbas nebûbû ku jinik, bi hemû zindîtiya xwe û bi awayekî ji xwe bi bawer û bê paxaf;

"Fermo!" got û telefon bersivand.



Min çavên xwe girtin. Nefesek kûr î din girt û da der. Bêyî ku bizanibim peyamên min xwendîye an na, zêdetir ji aliyekê dirêjî kompîtura xwe ya ku jê dengê kilama wê sibehê hîn bilind dibû, gotinên wê mêze kir. Bêyî biaxifim, bêyî ku bifikirim, bêyî ku sînorekê têxim navbera xwe û wê, bi hemû coş û dilzîziya xwe min dest bi xwendinâ helbestê kir.

Risteyên çarîna pêşin li pêy hev xwend. "Fermo" ya jinikê bi îhtîmalek mezin ji derveyî sekna wê, heya dikare ji adetan der dihate bersivîn.

Lê jinik, tiştên ku dijîyam, ji hiznê ta bihecînê, ji kelecanê ta coşê, ji şaiyê ta fahm kirine, di dawiya dawiyê de heye ku aşîtîya navbera me de xelisandina têkiliyê bi dilreqî tahn da alîyekê, bêyî ku qiymetekê bide hewl û hêvîya min bi dengeke tije gef û gur:

"Li min siyê neke bes e! Ji te dûr bi têra xwe aramim." got û hevpeyvîn qedand. Telefon li ser rûyê min girt. Xalek tund danî ser dawiya têkiliya min û xwe. Xalek tunda danî ser hêvîya min a hezkirin û evîn ê.

Ax, ew rê ya ku bi berjêr û berjor, ji keserê ber bi bihecînê dere!
Ax, ew şiverê ya şemitok a ku ji kelecanê ber bi coşê hildikişê!
Ax, ew baxê peywên belawela ku ji şaşiyê dirêjî pê fahm kirine dibe!
Ax, ew arezûya ku ji şer daxwaza aşitiya çîqila ziravok a zeytûnê dike!
Ax, ew bi destê xwe yên berepaş wêda kirin a ku mîna kevir li ser dil rûdine!
Ax, ew li ser eynî xwe negirtina ku di nava kelîyan de li atoman belav dibe!
Ax, ew sekna nafîle ku di qirikê de tahlek jahrîn dihêle!

Di destê min de telefona ku ji alîye hember, ji alîyê jinikê ve xirp û hate girtin:

"Gelo mirov dikare çend caran hilweşe?"


Bixwe bixwe bi dengeke nizim pirsî. Tiştê qutebir, ez careke din bi tevahî hilşîyayî, rûxîyayî bûm.



SEDAT YURRTTAŞ

Sedat Yurttaş di sala 1961ê de li Amedê hate dinyê. Dibistanên seretayî, navîn û lîse li Amedê xwend. Di pêy mezûniyeta "Fakulteya hiqûqê ya Zanîngeha Stenbolê, li Amedê dest bi parêzerîyê kir. Di hilbijartina giştî 1991an de, ji kontenjana Partiya Ked a Gel HEPê di (Partîya Sosyal Demokrat ya Gel) SHP bû parlamenterê Amedê. Hate girtin û darizandin. Şanzdeh mehan di hepsê de ma. Ji damezrîner ên PENa Kurd û endamê PENê ye. Li Amedê dijî û hîn dinivîse.

EVÎNNAME



Hişsen'anîyekî beytbeyhûde me

Di cehenema dil'aran de

Xwelîya meytê xwe berhev dikim

Li şevînên berfînan

Bir bi bir kerîyên êşan diçêrînîm

Li nizarên awirrûxandî..

Lew dev ji min berde birînê

Hew dikarim bi rondikên şewitî

Te li ser darbesta nefesê bigerînim.

Zindanîyekî bêwelat im

Li binê bîrên di çolên devê maran de wendayî

Mîna Yusifê Ken'anî

Ez û bîr û dîwar û mar

Ro hilnayên ji axa sar

Nû fêhm dikim jana Zuleyxaya bê bînahî

Lew li min heq e

Jehra devê marî

Û heyateke beytilşe li ber vî dîwarî..

Di çîrokên li ser devê dengbêjên Botanê de

Nalîna stranên Zînperest Mem im ez

Çend temen, çend xortanî

Min di çemên bêbextîyê de fetisandin nizanim

Lew min girî ji dilê Bekoyan jî anî

Tu bawer nekî vaye bê dengîya Dîclê

Û reşgirêdana Birca Belek..

Zinar bi xwînê dinivîsin navê min

Li qedera enîya karxezalan,

bi bîna zilf û xalan Siyabend im.

Minminîkên mirênê

hêsirên Xecê dikişînin birîna min.

Lew li min gor e îro

Ev çiyayên spîxemîlîn li ber çavên min.

EMÎN AKSÛ

www.arsivakurdi.org

Jin û Wêje
Mihemed Hemkoçer

Dema em dibêjin: jin, yekser hişê me diçe ser dayikê, xayîg û xûşikê, yar û dîlberê, û ew jî ku eger bi dik bêne şîrovekirinê, helbet wateyên wan ên herî mezin jiyan, jîn, dayîn, evîn û heyîna me ya li vê dunya fît û fereh e.
Û dema em qala wêje jî bikin, helbet tevî hindik em çêra roman, çêrok, helbestê dikin, û ji van herdu gotinên ku me kirine navnîşana gotara xwe û me pir bi kurtî ew dane nasîn, me xwest ku em deriyekî ji dergehên mezin ên folklora gelê Kurd li Efrînê - çiyayê Kurmênc- li rojavayê Kurdistanê, yên ku hêj mendelkirî, liçerp û bi kilît, em ji wan deriyan, deriyekî vekin û em guh û bala xwe bidinê ka gelo çi di paş wan dergehan de heye!? an jî em binihêrin ku çavên me çi di wan qonaxan de dibînin û kêl dikin!?

Tevî ku ev babetên em qala wan dikin hêjayî pir lêkolîn û şopandinê ne , lê li vir em ê wek agahdariyek piçûk û nîşeyek e girîng bidin xûyakirin û diyar bikin, daku em mafê jinan biçesipînin û rişme û mora wan a hunerî em winda nekin û nedin piştguhxistinê û biparêzin û nebin gunehkarên wan.

Û eger em çendî pesna jinan jî bidin û kar û barê wan ê ku di jiyanê de wan hilgirtiye , ger em bidin xûyan û vekolin jî, sedî sed em nikarin ji bin barê wan derkevin û ne jî em dikarin mafê wan bi cî bikin û wan ji xwe razî bikin ! lê li vir, em ê li ser kar û hunera jinek ji jinên kurdên Efrînê yên ku folklora me xemilandine, em ê nimûneyekê ji wan bînin ziman ku çawa di çand, wêje, huner û dahînê de rolekî girîng û balkêş lîstine û dîroka me pê zengîn kirine û herwiha bandora xwe gihîştiye kîjan asteyê !?

Leheng û dahînera babeta me jinek bi navê Naza Menên e, ji gundê Şerra, navçeya Efrînê, Çiyayê kurmênc, Kurdaxê, Rojavayê Kurdistanê. Hevjîna Ehmed Axa yê Omer Axa bûye, bûyer û qewmîna vê dastanê Gundê Hemamê bûye, Hevdil û hevbengiyê xwe jî Gênc Osman bûye, Gênc Osman jî ji Sîwazê bûye, xudî leşker û Urdiyekî bi nav û deng bûye, çawa dikeve bin bandora evîna Nazê û jiyana wan tevlihev dibe, em ê di vê sitirana ku Nazê bi xwe afirandiye de , em ê binihêrin ka gelo dahîna jinan gihîştiye kîjan pileyê !?

Piştî afirandina vê stiranê û xweşikbûn û navdengiya wê, ev kilam bi rêya berderê Nazê dighîne dev û zimanê xelkê û hêdî hêdî dengbêjan ezber kir û li dîwanan nav da, ta ku bû folkilorekî hêjayî parastinê.
Sitran bi Navê Gênc Osman e û pir dengbêjan ew lorandiye, lê min ev beş ji devê dengbêj Bav Seleh wergirtiye.



GÊNC OSMAN Û NAZA MENÊN

Lê anê....

Lê anê bejin balavê Gêncê min zirav e

Lê dayê bejin balavê Gêncê min zirav e ji tayê nêrgizê

Êlkana firqeta bayê eşqê lêdixê diçelqê û dihezê

Ne mila xuva bihata li kuderê ne li kuderê..lê anê li qeza xetayê li ber pêla deryê û dengizê

Ne Gêncê min î bi rê ketî ji welatê dê û bava ji Sîwazê



Erê.....

Hele rojikê ji rojê rebî alemê tu balê xwe pêde li halê min bilmezê

meraqê dila li mera dixê bi eletê bi merezê

hele rojekê siwar be li hespê çal, tu vê nişana teresên Tirkan û Osmanliyan bêxe ji omizê

Siwar be li hespê çal li hêteka çayê me yî Kurda, ez ê bibêm Gêncê min î bûye mêvanê min tolê..min tolqizê...lo lo lo lo

Êde bajo Gêncê min bajo ..law law law

Lê anê..

Lê anê bejin balavê Gêncê min zirav e

Lê anê bejin balavê Gêncê min zirav e darek ji darê behîvê, şivek ji şivê beyamê

Ne mila xuva bihata li kuderê ne li kuderê.. li hembera deşta cûmê, li pozê çayê Bêriqdêr, li pesarê qudret Hemamê

Ne min bala xwe dayê li bejinê, li balavê, li yardamê

Bejin balava Gêncê min li hev e mîna şiva îmamê

Erê min bala xwe dayê di ber pişta Tereblûsê re dibirûsê kalana qamê

Gêncê min kê devê xwe bigerînê welat û memleketê xerîba û bajarê şamê

Min go te devê xwe gerand welatê xerîba mekev bajarê şamê

Tu kê li ku bêlê min karê, min mekirê, min belayê, min telamê…

Ê de bajo Gêncê min bajo bajo rêdûrê min bajo

Lê anê..

Lê anê bejin balavê Gêncê min dîsa zirav e

lê anê bejin balava Gêncê min dîsa zirav e

Ji darî ruman û rumbaza

Ne mila xuva bihata li serê çiyan û li gaza

Ne bila anê..rojek hilata ji kul û kedera dilê min û Gêncê min re

Mila lêxista li serê Serhedê ez bi qurbano li nav sendelê berfê li gebaza

Bila anê.. ji wê bi şûnda lêxista li kuderê ne li kuderê ..lê anê bila lexista li çemê Diclê û Xabûrê di ber re bihata dengê qamûş û saza

bila ji wê bi şûnda lêxista li kuderê ne li kuderê li çelîka deşta Sirûcê li taqimê Kîka, Kêtika, Dudyan û Beraza

Lê anê bila ji wê bi şûnda lêxista li kuderê ne li kuderê, li Feratê bêrecikê di ser re bihata dengê qulingan û qaza

Bila ji wê bi şûnda derbas bikira hêteka çayê Kurmênc ciyê dîlbera, bilmeza esmera, zeriyan û gerden gaza

www.arsivakurd.org

Lê anê..

Lê anê bila derbas bikira bajarê Diyarbekira şewitî ciyê mêran û mêrxwaza

Ne mila ji wê bi şûnda lêxista li qerma Qereşdaxê li taqimê Dumilya, Koçera û zaza

Bila derbas bikira bajarê Istanê, li bajarê Istanê, li Istembûlê lêxista li taxa heraca, nerinda, fesata, bêbexta, Anadoliyan û canbaza

Xwedê xerakê dînê danînê mala xêrnexwaza

Gêncê mino li me re dihermînin bextan û miraza

Erê mila miraz hazira bikira, xwedê mirazê me herdu aşiqan û bilmeza

êvarek ji êvarê çarşemê



êvarek ji êvarê çarşemê bila li ber serê min û Gêncê min bihata dengê ruman û dumbilbaza

De bajo Gêncê min bajo bajo..

Havîn e..

Havîn e Gêncê min havîn e

Havîn e rêdûrê min havîn e

Havîn e havîna me bi tîn e

Eza bi birîn im qanad û piyê li min şikîne

Birînê min li min zengirîne

Dinya dêdigê felek e, felek jî xayîn e

Ez bi qurbano tiştek ji me re namîne

Ê li taliyê ji me re bimîne

Gazek dudu xase ye Gêncê mino ya jî qalibek sabûn e

eger çiqas meriyekî zengîn û xwenedan be kefenê xwe yî xase ye, meriyekî fiqare be kefenê xwe yî caw e, di mabêna cêw û xêse da serî min bi qurbano çar

metelîk in Gêncê mino ne mejdîn e

De bajo Gêncê min bajo bajo

Lê anê ..

Min go dûr e li dûr e

Law Gêncê mino dûr e li dûr e

Agirê meraqê me re bişewitê, bi şewatî ye bi kizûr e

Erê bila ji kul û kedera dilê min û te re li pozê çayê Xelatê li Sîpanê li ciyê Siyamend û Xecê bibariya berfeka hûr e

Ne bila bihata xumexuma Firatê me yî bêrecikê di ber re dengê çemê me yî Xêbûr e

Erê ji berê paşê da çayê me Kurda çayekî bilind e, bi bilbil e, bi şelûr e

were mere Şamê, şam dûr e

Lê anê..

Xeberdana xeber dan..ne gotin li wlatê xerîban li gundê Cindirêsê, ne Gêncê min î ketî bin şeyekî hûr e

law law law law…

Lê anê..

Xeberdana xeber dan..ne gotin li wlatê xerîban li gundê Cindirêsê, ne Gêncê min î ketî bin şeyekî hûr e

law law law law…

Li welat û memleketê xerîba, li gundê Cindirêsê, li kûraniya deşta Cûmê Gêncê min î ketiye bişekî hûr e

www.arsivakurdi.org

Erê ji yacîkî ve ketî telama qîza zabitê Tirka, ji yacîkî ve jina malmidûr e

De mere Şamê, Şam dûr e, Gêncê mino Şam dûr e

Li bajarê Şamê, li gokmeydanê, li taxa Kurdan û Kurmancan, li Salihiyê Eskerê Gêncê min pir e, tabûr bi tabûr dikê telîm û terbiya şûr e

law law law law de bajo bajo Gêncê min bajo bajo

Lê anê hespê Gêncê min hespekî çal e

Ez ê gerdenê xwe qutkim li bajarê Diyarbekira şewitî ji hespê Gêncê xwe re bikim nal e

Lê anê ez ê ji gustîlê pîçan, ji hespê Gêncê xwe re bikim mêx û bismar e

Lê anê ez ê qeter û merhevê guliyên mor qutkim ji hespê Gêncê xwe re bikim dox û hefsar e…



şevekê ji şevê zivistanê dirêj e ker û lal e Gêncê min î tê da dinale, nexwaş e, nexwaşekî bêhal e

Ê kê devê xwe bigerînê têkevê welat û memleketê xerîba, xwaziya anê bi Gêncê xwe re bibama û hogir û heval e, law law law law

De bajo de bajo Gêncê min bajo bajo

Lê anê seriyê min dêşê nizanim çi jan e

Ez nizanim gêncek ji Gênca dirên e, Gêncê avêtî koka zimên e

Lê anê ku ez nizanim agir û meraqê dila çetin e, avêtî serê kaban û çongan meraqa keça cîrên e

Ez nizanim ji giraniya şûr e, nizanim ji kevên e

lê anê...nizanim tebetê welatî me nerind e dibên dil î filanê li filên e

Sebê xatirî wê şorê ez ê devê xwe bidim bajarê Entabê ser hekîm û şabirtê zemên e

Hele mila canê min î can sekê nizanim çiqasa merez û derdê lê ne

Lê anê…

lê anê bi ser de hekîmê Entabê bang kir go:law law law law…

law Gênco: nexwaşiya te ne Gênca dirên e

Ne jî avêtî koka zimên e

Ne ji giraniya şûr e, ne ji kevên e

Nexwaşiya te yaman e, nexwaşiya eşqê ye serê min bi qurbano dermanê te tune ye li bajarê qoci Helebê, ne li bajarê Entabê, law Gêncê mino ne li cem hekîm

û ne luqmên e

Ev derda derdekî yaman e, derdê zemên e

Gêncê mino nexwaşiya zemên e

de here Gêncê min here.. law derdê te yaman e, Gêncê mino ne bi îlac û ne bi dermên e

Gêncê mino derdê te ne bi îlac û ne bi dermên e

De here êteka çayê Kurmênc derman û îlacê te li cem serbaşa keç û bûkên şikaka ez bi qurbano li cem Naza Menên e..

law law law law…

De bajo Gêncê min bajo bajo

Lê anê..

Lê anê..

Law Gêncê mino were mere Şamê

Law xerîbê mino were mere Şamê, Şam dûr e ne nêzîk e

Law Gêncê mino mere Şamê, Şam dûr e ne nêzîk e

Bajarê Şamê ji berê paşê de bajarekî pir gedûk e

Ji serê mêran û mêrxwazên wekê te re çarşî mazat e him jî sûk e

www.arsivakurdi.org

Erê tu mekeve bajarê Şamê, li bajarê Şamê eskerê Gêncê min tabûr e nizanim urdîk e

Li ketina ber destê xerîba law .. kî yê li ber serê te rûnê Gêncê mino law law kî yê te hêdîk e

tu hatî welat û memleketê xerîba serê min bi qurbano ji xerîba re tu kê qorîke

Li welat û meleketê xerîba serê min bi qurbano kesek tune ye te hêdîk e

Tu were hêteka çayê Kurmênc taxim û sîng û berê Naza Menên ji te re buharek ji buhara rengîn e him bi gul û him kulîk e

Him ade ye him çeltîk e

Heta çerxa felekê heye xelkê narîn ê te xudîke

law law law law… de bajo, de bajo Gêncê min bajo bajo … Lê anê.....

Min dî xelkê narîn bang kir go: law law …Nazê bang kir go mere Gêncê min mere rêdûrê mino were mere

Taxim û sîng û berê min karê xezalê ji te re kaxez e, rûpel e, him defter e

Law mere Gêncê min mere

Taxim û sîngê min karê xezalê ji te re text e. rewal e, doşek e, doşeme ye… Gêncê mino him mermer e

Law mere Gêncê min mere

Taxim û sîng û berê min rebenê ji te re cilek ji cilên Kurmancî ye mitêlek ji mitêlê herîrî serê min bi qurbano him jî ber e

Law mere Gêncê min mere

Taxim û sîng û berê min karê xezalê ez bi qurbano ji te re buharek ji buhara rengîn e, gul û gupik ê lê têne der e

Law mere Gêncê min mere

Di taxim û sîng û berê min de zoyê memika mîna çayê Xelat û Sîpanê xwe dane ser e

Law memikê min rebenê mîna çayê Xelat û Sîpanê xwe dane ser e law law law law…

Law mere Gêncê min mere

Taxim û sîng û berê min karê xezalê ji te re ne bûye helbek ji helbê mastê koçerlera li pozê yayla û zozana di ser re qeymaq e di bin re hîn î ter e

Law mere Gêncê min mere

taxim û sîng û berê min karê min xezalê ji te re ne bûye penêrê koçerê Dumilya li pozê qerma Qereşdaxê li binê selek û sepeta heta bi xunavê sibê avê ji bin der e

Ava memikê min rebenê ji te re ne bûye ava Eboheyatê yanîk ferat e, yek kewser e law law law law… de bajo Gêncê min bajo xerîbê min bajo

Lê anê.....Dîsa min go mere Gêncê min mere

Ez bi qurbano.. min bala xwe dayê vê sibê hespê Gêncê min î çal e, berdeha Gêncê min î li ser dînaye zer e

Lê anê bi ser xwe da berdayî şapik û şelwer e

Ne devê xwe digerîne welat û memleketê xerîba û pêda dere

Simêlê sor û sinî ne kirine per e

Law mere Gêncê min mere

rêdûrê mino were mere

Min dî dîsa xelkê narîn bang kir go: were mere mekeve welatê Tirka

Law law pişta xwe mede welatê Tirka, Tirk î zalim e, bêbext e, Anadolî ye ji berê paşê da mîna marê kaşa ye heger li tîna rowê bi mera dadê mera nagînê

siyê

heger li siyê bi mera dadê mera ji siyê nayê dere

Law were mekev wlatê van zaliman, welatê Ereban


Serê min bi qurbano heger li rûçik û siwê wana vegere, siwê wana seke destpêkê wana Xeyber e

Erê li serê îdan û erefatan, li şan û şoretan, li çarşem û kefaletan, li min rebenê vegere law law law law…

De bajo de bajo rêdûrê min bajo bajo Gêncê min bajo.

Mihemed Hemkoçer vê stranê ji Bavê Saleh girtiye.

Efrîn/Şiyê



DENGBÊJ FADIL CIZÎRÎ

Dengbêj Seyîd Fadil Cizîrî bi strana xwe ya "Heyran Jaro" li herêma Botanê tê nasîn. Dengbêj Fadil ji zarokatiya xwe ve di dîwanên şevbêrkan de cih girtiye û dengê wî li Botanê zêde tê hezkirin.

Seyîd Fadil Cizîrî sala 1962'an li gundê Seletûnê yê Silopiya ji dayîk bûye. Dayika Seyîd Fadil Cizîrî, Sêvê jî dengbêj bûye û dengbêj Fadil bi kilamên dayika xwe mezin bûye.

Dengbêj Fadil di temenê xwe yê biçûk de elaqeyeke zêde nîşanî stranên dengbêjiyê dide û her strana ku ji dayîka xwe dibihîze ji ber dike.

Seyîd Fadil di 14 saliya xwe de dest bi strîna kilaman dike û piştî vê yekê li herêma Botan, Serhedê gelek deverên başûrê Kurdistanê digere û di dîwanên şevbêrkên dengbêjan de cih digire, dengê xwe pêşkêşî gel dike.

Seyîd Fadil di dîwanên dengbêjên Botanê de jî bi şevan heya seatên serê sibê dengbêjiyê dike. Dengbêj Seyîd Fadilê Cizîrê li herêma Botanê zêdetir bi kilama 'Heyran Jaro', hat naskirin û gellek kes bi vê stranê Fadilê Cizîrê bi bîr tînin.

Bi demê re guhdarên Seyîd Fadil zêde dibin. Seyîd Fadil Cizîrî kilamên payîzok, dengbêjî û dewetê dibêje. Gelê Botanê jî elaqeyeke mezin nîşanî kilamên Seyîd Fadil dide û ji bo dengê wî qeyd bikin li gel Seyîd Fadil her tim têkiliyê datînin.

Di qezaya tirafîkê de Seyîd Fadil kurê xwe Cemal ji dest dide û piştî kurê wî nexweşiya 'Parkînson' pê re çêdibe. Seyîd Fadil ev 7 sal in li hemberî nexweşiya 'Parkînsonê' li ber xwe dide. Piştî nexweşiyê Seyîd Fadil dest ji dengbêjiyê berdide.

Wî û zarokên wî di "qedexeya derketina derve" ya 14'ê Kanûna 2015'an de 25 rojan li taxa Cûdî li ber xwe daye û kurê wî Murat Ergul jî di berxwedana Cizîrê de jiyana xwe ji dest daye.

Dengbêj Fadil Cizîrî di Tîrmeha 2018an de jiyana xwe ji dest da û koça dawî kir.

www.arsivakurdi.org

Wergera Pirtûka Shakespeare û Bêcidiyeta Wergêrê Kurd

Lokman Polat

Diyar e pirtûkên ku li Swêdê li Stockholmê li kurdî hatine wergerandin ji alî xwendevan û hinek wergêrên kurd ve nayê zanîn. Dibe ku haya hinek wergêrên kurd ji wergera van pirtûkên ji edebiyata cîhanê tunebe, loma jî dema pirtûkek werdigerînin her wekî ku cara pêşîn wan ew pirtûk yan jî pirtûkên filan nivîskarê cîhanê wergerandiye kurdî.



SHAKESPEARE

Li Swêdê pirtûkên Dostoyevskî, Çexov, Tolstoy, Puşkîn, Shakespeare, Balzac, Vîktor Hugo, Xelîl Cibran, Borges, Cervantes, Pîrandelo, Yaşar Kemal, Samed Behrengî, Aleksander Jaba û gelek nivîskarên din yên cîhanê li kurdî hatine wergerandin û weşandin. Dema wergêrê kurd Kawa Nemir pirtûkeke Shakespeare li kurdî wergerand, her wekî ku cara pêşî wî pirtûka Shakespeare wergerandiye kurdî, nûçeyên bi vî rengî di masmedia kurdan de hatin weşandin û malpereke bi sernivîsa "Êdî Shakespeare bi kurdî ye" balê kişand ser vê wergerê.

Pirtûkên Shakespeare berî ku Kawa Nemir Soneyên wî wergerîne li Swêdê hatibûn wergerandin. Pirtûka Shakespeare ya bi navê "Bazirganê Venîsiya" ji alî wergêr Cankurd ve hatibû wergerandin û di sala 2001'ê de ji Weşanên Helwestê li Stockholmê hatibû weşandin. Pirtûka Shakespeare ya bi navê "Romeo û Juliet" jî ji alî wergêr Aram Gernas ve hatibû wergerandin û ew jî ji alî Weşanên Helwestê ve di sala 2002'yan de li Stockholmê hatibû weşandin. Her wiha Soneyên Shakespeare jî ji alî Husein Muhamed ve li kurdî hatibûn wergerandin lê ne wekî pirtûka matbû, wekî e-pirtûk li înternetê hatibû weşandin.

Niha em bên ser wergera Kawa Nemir û cidîyeta wî ya wergêriyê.

Werger kar û xebateke cidî ye. Ji bo wergereke têkûz zanatî, zanîna her du zimanan û zanîstiya hunera wergerê pêwîst e. Û di serî de jî cidiyet lazim e. Wergerên necidî, wergêrên bêcidîyet zirarê didin hunera wergerê. Wergêrê ku li gor kêfa dilê xwe di berhemê de tahrîfat bike, tiştên di berhemê de tunebe her wekî ku hebe lê zêde bike, ev bêcidîyetî ye.

Xwendevanê kurd ên ku wergera Soneyên Shakespeare ya bi wergêra Kawa Nemir bixwîne dê bimîne şaş û ecêb. Ji xwe re lê binêrin, Shakespare di berhama xwe ya edebî de behsa edebiyatvanên kurd, behsa bapîrê edebiyata kurdî Ehmedê Xanî û berhema wî ya nemir Mem û Zînê kiriye lê haya xwendevanên kurd jê tunebûye (!)

Dîsa Shakespeare behsa Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran kiriye, navê van nivîskarên nemir yên kurd li cîhanê belav kiriye û haya kurdan jê tunebûye (!) berhema Ehmedê Xanî ya nemir "Mem û Zîn"ê wergire (!)


Dîsa Shakespeare behsa Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran kiriye, navê van nivîskarên nemir yên kurd li cîhanê belav kiriye û haya kurdan jê tunebûye (!) Spas ji Kawa Nemir re ku kurdan ji vî tiştî haydar kir (!) Hinek berhema nemir a Ehmedê Xanî "Mem û Zîn"ê ji "Romeo û Juliet"a Shakespeare giranbuhatir dibînin. Gelo nebe ku Shakespeare berhema xwe ya bi navê "Romeo û Juliet" ji ber berhema Ehmedê Xanî ya nemir "Mem û Zîn"ê wergire (!)

Henek li cihek, lê tiştê ku wergêr Kawa Nemir kiriye ji henekê jî wê de tişteke gelek xirab e, tahrîfateke bêsewiye û bêcidîyet e. Spas ji malpera "Diyarname"yê re ku bala xwendevanan kişandiye ser vê bêcidîyetiya wergêr Kawa Nemir.

Di malpera "Diyarname" de bê şîrovekirin wergêra soneyên Shakespare ku Kawa Nemir wergerandiye pêşkêşê xwendevanan kiriye. Malpera "Diyarname" bi sernavê "Çend mînak ji wergera Kawa Nemir" wiha gotiye: "Helbestvan û werger Kawa Nemir demek berê soneyên William Shakespeare wergerandin kurdî… Di wergera xwe de Kawa Nemir navê Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Mem û Zînê, Cegerxwîn bikar aniye.

Vane hin ji wan wergeran. Gotin ê wergêran û gotin ê helbestvanan e. Li ser şêwazê, hebûn û nebûna vê tiştên ku bêne gotin hebin em li bendê ne."

Min temamê pirtûkên Shakespeare xwendine û li ser berhemên wî pirtûkeke bi navê "Westayê peyv û hevokan Shakespeare" nivîsiye û weşandiye. Di tu pirtûkek xwe de Shakespeare qala Dehaq, Mem û Zîn, Melayê Cizîrî, Ahmedê Xanî û Feqiyê Teyran û Cegerxwîn nake. (Ma qey Cegerxwîn berî Shakespeare yan jî di dema Shakespeare de jiyaye!….) Kawa Nemir ji xwe re ji serê xwe ev tişt derxistine û di nav wergera Sonetên Shakespeare de cih dayê.



Li wergêra Soneyan binêrin, Xwedêgiravî Shakespeare gotiye :

"Ku bi Mem û Zînê hevser, guhê te kerr dike," Rûpel 69 – Sone – 8

(Mem û Zîna Ahmedê Xanî.)

"Tê bidî bide, te pirr kirin Mela û Feqî," Rûpel – 73 – Sone – 10

(Yanî Mellayê Cizîrî û Feqiyê Teyran.)

"Heylê Dema Dehaq, te bivê, pencên şêr ko bik," Rûpel – 91 – Sone – 19

(Dehaq dehaqê efsaneya Kawa û Newrozê ye.)

"Da rindiya Mem bo mirovên ku bên bimîne." Rûpel – 91 – Sone – 19

(Mem jî Memê Alan e anku Memê dastana Mem û Zînê ye.)

Di Soneyên, Sone 21, Sone 32, Sone 35, Sone 125. de jî navên kurdî hatine bikaranîn.

De ji xwe re li cidîyeta wergêr binêrin! Û şîroveya wê bila xwendevan bi xwe bikin.

Divê werger li gorî şêwaz, rêziman û rastnivîsîna wî zimanî be.

www.arsivakurdi.org

Û her wiha divê orîjînala wî neyê xirabkirin û wekî ku Kawa Nemir kiriye bi kêfî gotin û nav û tişt, mişt lê neyêne zêdekirin. Dema mirov li gor pîvanên zanîstî yên hunera wergerê li wergerên Kawa Nemir dinêre, wergerên wî ji tiştek re nabin, têde tahrîfat hene, lêzêdekirin heye.

Wekî çend gotinên dawî ez vê bibêjim; Ji hemû zimanan bêtir pêwîstiya zimanê kurdî bi wergerê heye. Divê kurdî bi wergerê bê dewlemendkirin û pêşbikeve. Divê hemû cure pirtûk li kurdî bêne wergerandin. Ji bo bi şêweyeke profesyonelî karê wergerê bi rêk û pêk were weşandin pêwistî bi sazgehên wergerê heye. Ji bo pêşveçûna çand, edebiyat û zimanê kurdî rola kovarên kurdî û malperên kurdî (weşanên elektronîk yên bi kurdî) gelek girîng in. Hem ji bo dewlemendiya naveroka kovar û malperan werger pêwîst in. Hem jî ji bo pêşketina çand, edebiyat û zimanê kurdî werger pêwîste. Lêbelê divê wergêr bidirustî karê wergerê pêk bîne.

Shakespeare dibêje: "Tu mîras bi qasê dirustiyê dewlemend nîn e." Divê mirov dirust be û cidî be. Kar û xebata xwe bi şêweyeke cidî û bi cidîyet pêk bîne.

Divê Kawa Nemir dev ji bêcidîyetiya xwe berde û kar û xebateke cidî di hêla wergerê de bike.

Niha jî Kawa Nemir dibêje Cegerxwîn şaîr / helbestvan nîn e. Eh Cegerxwîn şaîr nîne û Kawayê ku paşê kurdî fêr bûye, şaîr e(!). Diyare piştê 10 salan bêcidîyetê didome.



LOKMAN POLAT


Polat di sala 1956'an de li navçeya Licêya Amedê hatiye dinyayê. Ew berî sala 1980'yî çend caran ji aliyê dewletê ve hat girtin û dûv re jî hat berdan. Di encamê de bêyî ku li dadgehê amade bibe, deh sal û nîv ceza xwariye. Wî beriya salên 1980'yî li welat belavokên siyasî dinivîsand. Mecala mercên xebatên polîtîk li ber wî hate sînorkirin û ji ber xetereya girtin û zîndanîkirinê di sala 1980'î de derket derveyî welatî. Pêşîn çû Îranê û paşê çû Suriyê û Libnanê.

Ji sala 1984'an û vir ve li Swêdê dimîne. Kovara "Helwest"ê derdixist û di rêvebiriya kovara Hêviya Gel de xebitî. Di gelek kovar û rojnameyên kurdî de nivîsên wî belav bûn û niha jî belav dibin. Piraniya berhemên wî edebî ne.

Di sala 1984'an de li Swêdê bi cîh bû. Li Swêdê dest bi nivîsandina çîrokan kir. Gelek çîrokên wî di rojname û kovarên cihê de hatin weşandin.

Heta niha 38 pirtûkên wî derketine. Ji wan çar heb bi tirkî, sî û sê heb jî bi kurdî ne. Ji pirtûkên wî yên kurdî duwanzdeh roman û yanzdeh jî kurteçîrok in. Sê romanên wî li tirkî hatine wergerandin. Lokman Polat ji bo zarokan jî 4 pirtûk wergerandine kurdî û kovarek bi navê Helwest li Stockholm û kovarek bi navê Ronî li Stenbolê weşandiye. Lokman Polat di destpêka damezrandina Komeleya Nivîskarên Kurd de cîh girtiye lêbelê endamtiya wî ya komelê niha nadome. Ew endamê PEN'a Navnetewî û endamê Yekîtiya Nivîskarên Swêdê ye. Polat niha di malpera "Çandname" û "Rojnameya Kurdistan" de gotar dinivîse.

www.persakurdi.org



CÎHAN HESEN

Li ser eniya min binêre
Û
di nav keledûmana xêzikên ku hatine xêzkirin de noq bibe

Temaşe bike ku,
çend êşan xwe tê de komî ser hev kirine
Û xwe berdane nav çavên min di bîbikan de mexelbûne

Binêre ku
Çend şervanan tê de ji westandinê şer bi xew ve çûne
Û çend jinên wêrek di pêsîrên xwe de azadî xwedî kirine

Binêre
Çend malên wêranbûyî
Tev tê de bûne kavil
Û çend gundên çiyayî di guliyên xwe de dişewitin
Temaşe bike
Zarokên sêwî ken ji lêvên hev parsek dikin
Dayîkên reşgirê dayî
Kitanên xwe yên meles ji hêsran didoşin
Û li ber deriyê malê dîlokan dibêjin

Binêre
Bîra girî bi destên kedkaran tê de hatiyê avdan

Dizanim ne birizayî wan hatiye kolandin
Lê girî nasnameya keda wan e
Binêre
Evîndar bi dengvedana bê re
Bêramûsan
Bêxatirxwestin ji hembêza hev vediqetin

Binêre li xemginîyê binêre
Ku çawa hebûna min di xeleka wan xêzikên rêzbûyî de tê
Pelçiqandin
Ku çawa stêrk bi stêrk ji esmanê çavên min vedimirin û li eniya min tên veşartin

Binêre
Kolanên vala ên walatekî bindest
Ji tenêtiya xwe diqîrin
Ku laşê jineke nûgihayî bi ava pêlên deryayek şîn hatiye şûştin

Binêre
Rêza dûr binêre
Ew ne rêza mûriyan e
Ew rêza koçkirina miletê min e
Ji xilwetgeha dilê min koç dikin

Binêre
Çend konên xemê hatine vekirin
Binêre
Wisa li ser eniya min
Narivîna welatê min diyar bûye
Binêre delalê min binêre.

www.rojaku.org

Sê Mêrên Rûrehman

Ayhan Erkmen

Dema min bîhîst ku apê Yilmaz koça dawîn bar kiriye, rêwitiya me ya bi hev re hat bîra min. Di têyîba texsîya wî de stranekê destpêkir, ji kur ve axînek kişand, medê wî guherî û ser stranê parîkî peyîvî û giriya. Berî wî jî ez du cara disa bibûm şahidê heman tiştî. Bi Apê Yilmaz re dibûm şahid ku; Sê mêrên rûrehman, sê stran guhdar kirin û giriyan. Nizam stranên sedan sal berê hatibûn gotin, çi dihanîn bira wan, pê ra



EDO DÊRAN

distiran û digiryan. Helbestvan û mamostê min Edo Dêran bi strana Seyadê Şame ya 'Apo', Apê Îskender bi strana Evdalê Zeynikê ya 'Tema Lawo' û herî dawî Apê Yilmaz bi strana Ahmedê Agirî ya 'Şêx Zahir' ve şewata dilê xwe bi min re par ve kiri bûn. Erê niha her sê jî najîn.

***

Helbestvanê nemir Edo Dêran bi xwe jî heman stran xweş digot, dema wê bigota diranên xwe yên çêkiri derdixist, û bi awirên kûr dem û der terk dikir, diçû dema dengêj û stranê, dengê wî dişibî dengê Seyadê Şame û dest pê dikir

'...Wî de Apo dike mala bavê zeriya min ji vî gundî barke
De tu rabe ebakî derwêşa, tûrikekî parseka biraziyê xwe re karke...
Ez çûme aliyê malê muhuba dilê min li mal nîne
Çûme aliyê odê, rûniştiye kêleka kalekî heyştê nod salî...'

Seyad fîrar û qaçaxê ji destê romê ye, derbasî alî Rewanê dibe, li dû xwe Zulfinaza dergîstiya xwe ya bedewa êl û eşîrê dihêle. Ne dikare bê û ne dikare xeberekê bişîne, haja malbatê jî jê tune, sal ku derbasdibin weswese dilê wî dixwe, difikire ku niha muhuba dilê wî dane *kalekî heyştê, nod salî* ji dev û pozê kalê di nav sîng û berê zeriya zerda ye. Edo Dêran pir bi hestewar digot. Heman derd di helbesta xwe ye 'Rev' de anîbû ziman. Du bira ji destê cendirma li berbangeke kur, ji berî dikê sibê, berê xwe didin serê çiyê. Destê birayê mezin ji Xezalê bûye. Xezal ji rewşê ne razi ye, Edo Dêran dibê;

Dîsa kete bîra min
XEZAL
Porê zer
Çavên reş
Û kenê delal va
Gilî gazinê xwe meyne ser meda
Reva me,
Reveke pir bê eman e
Derd kul û birîneke bê derman e.

Nizanim êdî hestewarbûn û hesrên wî, lerizandina dengê wî, ji bo Zulfînazê bû an ji bo Xezalê, lê ya min tê derxist barekî xemgîniyê yî pir giran li ser dilê wî bû. Kezeba wî diperitand.

Apê Îskender ji berî 12 îlonê, rayedarekî paye bilind e û bi we derfetê, gelek kesan dike xwedî nan û mal. Ez û zarên wî em hevalê hev bûn. Ji bo karekî ez çûbûm serdaniya wî, li malê tenê bû. Ez êpêce rûniştim û me behsa salên berîn kir.

www.arsivakurdi.org

Ji cihê rûniştî rabû ser xwe çû, ji nava kasêtan kasetêk geriya, dît di têyîbê de cih kir, qaset pêşta paşta pêça û strana Evdalê Zeynikê ya Temo Lawo eyarkir û rûnişt. Bi tevî dengbêj dest pê kir geh got, geh giriya, geh jî guhdar kir.

...Ax tew dinyayê, ax tew kaliyê
Ax Temo lawo mirin çêtir e ji feqîriyê...
Bi Xwedê li dîwanên mîran û hakiman
Lawo ez mêrekî çê me
De sala par vî çaxî
Ez di nava civat û cakiyan de rûniştî bûm
De sala îsal bayê felekê li min dabû...

Apê Îskender ji malbateke dewlement bû, tim di nav wê dewlemendiyê de jiya. Derdê wî ne feqîrî bû; lê nizam ji bo derdê Bavê Temo siyarê Cindî digiriya an bi bîra civatên berê dikir ku dost û hogir, qedir û qiymet dihat zanîn.

Apê Yilmaz jî texsiyeke wî hebû, bi qezanca wê taxsiyê çar zarê xwe jî dan xwendinê û anî ber firînê. Rojeke me bi texsiya wî rêwîtî dikir, qasêteke dengbêjan digot, dema ku strana dengbêj Ahmedê Agiriyê ya 'Şêx Zahir' dest pê kir ji kur ve axînek kişand,
De lê Hedê rebenê tu rabe sibeye de şerekî giran li me çêbû
Li gola nawirê, dayê rebene li hidûdê Îranê...
Hela rabe tu sêr bike, kesekî xwedanî xêra tune
cewabekî bihere ji kirê celaliya re...
Birîna Şêx zahir xetarê de ye, bê fayde ye

Medê Apê Yilmaz guherîbû, ser kesayeta Şêx Zahir parîkî peyîvî û giriya. Debara malê û çaleçala dinyayê, emrê wî xweribû. Got 'ez di zemanekî xerab de hatime dinê ku ji her tiştî re bihayek birîne û em jî bûne pêlîstoka wan, ketine derdê debarê. Ji bo kurda ji destê min qet tiştek nayê, ez ê bi çi rûyî herim hizûra wan eshaba'

Şex Zahir bi Rûsî û Farisî jî nav de çar zimana zane. Li Qulpê (Tuzluca) midûrê kargeha xoyê ye. Di nav serhildana gilîdaxê de cih digire û yekîna wî lê dide du balefiran dadixe, dibêjin parçeyên wan hê jî li wan deran e. Her kes bi şerefa xwe, di hezirana 1927 de Şêx Zahir Serfermandarê Tirk Kazim Orbay esîr digire, pê re xeber dide, behsa dew û doza xwe dike, ji bo here par ve bike, wî berdide lê ji du meh peyê vê bûyerê; diajon ser yekîna Şêx Zahir şervanên wî Omerê Besê tê kuştin, bê hurmetiyê dikin, serê wî jêdikin, ji bo gel bidin tirsandinê, gund bi gund digerînin. Nezanan, nizanin ku gelê, wî seriyî sond bixwe. Erê wek gotina dawiya stranê '*Birîna Şêx zahir xetarê de ye, bê fayde ye'* ber bi dawiya serhildanê ji pey çar bira stêrka wî jî dirije.



AYHAN ERKMEN

Ew di sala 1973yan de li Dîgora Qersê ji dayik bûye. Wî beşa hiqûqê xwendiye û çar salan jî li Qersê parêzeriyê kiriye. Di hilbijartinên 2004 û 2009an de li bajaroka Bazarcixa Dîgorê wek şaredar hatiye hilbijartin. Di dawiya sala 2011an de hatiye girtin û 7 salan di zindanê de maye. Ji berî girtinê du pirtûkên wî hatibûn çapkirin.

Di sala 2005an de pirtûka Abdurrahman Alaca/ Edo Dêran (Biyografî-Weşanxana Perî)
Di sala 2009 de pirtûka Şev û Deng (Helbest-Weşanxana Lîsê)
Niha li ber destê wî ji bo çapkirinê 5 dosyayên wî hene; çîrok, helbest, fabl, şano û ceribandin.
Di heman demê de Çîrokbêjiyê dike; bi alîkariya şîrketeke prodîksiyonê çîrokan wek vîdeo-çîrok dikişînin û di televîzyonên kurdî de û li ser youtubê diweşînin.



DİLBİRÎNÊ DEŞTA MÛŞÊ

HEQ

Cil bi rahêjtinê
Têne raxistinê

Heq bixwestinê!
Tê stendinê...

Lê bi berxwedanê!
Tê bidestxistinê.



HEJARÊ FARQÎNÎ

Di Bin Siya Avê De

Qamişên ji payîzê mayî
Dirêjî li ser av in
Bîna masîvanan fire ne canim
Em li ber goleke mezin
Û ne masîvan in
Ne jî bîn fire
Xiyarên me tal in
Firingiyên me bi şekir
Rûyên hevalên min esmer e
Simbêl qeytan in
Hinek ji me bêsebr
Hinekî bisebr in
De Seyîdo agir dade
Em li hêviya çay in
Lo Enwero
"çelengo ez gorî te"
Kaş ke ha kaş ke
Te yek qetand ji dêya xwe.

Çîroka Serdestan û Qilûlikên Bindestan



ÎKRAM OGUZ

Gotinek pêşiyan e, dibêjin; „Tucarê têk diçe, dest davêje defterên kevn.“
Gera tucar a di nav rûpelên defterê da, gera jibo serkftinê nine. Bixwe jî dizane, sedema têkçûna wî, ew bixwe ye. Lê dîsa jî li pîneyek digere û dixwaze bi wî kêmasîya xwe ya têkçûyînê veşêre.

Dema ku ez li hest û helwestên Kurdên ku di medya civakî da hespê xwe bi rehwan dibezînin, dinêrim, ev gotin tê bîra min. Carcaran dikenim…

Carcaran jî diqahirim û ji hale xwe û wan ra digirîm. Jiber ku Kurd miletek têkçûyî ne. Loma li rû vê dine ew milete, ku ji tahma serkeftinê bêpar ma ye.

Sedem ev binketîya civakî ye, ku Kurd bi tena serê xwe ya jî bi heval û hogirên xwe va hewl didin û dixwazin tahma serkeftina civakî bigrin û pê dilşa bin. Lêbelê ew tahm, tahmeke çawa ye, bi rastî wê jî nizanin. Loma li kirin û kiryarên xwe mêze nakin û nabînin… Li nezanî û kêmasîyên xwe venagerin. Jiber ku pozbilind in.

Di ser pozên xwe ra li derûdora xwe mêze bikin jî, di bin çavan ra û di nav qirş û qalan da li pîneyan digerin. Ger ku parçeyek ji pîneyê rizyayî jî bibînin, bi fesal digrin û li navrana şalê xwe dixin.

Bi şalê xwe yê pînekirî qûna xwe ya tazî diniximînin… Dûra vedigerin, li ser tazîbûna hevalên xwe dest bi qilûlikan dikin û kêfa xwe tînin.
Halbûkî di tekoşîna civakî da rastî û xeletî birayê hev in. Di encamê da serkeftin hebe, xeletîyên ku heta wê gavê hatibin kirin, wenda dibin ya jî parçeyek ji rastîyê tên qebûlkirin.

Lêbelê dema ku têkçûyîn encam bide, wê gavê jî hemû tiştên ku rast hatibin kirin û gotin, ew jî alametên îxanetê tên binavkirin. Loma dibêjin, dîrok çîroka serkeftîyan e.
Di wê çîrokê da xeletî û kêmasî cîh nagrin û bi hostayî tên veşartin.

Rastîyên binketîyan wek qedera wan a reş li enîya wan xeletî tê nivîsandin. Hemû xeletî û kêmasîyên serkeftîyan jî bi peyv û hevokên zêrîn va tên xemilandin. Serkeftî di çîroka xwe da wek lehengên bêhempa bi cîh digrin û dibin serdest. Binketî jî bi qilûlikên pûç û vala bihev dikevin û dibin xizan û bindest… Kurd bindest in. Lêbelê bindestîya wan ji nezanî û xizanîyê nayê.

Hemû zana û rewşenbîr û ronakbîr in!..
Her yek bi zimanek diaxifin û serîyek dikişînin. Li hevparîya xwe nagerin, li cudahî û kêmsîyên hev digerin. Loma serdestên wan, jixwe ra li ser pişta wan çîrokên nû dinivîsînin. Ew jî bi qilûlikên pûç û vala lihev zêde dikin û dema xwe derbas dikin.

www.arsivakurdi.org



Charles Bukowskî



Azad EKKAŞ

Şîneçivîk

Di dilê min de şîneçivîkek heye dixwaze derkeve
Lê ez pê re gelekî hişk im,
Dibêjimê, li vir bimîne,
ez nahêlim kesekî te bibîne.

Di dilê min de şîneçivîkek heye dixwaze derkeve
lê ez wîskiyê lê dikim û dûya cixareyan dikişînim hundir
û qehpik, meyger
û karmendên dokana şînkatiyan
tew nizanin ku
ew
di vir de ye.

Di dilê min de şîneçivîkek heye dixwaze derkeve
lê ez pê re gelekî hişk im,
Dibêjimê,
Bimîne ramebe, ma tu dixwazî
min tevlihev bikî?
Dixwazî mesele xera bikî?
Dixwazî firotana pirtûkên min li Ewrupayê têk bidî?

Di dilê min de şîneçivîkek heye dixwaze derkeve
lê ez pir jîr im, tenê carina wî
bi şev berdidim derve
ku hemî di xew de bin.
Dibêjimê, ez zanim tu li wir î,
loma xemgîn mebe.
Paşê wî vedigerînim,
Lê ew piçekî jî dixwîne,
a li wir, min nehîştiye ew tam
bimire.
Û em tev hev radizin
wanî
tev wê soza me ya nihênî
û ev ê han evqas dilnarîn e ku bihêle zilam bigirî, lê ez
nagirîm, ka tu digirî?

Helbest: Charles Bukowskî

Wergêr: Azad EKKAŞ

Afirandin û Pêşketina Alfabeya Kurdî Kurmancî li Ermenistana Sovyetê de (1921-1991)



TÊNGÎZ SİYABENDÎ

Pêşgotin

Berî ku em li ser mijara lêkolîna xwe rawestin divê em berê xwe bidin û bi kurtahî binihêrin ku ka Kurd kî ne. Kurd yek ji kevintirîn gelên dinyayê ne ku li rojhilata kevnar de li ser axa jiyane. Li vir lazim e ku bala xwe bidin ser wê yekê wekî gelek neteweyên din ku di gel kurdan jiyan dikirin ji dîrokê wenda bûne an bi gelên din re asîmîle bûne. Di heman demê de kurdên bêwelat li hemberî zilm û zordariyên serdeman derketine û bi vî awayî ne tenê ji hebûna xwe, lê belê ji zimanê xwe jî xwedî derketine û xelas bûne.

Li gorî dîrokzanan, bav û kalên kurdan yên neîranî eşîrên Gutiyan in, ku B.Z di sedsala 1-an de di nav eşîrên Mediyan de hêdî-hêdî heliyane bûne bav û kalên kurdên nûjen a bi navê Med,lê herwiha navên xwe yên etnîkî jî parastine:

K(g)utî,Kurtî, Karda, Kordûx, Gurdiyanî, Guranî, Gurtî. Ev navên ku li jorê hatin rêzkirin di berhemên dîrokzanên kevnar ên Ksenofon, Strabon, Ptolemeus û yên din, û her wiha di berhemên dîroknûs û erdnasên ermeniyan de jî derbas dibin. Navê welatê kal û bavên kurdan di nav xebatên dîroknasên Roman û Yewnaniyan de "Kordûyena", "Gordî", di nav dîrokzanên ermeniyan de "Warê Kordûxan","Kordêk",''Welatê Medan'' û hwd. Di dîroknasî û kronolojiya ermeniyan de Kurd wekî Med têne bîranîn. Çavkaniyên Asûriyan jî Medan wekî K(g)utî dihesibînin. Di derbarê cîhê rûniştina wan eşîrên Kardû de jî agahî heye, ku di sala 841-an de di navbera wan û leşkerên Farisan de şerekî dijwar çêbûye.

M. Çamçyan û X. Înçîçyan dinivîsin ku Kurd ji Medan pêşde hatine, ku ewana (kurd) bi navê Med hatine naskirin û wan re dibêjin Kurd û ew devera ku ew lê dijiyan jê re Kordux dihat gotin. Li gorî gelek zanyaran Mediya (678 B.Z - 550 B.Z.) dewletek Kurd bûye. M. Xorênatsî bi gelemperî behs dike ku Mediya li ser sînorê rojhilata Ermenistanê bûye.

Piştî ku Koroşê Faris padîşahiya Medan hilweşand û serdestiya Mediyan bidawî kir, gelek eşîrên Medan hêdî-hêdî ji çiyayê Zagrosê derketin û li çiyayên Ermenistanê bicîh bûn.

Hebûna Kurdan li Qefqasê

Kurd her tim li Qafkasyayê hebûne bi taybetî li ser wê axê ku niha Azerbaycan tê binavkirin. Med bapîrên kurdan xwedî dewlet bûne li wir jiyana xwe derbas kirine û rola xwe jî lîstine. Bê guman hewcedarî bi lêkolîneke zanistî û kûr heye da ku hebûna Kurdan li Qafkasyayê bi zelalî şirove bike. Li gorî dîtineke gelêrî hebûna Kurdan li Qafqasê ji van sê hêmanên jêrîn ve girêdayî ye,lê divê em destnîşan bikin ku dîroka kurdên Qafqasyayê diha kevin e:

www.arsivakurdi.org

1. Kurd yekemcar li Qefqasê di sedsalên X-XI de di dema Mîrîtiya Kurd a Şedadîyan (951-1199) de hatine bicihkirin.

2. Di serdema Şah Abbas de 24 eşîrên kurdên kurmancîaxêv ên Îranê ber bi Qefqasê hatin dûrxistin. Bi vê yekê nifûsa kurdan a li Qefqasê zêdetir bû.

Bi taybetî di sala 1587 de nifûsa kurdên derdora Laçîn û Qerebaxê bi hatina van eşîran re zêdetir bûne.

3. Tête pejirandin ku vê carê ji sedema bûyerên sedsala 19-an û 20-an bi taybetî ji sedema şerê Osmanî-Rûsan (1877-1878) û Şerê Cîhanê yê Yekem (1914-1918) tevgera hejmareke mezin a Êzidiyan berbi devera Qefqasê, nemaze Gurcistan û piştre Ermenistanê koçber bûne.

Zimanê Kurdan

Pêwendiyên dîrokî yên ermeniyan û kurdan gelekî kevin in. Ev herdu miletên kevin ji mêj ve cînarên hevûdu bûne. Piştî gelek karesatên sedsalan jî dîsa dostaniya wan berdewam bûye û şahidiya vê yekê zargotina wan a zengîn e. Gelek serhildêrên Rojhilat û Rojavayî wek mîna Yewnan, Rom, Ereb, Tirkên Selcûq, Mongol û hwd di dîrokê de her tim hewl dane wekî zimanê Kurdan tune bikin,lê ser neketine. Zimanê kurdî, zimanekî ji şaxa zimanên îranî yê bakûr rojavayê malbata zimanên hind û ewropî ye. Hemû gelên cîranên hev ji ber sedemên cihê, ji aliyê zimên ve jî bandor li hev kirine û peyv dane hev û ji hev stendine.Çawa ku bandora zimanê Ermen, Faris, Tirk û Ereban li ser zimanê kurdî hebûye wisa jî bandora zimanê kurdî li ser wan hebûye. Ji ber ku zimanê kurdî zimanê gelekî bindesthîştî ye, îmkanên pêşdexistina sazî yên neteweyî nebûne û ji aliyê lêkolîn, lêgerîn, pêşxistina ziman û çandê, hebûnên civakî û dîrokî ve bêpar maye. Lê sedema herî mezin bêdewletbûn e, ku hîn jî bandoreke neyînî li ser pêşketina kurdî ya wêjeyî dike, lê divê em bi şahî diyar bikin ku sedsala 20-an ji bo gelê Kurd bidestxistineke nû di gel xwe anî. Beşek ji Kurdan ji welatê xwe dûr li Ermenistanê di tevahiya dîroka Kurdan de roleke mezin lîstin. Bi alîkarî û piştgiriya dûgela Ermenistanê Kurd bûn xwedî alfabeyê. Kîjan jî bû sedema pêşxistina zimanê zikmakî û herwiha parastina dîrok, çîrok, zargotin, stiran,destan,wêje û hwd. Piştî afirandina tîpên Kurdî gelek dibistan hatin vekirin, pirtûk hatin çapkirin û rojname bi zimanê dayikê hate weşandin.

Kurdiya Bi Tîpên Ermenî

Ji bo wan kesan ku dixwazin derbarê dîrok,çand, zargotin û hwd a Kurdan lêkolîn bikin dikarin berhemên nivîskarên ermenî wek çavkaniyek pêbawer bikar bînin,nemaze xebatên dîroknasên ermenî yên sedsala navîn. Yên ku di berhemên xwe de nimûneyên zimanê gelê kurd, zargotin û wêjeyê jî bi transkrîba alfabeya ermenî parastine. Yek ji wan nimûneyên kevnar em di destnivîsa № 7117 ya Matênadaranê de dibînin. Dostê gelê Kurd, zimanzan H. Açaryan destnîşan dike ku ew di sedsalên X-XI de hatine nivîsandin.

Divê bê zanîn ku hejmarek ji mînakên kevn û dewlemend yên zargotinên gelê Kurd bi tîpên Ermenî hatine nivîsîn. Berhemên navdar ên jêrîn jî bi Kurdiya tîpên Ermenî hatine nivîsandin: «Hemê Mûsê», «Leyl û Mecrûm» û strana «Mele Mûsî Seyran».


Di nav wan de balkêş in «Qandîlî Siyapûş û Heozbek», «Canbalî», «Hazim Axa», «Mîrza Axa,Telî Eyşa», «Siyabend û Xecêzerê», «Memê û Zînê», «Devrêşê Evdiyê Êzidî», «Hemûdê Şankê».

Hêjaye ku em xebata Komîtasê jî bibîr bînin ku ji bo tomarkirina stranên folklorî yên kurdî kiriye. Di hejmara pêncemîn a «Berhevoka Etnografîk a Emînyan» de xebatên Komîtas ku ji 13 zargotinên Kurdî pêk tên wek mînak «Kuluk û Garo», «Mez û Zîn», «Sêvhacî», «Hemê Mûsî" û yên din hatine cîwar kirin.

Balkêş e orîjînalên wan bi tîpên ermenî hatine nivîsîn. Bitaybetî wergera Mizgîniya Metta,Lûqa,Marqos û Yûhenna pir balkêş e yên ku bi tîpên Ermenî û bi Kurdî di sala 1872-an de hatine nivîsîn. Divê bê zanîn ku ev yekemîn wergera berfireh e di dîroka wêjeya kurdî de. Bê guman ger serpêhatiya Kurdiya bi tîpên Ermenî di dîroka wêjeya kurdî de xwedan cihekî girîng be.

Afirandin û pêşketina alfabeya kurdî li Sovyeta Ermenistanê de dikare li ser sê qonaxan de dabeş bibe:

1. Alfabeya «Şems» ya Lazo (H. Xazaryan) - 1921
2. Alfabeya Latînî ya E. Şemo û Î. Marogûlov - 1929
3. Alfabeya Kîrîlî ya H. Cindî, E. Evdal, W. Nadirî – 1944



Alfabeya «Şems» ya Lazo (1921)

Piştî hilweşandina Împratoriya Rûsyayê û bi Şoreşa Cotmehê li seranserê Qafqasyayê bo gelên kêmjimar gellek derfetên xwebûnê, nexasim jî di warê çand û hunerî de, xwe didin der. Di navbera salên 1920-37'an de bi taybetî li Ermenîstanê ji hêla hikûmeta Bolşevîkan û alîkariya hin zanayên ermen ên ku bi kurdî zanibûn, di warê xwendin û nivîsandinê de li dibistanên kurda tevdigerin. Di vê heyamê de yekem car di sala 1921'ê de ji hêla hikûmetê ve dibistanên seretayî û gellek navendên xwendin-nivîsandinê tên vekirin. Ji hêla Hakob Xazaryan (Lazo) ê ermen ve bi navê 'Şems' pirtûka dersê ya bi alfabeya ermenî, lê bi kurdî tê amadekirin. Lazo di pêşgotina pirtûka «Şems» de dibêje dike ku rastî gelek tengasiyan hatiye. Berî amadekirin û çapkirina vê pirtûkê demekî dirêj fikirîye ka li ser kîjan bingeha zaravayên kurdî alfabeya xwe amade bike. Di pêşgotina xwe de berdewam dike û dibêje ku li me xweş hat ku em zaravayê Kurmancî hilbijêrin. Piştre xwestiye li ser bingeha tîpên latînî,erebî û fînîqî alfabeya kurdî çê bike,lê dibîne ku ew yek dikare bibe sedema hin tengasiyan û tîpên ermenî bikêr û baş dibîne. Bi vî awayî alfabeya kurdî ya yekemîn li ser bingeha tîpên ermenî amade dike.

Alfabeya Latînî ya E. Şemo û Î. Marogûlov (1929)

Di sala 1925-an li Lenînakana Ermenistanê de ji bo kurdên ji welatên wek Azerbaycanê, Gurcistanê, Turkmenistanê we derbareyê jiyîna civakê û her wekî

din konferans tên lidarxistin û tê de li ser çend mijaran gotûbêj tê kirin. Di biryarnameyên kongreyê de her wiha pêwîstiya rakirina nexwendewariyê û

şandina keçan bo dibistanê jî hatiye destnîşankirin.

www.arsivakurd.org

Kongreya jorîn biryar dide ku ji hukumeta Ermenîstanê daxwaz bike ku alfabeya kurdî ya li ser bingeha tîpên ermenî were rakirin û alfabeyeke din li ser bingeha tîpên latînî were çêkirin. Alfabeya Lazo ya bi navê Şems ku li ser bingeha tîpên Ermenî di sala 1921 an de hatibû amadekirin heta sala 1928 an di dibistanan de dihate bikaranîn.

Lê belê divê em destnîşan bikin ku hin kêmasî û şaşiyên wê pirtûkê hebûne. Ji ber wê yekê jî daxwaza alfabeyeke nû tê kirin. Hikûmeta Ermenistanê ew pêşniyar red nekir û ferman da ku alfabeya nû were amadekirin.

Di sala 1926 an de Erebê Şemo û Îshaq Morogûlov projeyek nû ya alfabeya latînî ava dikin. Ev jî di sala 1929 an de li Bakûyê tê pejirandin.

Di heman salê de, pirtûka “Xo-Xo Hinbuna Xondьna Nvisara Kyrmançi”(Xwe bi xwe hînbûna nivîsandina Kurmancî) tê çapkirin û weşandin. Êdî ji sala 1930-an û vir de gelek pirtûkên wêjeyî,perwerdeyî, zanistî,felsefî û hwd têne çapkirin.

Alfabeya Kîrîlî ya H. Cindî, E. Evdal, W. Nadirî (1944)

Piştî demekê ji hêla Stalîn ve alfabeya latînî ya kurdî tê qedexekirin û li şûna wê alfabeya kirîlî cih digire.

Di sala 1941’ê de hikûmeta Ermenîstanê biryar dide ku alfabeya kurdî bi kirîlî bê amadekirin û bo vî karî jî Heciyê Cindî tê peywirdakirin û di sala 1944’an de alfabe tê amadekirin, ku bi dehan sal xwendekarên kurdî bi vê alfabeyê hatin perwerdekirin.

Di vî karî de nivîskarên ermenî G.Xapantsyan, H. Açaryan û hinek ên din û



herwiha nivîskarên kurd wek mîna W. Nadirî,E. Evdal û N. Maxmûdov jî bûn alîkar. Heyanî di van salên dawîn de jî pirtûk bi tîpên kîrîlî dihatin çapkirin.

Çavkanî:

1. X. Abovyan, "Kurd, Êzidî" (bi ermenî), 1986, Yêrêvan.
2. A.Û. Derboyan, Çêkirin û Pêşketina Kurdiya Wêjeya Li Ermenistana Sovyetê de (bi ermenî)
3. Hecîyê Cindî, Akademiya Zanistî ya Ermenistanê, Zanistên Civakî (bi ermenî) № 5, 1962
4. V.A. Baybûrdyan, Peywendiyên Ermenî û Kurdan di Împaratoriya Osmanî de (bi ermenî), Yêrêvan-1989
5. X.M. Çatoyêv, Kurdên Ermenistana Sovyetê (bi Rusî), Yêrêvan, 1965
6. N.X. Maxmûdov,Gelê Kurd (bi ermenî), Weşana Dewleta Ermenistanê, Yêrêvan, 1959
7. K. Çaçanî, Dîroka Çapemeniya Kurdî "Rya Teze" 1930-1955 (bi kurdî), Yêrêvan, 2008
8. Pirtûka «Şems» (bi ermenî), Êcmiyasîn,1922
9. “Xo-Xo Hinbuna Xondьna Nvisara Kyrmançi” (bi ermenî) ,Î. Marogûlov û E. Şemo, Weşanxaneya Dûgelî, Yêrêvan, 1929
10. L.G. Xaçêryan, «Teoriya Pêjdahatin û Pêşketina Ziman li gorî Vardan Arêvelsî»

www.firsatakurdi.org

THALES, ANAXIMANDROS Û ANAXIMENES

Çorê Arda

Thales nişţecihê Miletos'ê ye, (B.Z 624- 546) de jiya ye. Thales berî her kesî ''Pêgirtina Rojê welew Rojgirtinê'' dihese û radigihîne.



THALES

Yanê berî her kesî vê bûyerê hîs dike. Ev pêşdîtinek zanyariyê ye. Feqet, ev ji bo wî ne nişîdê dehabûnê bû, ji ber ku Lydîa-Mîletos bûbûn yek û ji hêlkê ve jî ji hêla çandê Lydîa-Babîliyan têkiliyan wan bi hevdu ra hebûn. Stêrknasên Babiliyan "Pêgirtina Rojê welew Rojgirtin" li gor serdemên esasên 19 salan jixwe dîtibûn."Pêgirtina Hêvê an jî Hêvgirtin" jixwe tam pê dizanîbûn û dîtibûn. Yanê Babiliyan gelekî ji stêrnasiyê fêm dikirin. Lê ji ber ku "Pêgirtina Hêvê an jî Hêvgirtin" hêlek wê xuya dibû û hêlek wê nedixuya loma ji ber vê sedemê pirsgirêk derdiketin holê. Feqet, ne Thalesî, ne Babiliyan nizanîbûn ji bo çi "Pêgirtina Tavê an jî Hêvgirtin" gergerok e, an jî dizîvire. Li gorî gotina, Thales li Misirê geriyaye û disîplîna Geometriyê ji wir haniye Grekê. Thales, li Yewnanê ji nav heyşt zanyariyan jê yek ew bû. Peyva Thalesî dike zana an jî wî pêş ve derdixîne ev e: "Tişta en baş Av e." Li gorî Thalesî erd li ser avê ye, hemû bireser ji avê za(welidî ye) ne.(1) Li gorî Thalesî, hilma avê a weke gazê û cismên hişk(yanê yê ku neheliyayî) ên weke cemedanan de ava rohnbûyî-tîrbûyî heye. Ji ber vê yekê ev tişt dibe sedema du cûreyên hebûnê. Wê çaxê hebûna hertiştî "av" bixwe ye. Thales, livê, guherînê û bûyînê, ji bo hebûnê weke taybetiyek hewcedarî dipejirîne. Lê ji hêlkê ve di binê guherînê, livê û bûyînê de li tiştekî "nayê guherandin" heye an na li wê digere. Yanê li cewherekî timî wek xwe dimîne digeriya, li ser vî esasê dirawestiya û ev pirs ji xwe'r sewal dikir. Talî Thales him ji guhertinê bawer dikir-dipejirand, him jî ji tiştekî ku tim weke xwe diminî bawer dikir. (2) Bikurtasî di esasê perspektîfa Thalesî de, her çiqas tişt biguhere, veguhere û dagere jî talî di hemû guhertinan de cewherek heye, ew kakil jî av e.


Thales feylesofekî Dibistana Mîletosê ye, heta feylesof û zanyarê ewilî tê pênasekirin. Li gorî feraseta Thales Arkeya hemû tiştî ji "Av"ê dizên, cewherê hertiştî "Av" e. Yanê her tişt diguhere-vediguhere, lê talî di hemû guhertinan de, binyada wan celebên "av"ê ne, ango ji avê dizên. Thales, hemû guhertinan li ser esasê elemanta avê radiwestîne. Hebûn û xwezayê li ser vî esasê avê radiwestîne, ango hemû tiştên li ser dinyê ên heyî gişan dixe hundirê perspektîfa xwe'y "Av"ê . Hebûn ji avê tê, ger av tune be, wê çaxê heyîn jî dê tune be. Thales avê ewilî weke vejîna dinyê-xwezayê û paşê weke bingeha vejîna mirovan dibîne.

Ji ber ku av tune be, ne Zoolojî, ne Antropolojî û ne Botanîk diwelidin welew dijîn. Av, him xeterebûnê, him jî hewcedarbûnê di dawa xwe de kedî dike. Ji bo jiyandina kirde-bireseran û hemû zindîyan elementeke krîtîk e. Mînak, av dikare hemû tiştan bide berxwe, her

tiştî li bin guhê hevdu bixîne, baran ji avê dizê ger bahozek xurt çêbibe an jî şekeliyek çêbibe dikare gelek tofana bi xwe ra bizeyîne. Hewcedariya wê, ji xwe diyar e, ger av tune be, ne însan, ne teba, ne şênayî diminin. Gişên ew ê hişk bibin. Cihê ku ji avê dizên an jî cihê ku şil in: Behr, gol, robar, cihê nermijokî, cihê kevzokî, cihê kufikî … hwd van têgihan hinek nexweşiyê bi xwe ra diafirîne, hinek jî ji bo ekolojiyê gelekî pêwist e. Heta ji bo jiyanê di dikeke herî bilinde ye. Av hilberîne, ger hilberîn tune be wê çaxê zûwabûnê pêk bê, her der zûwa û hişk bibe, wê çaxê hilberînê jî têk biçe, ev jî tê wateya dawiya dinyê. Talî Thales bi perspektîfek xwezayî li avê dinêrî. Mînak: Heger peykerek li holê be, divê ev peyker ji hin tiştan hatibe afirandin, loma Thales divê ruhê vî peykerî av e, yanê anatomî û cevherê peyker ji avê dizê. Xweşikbûna bedena peyker, şiklê wî, hemû alavên ku tê de hatiye şixulandin giş ji avê dizên. Esil di Talesî de "Av" xweza ye û xweza jî Xweda bi xwe ye.

Anaximandros:

Anaximandros feylesofê mîletosê yê duyemîn e. Di der heqê zayina wî de tiştekî diyar tune ye. Anaximandros, wek Thalesî nafikire ew li gorî bêjinha hişê xwe nêrîneke din derdixe pêş û dibêje cewhera heriştî "Bêpêşî-Bêdawî" ye. Li gorî Anaximandros pîvana "Hewa'yê, Av'ê, ya Êgir" diyarde ye. Her element bo Împaratoriya xwe berfireh bike her daîm dişixulin. Lê tim di navbera wan de pîvaneke bêgavî heye, an jî zagonek xwezayî di têkiliya wan de hene. Yanê Anaximandros dibêje ger av tenê cewher be, wê çaxê divê av di her tiştî de gerek deshilatdarbûya, gerek elementên din têketina bin hikumdariya elementên din. Feqet, element berevajî hevin, agir dikare avê bitefîne, ji ber vê yekê jî tenê elementek nikare bibe deshilatdar an jî bibe abadîn.(3)
Li gorî Anaximandros, divê tiştên li dorhêla xwe em dibînin cûda û cûrbecûr in. Tiştekî weke avê bi sînor û taybetiyên bisînor di xwe de bihewîne, îcar çawa dikare tiştên cûda û cûrbicûr di dawa xwe de xwedî bike, heta beravajî hev in. Mînak; êzing dişewite, lê li gorî feraseta Thalesî ev tişt (yanê şewitandin) jî, teşeyeke ava tîrbûyî ye. Feqet, av naşewite, berevajî tiştekî vedimirîne. Wê çaxê tiştekî weke agir dişewitîne ew ê çawa ji avê çêbûbe, an jî ew ê çêbibe.



ANAXIMANDROS

Agir, ew ê çawa bibe çeşnekî avê. Anaximandros vî tiştî weke notr dibîne û dibêje; ya/ê ku hebûyî divê hîna ji hev veneqetiyayî û ji hev necûdayî ne weke "Abadîn, bêsînor û nediyarbûyî ye" ji vî tiştî ra jî dibêje Apeiron.(4) Di vir de diyalektîk derdikeve ber sifra çavên me yanê guhertin, vajîbûn, dagerîn ango li gorî Hegelî her tişt ji tez-sentez-dijtezê pêk tê…hwd. Yanê ger yek tenê deshilatdar be, divê ên din gerek ji holê rabin, hemû element bi hevre bi awayekî dîyalektîk pevre girêdayîne, têkiliyên wan bi hevdu ra hene. Li gor nêrîna Anaximandros, esasê afirandina xwezayê an jî a dinyê ji bêpêşî(îlksîz) û ji abadînê(sonsuz) dizên.

Anaximenes:

Ev feylesofê dawiyê ye, ew jî feylesofê dibistana Mîletosê ye. Jidayîkbûna dîroka wî baş ne diyar e. Li gorî feraseta Anaximenes kakilê her tiştî "Hewa"ye. Feqet, li gorî Anaxismenes, Hewa" di hundirê êgir de diparzûne(süzülmek) û dûre tîr(yoğunlaşma) dibe vediguhere avê, her ku tîr dibe

vediguhere axê-keviran, li gorî feylesofê me dinya weke maseyek girovere û hewa her tiştî dipêçe an jî hawîrdor kiriye. Yanê di nerîna Anaximenes de jî bingeha hertiştî ji "Hewa"yê hatiye(5)

Talî her sê feylesofên "Dibistana Mîletosê" li ser têgihên xwezayê ramiyane, loma bi xwezayê dest pêkirine û ketine rê û di vê rêwitiyê de her sêyan ji xwe ra lêkolîn, pirs û ramînên xwe afirandine, ji bo ku xwe bigihêjîne heqîqeta hebûnê.

Thalesî, "Hebûn û Vejîna" her tiştî di "Av" ê de dî ye. Anaximandrosî, "Hebûn û Vejîna" her tiştî di (pîvana hersê elementan û bêpêşî-abadînê de dî ye. Anaximenesî, "Hebûn û Vejîna" her tiştî di "Hewa"yê de dî ye. Heraklitosî, "Hebûn û Vejîna" her tiştî di "Agir" de dî ye.

Empedoklesî jî "Hebûn û Vejîna" her tiştî di "Ax"ê de dî ye.

AV: tiştekî şil e, nedawî û nermayî ye loma dibe sedemên gelek talokeyan. Xetereyên ji avê diafirin: Kûfik, bahoz, lehî û şekelî… hwd. Wê çaxê li gorî van têgihan "av" heman demê de deshilatdariyê di xwe de vedihewîne, gava şekeliyak an jî bahozek rabe ew ê gelek tiştan bide berxwe û biherimîne.Deshilatdariya avê tenê ji van tiştan nayê gava av tune be, wê çaxê hemû zindî ew ê hişk bibin û bimirin. Dêmeg av him deshilatdariyê , him jî hewcedariyê di xwe de vedihebîne. Av, deshilatdarê xwezayê ye û perçeyekî xwezayê bi xwe ye. Av, deshilatdarê mirov, ajalan û şênayê ye. Vana giş koleyên avê ne. Wê çaxê av tune be, hilberîn jî dê ji holê rabe, a ku hilberînê dizeyîne dîsa av bixwe ye. Welew mirov dikare wiha bêje pêdiviya hilberînê ji avê heye. Av, çiqasî xwedî hilberîn be, ewqas jî talokeyên wê henin. Av, bi serê xwe elementeke dîyalektîkê ye. Bi kurtasî "av" ji bo hemû jiyanê hewcedariyeke herî giring e. Ango Av=Jiyan e.

AGIR: Ev têgih ji bo jiyanê him xetereyan, him hewcedariyan di kozika xwe de xwedî dike. Agir tiştan zûwa dike, yanê tiştekî zûwabûnê di xwe de dihundirîne, lê av beravajî êgir e. Agir têgiheke ronahiyê-germbûnê û zûwabûnê ye, agir jî têgiheke deshilatdar e welew xurtbûnekê di dawa xwe de xwedî dike. Esil her sê element jî him deshilatdar in û him jî ji bo heyatê hewcedar in . Ger agir bi ku cihî keve, ew cih dibe pîşot û talan, yanê zûwa dike tiştekî li pê xwe nahêle, lê biqasî avê pêwistiya êgir ji bo heyatê hewcedar e. Ji ber ku bo xwarinekê, bo ewlehiyê, bo germbûnê, ji bo ronahiyê… hwd pêwistêyên êgir pirr in. Ango Agir=Jiyan e.

HEWA: Çawa Agir û Av him xetereyên wê û him jî hewcedariyê wê hebûn bo Hewa'yê jî heman tiş derbasdar e. Ger mirovek an jî zindîyek di atmosfereke bêhewayî de bimîne teqez ew ê bimirin û şîn nebin. Lê hewa li gorî herdu elementên din hîna hewcedariya wê heye, ji ber ku mirov an jî heywan dikarin heta demekê bê av û agir bisekinin, feqet hewa ewqasî derfetê nade mirovî û hemû zindiyan bêgav dihêle. Talî hewa jî di jiyanê de deshilatdar e. Lê bê hewa nabe. Ango Hewa=Jiyan e.

Welhasil her sê element ji bo jiyanê di roleke krîtîk de ne. Nefesa jiyanê her sê element in û hemû zindî koleyên van her sê elementa ne. Loma ji hêla hewcedariyê û xeteriyê deshilatdar in. Ji ber vê yekê her sê feylesof ji ber hewcedarî-talokeyên wan elementan dibe ku her sê elementên heyatê deshilatdar dîbin. Talî her sê feylesofên dibistana mîletosê li gor xwe li ser ramiyane, tez-sentez û dijsenteziyên xwe berbiçav kirine. Ev tê vê wateyê ku di lêkolînên xwe de feylesofên xwezayê an jî feylesofên xwezaperest çav deshilatdariya xwezayê ketine û hêdî hêdî pirs, meraq û hwd bi wan ra afiriye.

Têgihiştine ku Xweda element in. Xweda di her sê elemantan de ne. Wê çaxê ên ewilî xweza afirandiye dibe ku hikumdarê xwezayê be?

Jixwe xweza bixwe Xweda ye . Talî her sê feylesofên me ji bo wan Xweda elemantê wan in. Pirraniya wan li ser hêmayên weke stêrk, stêrknasî, hîv, roj, av, hewa, agir, ax û hwd rawestiyane.

Çavkanî:


1)Bertrand Russell, Dîroka felsefeya Rojava, Cîlda yekemîn,Werg,Muammer Sencer,Weşan,Say r,127-128

2) Prof.Dr.Ahmet Arslan ,Destpêka(Têketina) Felsefê,Weşan ,Vadî, r,63-64

3) Bertrand Russell,Dîroka Felsefeya Rojava, Cîlda Duyemîn,Werg, Muammer Sencer,Weşan,Say, r,129-130

4) Prof.Dr.Ahmet Arslan, Destpêka(Têketina) Felsefê,Weşan, Vadî, r,63-64

5)Bertrand Russell,Dîroka Felsefeya Rojava,Cîlda Yekemîn, Werg,Muamer Sencer,Weşan,Say,r,130-131



Di sala 1979'an de li Heremiya Dêrika Çiyayê Maziya Mêrdîn ji dêya xwe welidî ye. Dibistana seretayî û navîn û lîse li Dêrikê xwendiye. Li Zaningeha Dîcleyê beşa Wênesaziyê qedandiye. Niha mamostetiyê dike.

Heta niha du romanên wî ji weşanxaneya Belkiyê weşiyane navên romanên wî : "496 û Roman" e. Her wiha gelek nivîs û çîrokên wî di kovarên weke "Çirûsk," "Heterotopia", "Felsefevan," "Dilop" û " Axa Sor" de derketine. Her wiha gelek wêneyên wî bûne bergên ser roman û kovaran.

Niha jî bi awayekî peryodîk ango bi rêk û pêk rexneyên helbest, çîrok û romana diweşîne di malpera "Diyarnameyê"de. Zewicî ye û zarokekî wî heye.

www.arsivanwadi.org



KELEDOŞ

Keledoş, xwarineke pêjgeha kurd e.
Li herêmên Serhed, Botanê pirr tê xwarin.

Ji koma xwarinên sîr û mastê ye. Li hin deveran cuda bin jî, ji keşkê tê çêkirin. Dahn, nok, goşt û giyayên ku zivistanê hişk dikin, tevlî hev dikin û dikelînin. Ku hazir dibe nan hûrdikin û li ser nan dikin û tê xwarin.

Li Serhedê ji sîr û mastê çêdikin. Berkelîna wê nan an pelhevîrka badayî (hin caran dagirtî), sîr, mast, îsota reş, rûn, xwê ye. Îsota reş di nava rûnê qijilandî de bi ser de dikin.

Li Çewlîg, rojhilatê Kurdistanê, Sêwas û gelek deveran ji dêvla nanê pişirandî, şikevaya pêçandî û dagirtî bikartînin. Li Kanîreşê jê re sîrapel dibêjin, hinekê cuda ye ev.



SER KELEDOŞÊ ÇEND GOTİNÊN KURDAN

Keledoşa herî xweş a xelkê ye.

Keledoşê ne bi kevçiyê, bi destan bixwin lewra kewaniya malê sîr-mast jibîr kiriye.

Her tişt dikele, lê keledoş, didoşe. (Heger pelhevîra dagirtî qul be, ava xwarinê dikevê, dema mirov bixwe dişibe guhanên ku şîr jê tên. Ji bo kewaniyên malê yên ne pisporên viya dibêjin.)

Keledoş xwarina dewlemendan e.

Çavê xizanan li goştê qeliyê ye.

Heger dizê keledoşê ez bim, ka quşxane. (Ango wisa bitehm e ku bi tevî quşxaneyê tê dizîn).

"Zêro" nevîyê êşê, ristevanê evînê

Xwendinek di romana "Zêro" de ya nivîskar Ezîz Xemcivîn



MEHMÛD BADILÎ

Ne karekî hesane li ser helbestvanekî ku têkeve zevîya romanê û xwe bi karekî wisa - ligorî pîvanên romanê- mijûl bike, lê wêje bi xwe cihaneke berfireh e û nivîskarê jîr û xwedî ezmûn li gorî karînên xwe yên hunerî dê karibe tiştekî ber bi çav bide û biafirîne. Li vir pirsek xwe radixe, gelo helbestvanê me Ezîz Xemcivîn yê ku stêra wî li asîmanê helbestê bêhtir diçirse, ta kîjan radeyê di avakirina romana xwe ya bi navê " Zêro " de ku sala 2019an ji weşanên SerSera hatiye çapkirin, bi ser ketiye.

"Zêro" navê romanê ye, Zêro kesayetiya sereke ye di nava romanê de ku hemî bûyer û çîrok bi zimanê wî bi xwe ji cihekî ta bi cihekî dîtir wek bîranînan têne ristin û vegotin, ew bîranînên salane çi kevin û çi nuh, çi yên ku Zêro bihîstine û çi yên ku bi çavên serê xwe dîtine bi rengekî ji rengan di warê danûstinadina wî de bi demê re, bi kesên hawîrdora wî re, bi cih bi xwe re ku her carê ji kavilên bîrdanaka wî bi zimanekî helbestiyane, nerm û tenik dadiweşin, di gelek cihan de di nava bûyeran de tev ku kesayetiya Zêro ya sereke ye di kesayetiya yê nivîskar de wenda dibe, Zêro bi xwe dibe nivîskarê romanê nemaze derbarê hevpeyvîna di navbera kesayetiyan de û helwest û kelemên ku li pêş wan derdikevin, li vir sawîrên Zêro dibin çareserî ku helbestê bi henteşa wê ya bilind derbarê her êşê, kelemê û xemgîniyê, di bin çengê peyvê de birêse, roman wisa bi "peyvê" destpêdike, lê çi peyv, peyveke helbestî û di heman gavê de peyveke alozî. (Peyv bi xwe ji kunca zimanê lerzok bi tewşî direvin... hindek kes hene darê stûr bi destê xwe girtine, û hindek pirs hene li ber deriyên nûçeyan avis in!. Rû 5) Romannivîsê me wisa ji destpêka romanê ta dawiya wê, her carê di rêya henaseya helbestê re bihna xwe vedide û dikişîne.

Kesayetiya Zêro:

Zêro kesayetiyeke xwemal û jînewarî ye, ne xeyal e, ne fantazî ye, wek gelek kesayetiyên civakê ye, lê cudahiya wî ku ew bi xwendina pertûkan û nivîsandinê ve mijûl e. Ji malbateke xizan e, lê ji zaroktiya xwe de dê û bavê xwe wenda kiriye, li ber destê ap û jinapa xwe mezin bûye, jîr e, jêhatî ye, xwendevan e, serê wî bi şîretên perwerdeyî yên rast û durist dagirtî ye, tev ku sêwî ye jî, lê li ser rewiştên baş û qenc perwerde bûye. Ji ber vê yekê em dibînin, di nava romanê de herdem Zêro hewl dide ku nekeve şaşiyan û dûrî tiştên kirêt here weku li ser xêzek rast jiyana wî divê ku bibûre, evîn û jiyanek bi rûmet armanca wî ya sereke ye.

(Tirên nêzîkayiyê li Helebê dike..Rû 18) li vir bîranînên Zêro dîsa tev radibin dema ku çav li wan Kedîgehên Mirîşkan dikeve..

Bûyera ku bi serê dê û bavê wî de têt ku herdu bi ew hesinê kehrebekirî ve jiyana xwe ji dest didin ku bavê wî bi hesinê kehrebekirî ve kehrebe dibe û wisa dêya wî jî dema bi hewara wî ve dihere û dimire. Bi vî rengî Zêro sêwî dimîne, ap û jinap, wî xwedî dikin, mezin dibe, dixwîne, digihê asta ku bibe karmend lê ji hêla ewlekariya dewletê ve ji karmendiyê bi behaneya ku ew li ser dewletê kesayetiyek metirsiye bêpar dibe, Zêro bê çare dibe, bêkarî û gelek pirsgirêkên din yên siyasî û civakî jiyan û mana wî li welêt bêwate dikin, biryarê dide ku ji bajarê xwe (Hesekê) derkeve û berê xwe bide Beyrûtê, wisa Zêro nameya xatirxwestinê ji apê xwe re dihêle û dibe rêbiwar, li Beyrûtê diçe bal hevalê xwe yê zaroktiyê Seydo, li bal Seydo bi cih dibe taku karekî ji xwe re dibîne û wisa jiyaneke nû destpê dike.

Babeta sereke ya romanê:

Di nava her romanekê de babeteke sereke heye, wisa bûyera romanê ya sereke tev li ser digere ji bilî hin bûyerên din dibe ku nesereke bin jî, lê di wê çarçewê de ne, wek pirsgirêkekê divê ku li dawiyê bê çareserkirin. Min hewl da ligorî xwendina xwe ku ez vê babeta sereke bibînim ango pirsgirêka sereke, min nedît ji bilî ew metirsiya ewlekarî ya dewletê li ser kesayetiya Zêro bi xwe, ku hişt dest ji welatê xwe berde û biryarê bide ku ticarî nema li welatê vegere, welatê ku li ber çavê Zêro bûbû zindaneke mezin, daristaneke tev êş û tirs û kuştin û zor û bêparî. (welat zindaneke mezin e..tarî ye..jiyan lê nabe..

Her tişt lê qedexe ye.. (Rû 47). Tev ku Zêro li gorî şîreta apê xwe dikir ku tim dûrî siyaset û jinan here, lê li Sûriyê weku em tev dizanin çi mirovê xwe bi xwendina pertûk û nivîsandinê ve mijûl dikir, di bin çavdêriya ewlekariyê de bû. tev derketina Zêro ji welêt jî, lê dîsa, ji wê çavdêriyê xelas nabe, li Beyrûtê jî, ji hêla ewlekariya Sûriyê ve tê girtin ji ber ku li bal Dolî, jina navosere ya Libnanî kar dikir, ku di heman gavê de ewlekarên Sûriyê hevjînê Dolî dikujin û dûv re wê jî.

Jiyana Zêro li vir ranaweste, kêferatê dike ku karekî dî ji xwe re bibîne, bi alîkariya Agob hevalê xwe yê Ermenî li karekî rast tê, di vê navê de li ser perava deryayê, keçeke Kurd ji malbateke Kurd ku ji sî salî ve li Libnanê dijîn nas dike, navê keça Kurd Darîn e. Zêro yê ku ji himêzeke germ bêpar e zû bi zû dilê wî serî jê distîne, hez dike, ew û Darînê tevna evîna xwe dirêsin û soza şûkirinê bi hevûdû re didin. Gelek çîrok, gelek bûyer,di nava romanê de li ser zimanê Zêro têne ristin, ta bi buhara Erebî ku ji welatê Tunisê destpêkir ta gihişt Sûriyê jî.

Ev bûyerên ha carina bi rengekî helbestî û carina bi rengekî raporî têne vegotin, her weku bîranînan carê li rawestgehekê têne raxistin û herdem yê gotebêj Zêro bi xwe ye, belê ew lehengê romanê ye û ligora xwe peyvan dirêse, ev yek dihêle ku ku hevpeyvîn di navbera kesayetiyan de pir kêm be û rola kesayetiyên din bi xwe hinekî lawaz û qels be di vegêrandina bûyeran de.
Lê ya giring Zêro û Darînê miradên wan bi hev dibin, navê wan ji hêla Nivîsgeha Neteweyên yekbûyî tê bijartin ku derkevin Ewropa û bi hev re li asîmanê evînê bifirin.

Dawî:

Derbarê evê romanê weku em di henteşa jînenîgariya kesayetiyekê de bin, kesayetiya Zêro bi xwe û nîgaş, hizr û ramanên wî di derbarê jiyanê de, jiyana li welêt ku tev êş û zor û zordestî ye, dibe ku çare li vir ne erênî be jî, lê ji bo berdewamiya jiyanê, ji bo hebûnê, ji bo afirnadinê, ji bo hêviyê û ji bo jiyaneke azad, ma gelo yê nivîskar û xwedî pênûs di hindurê zindaneke mezin de, dê çi karibe bike.



MİHEMED HESKO

Birano..!

Rengê dijmin gelek in
Rût, tazî û çillek in
Bi gotin, dost û yar in
Ji dil ve hovên har in
Li hev hatin li ser me

Li hev kirin ji ber me
Tenê ji bo ku Kurd in
Xwedî dîrok û erd in
Ji dîrokê ditirs in
Bê rewişt û ters in

Hovin li me hatin hev
Xweş rojên me kirin şev
Em mane bê cih û war
Ev çi xişm e, ey hawar
Warê leheng û şêran
Naç e ji bîra mêran
Efrîn rind û delal e
Ji dest hovan dinal e.



ZANYAR PAKRİST

Oxirbe ji te re

Oxirbe ji te re
Û rîya te vekirîbe
Liser pî xwe limin nenêre
Tew guh mede min
Êdî ji xatirxwestinê
Dil zelûl bûyê
Bibêhemdî kela min radibe
Ne mexsûze na
Hêsran di qebaxê çavan de
Golgirtine.
Û heftûheşt jê dibarin
Ne bidest mine seknandina wan
Firmêskên ji nav agir tên
Çîye kul be dişewîtê
Hinekî biwa rondikên germ
Birînan dikewînim
Lê êş ew êşaye
Kengî dixwazî pirske
Wê bersiva te bidin
Çavê sorbûyî dilê melûl
Bedena jihevketî
Neku min nizanibû
Wê rojeke bêguman
Eme xatir jihev bixwazin
Lê bes min nizanbû
Ku wê ew ro ewqas nêzik be
Lê hema dîsa jî dibêjin
Oxirbe ji te re berxa min

Çima Ên Hişmend Zêdetir Xemgîn in

Yaqûb Kurmanc

Başî û xweşî diyardeyek e ku mirov bi dijwarî dikare wê di ên hişmend de peyda bike. Hebûna hevparek wefadar di jiyanê de, malbatek pak û şixulekî baş belkî ji bo bi dawîanîna janên derûnî ên hişmend ne bes be. Çend sedemên girîng hene ku rehetiya kesên wiha tevlîhev dike.

1:Pişkinîn û vekolîna diyardeyên jiyanê ên ku hişmendiya wan li jor be her gav dest bi lêkolîn û pişkinîna diyardeyên derûbera xwe dikin. Lêkolîn wiha xûya dikin ku zêde fikirkirin li ser diyardeyên ku nayên bidestxistin, mêriv ji jiyanê westî û bêhêvî dike. Durist e ku ên hişmend di pişkinîna diyardeyên curbecur de gelekî jêhatî ne , lêbelê divê mirov bipejirîne ku hewce nake ku hemû diyardeyan yekoyek li ser bifikirî û lêkolîn bikî. Hin caran jibîrkirina hin tiştan baştirîn dermanê jiyanê ye.

2: Diyardeyên jiyanê li gel armancên xwe yên sereke re beraberî hev dikin.

Ên hişmend di jiyana xwe de tim omîdî û hêviyên wan zêde ne û hergav ev hêvî û xwestekên wan pêk neyên, derhal nerazîbûna xwe nîşan didin. Ev hêvî û xwestekên wan girêdayî beşeke taybet a jiyana wan nîne û belkî di hemû beşên jiyana wan de wekî kar û pêwendiyên wan ligel kesên din re jî girêdayî ye.

3: Ên hişmend her tiştî li ber çavê xwe dijwar û zexm dibînin.

Ên hişmend ne tenê di serkeftin û têkçûnên xwe de belkî di hemû beşên jiyanê de meyla wan ew e ku her tiştî ber çavê xwe zext bigrin.yanî surişta wan wiha ye ku dem bi dem li ser riftar û hewla xwe şirove û lêkolîn bikin û dixwazin bi armancên xwe yên bilind ê jiyanê re beraberî hev bikin.jiber vê yekê bêhemdî xwe dû sedemên ne rast digerin ku xwe pê tawanbar bikin. Ên hişmend carna li ser bûyerên ku berê hatine serê wan difikirin û tenê bûyerek jî ku di jiyana wan de qewimîbe dikare hişê wan lawaz bike û xemgîn bibin.



4: Herdem dû tiştên mezin diçin.

Her çiqasî jiyana wan xweş û rind be dîsa jî bi vê yekê nerazî ne û ji ber hebûna hişmendiya wan ya herî zêde, armanc û meseleyên mezin di ser wan de derbas dibin.arman û meseleyên ku nikarin bidest bixin û dibe sedem ku di jiyana xwe de xweşiyê nebînin. Jiyana normal û hêsan ji bo wan qet nexweş e û hergav li pey tiştên tekane û awarte digerin.Tiştên ku li rastiyê de qet tunenin.

Mînak:gelo tu difikirî ku ev gerînge jîngeha te ya sereke nîne û tu jibo gerînge û serdemeke din hatî çêkirin?!
Ev pirsa jibo kesên wiha normal e û qet ecêb namînin.

www.pirtukurdi.org

5:ti kes wan fêhm nake yan tiştên ku li ser difikirin mirovên normal ti carî nikarin wan tiştana fêhm bikin.

Pêwîst e ku em hemû di jiyana xwe de peywendiyên me ligel hev hebe û em hevdu fêm bikin. Jiber ku di civakê de civîn û rûniştina mirovan ligel hev di kêmkirina gelek paxavan(perîşanî û xemgînî) de tesîra wê heye.

Lêbelê çêkirina pêwendiya ligel ên hişmend pirr dijwar e û tenê hejmarek kêm dikarin ligel wan peywendiyeke dualî çêbike. Bi giştî hest dikin ku tenê ne û wisa guman dikin ku hemû ji wan aciz bûne.

Zanistê îsbat kiriye ku ên hişmend hez nakin ku derbarê tiştên normal yên jiyanê wek xwarin û vexwarin,ger û seyran, werzişê û hwd bipeyivin belkî li ser tiştên girîng û efsanewî di jiyanê de diaxivin.

6: hin vekolînên zanistî nîşan didin ku navbera hişmendiya zêde û nexweşiya derûnî têkiliyek heye,lê gelek zanistvan dibêjin nediyar e ku nexweşiya derûnî ên hişmend jiber hebûna hişmendiya wan ya zêde be, jiber ku gelek nêhêniyên hiş û mejiyê mirov hene ku hê nehatine dozîn (peyda kirin).

Heta eger tûşî nexweşiya derûnî jî nebin, dîsa jî mirov dikare nîşanên perîşanî û xemgîniyê di ên hişmend de peyda bike jiber ku derbarê tiştên derûdora xwe zêde li ser difikirin.

Aqilê wan ê lêgerrîner û nêrînkûr,ew kirine pozisyoneka wisa ku li ser sedema hebûna xwe jî têkevin pirsan û di jiyana xwe de vebîniyek xurt bikin.



www.rasnakurd.org



EDNAN DOGAN

DITIRSIM (LÊNÛSA DILÊ MIN)

Tu yî lênûsa vî dilê min,
kêlî bi kêlî qedera min dinîvisînî.
Ez im canê,
dihesidim, dema çavek li te dimeyzîne,
dihesidim, dema bilbil bo te awazan dixwîne.
Ez, yê te me
tu ya min î
ditirsim, feleka bêbext her xayîn e.

Tu yî xweziya min dildarî,
tirs û xofan çirke çirke bi xwe re tînî.
Ez im canê,
dihesidim, gava bayê îlahî te dihelisîne,
ditirsim; pirpirîkên bax, eşqên biyanî ji tere bine.
Ez, yê te me
tu ya min î
ditirsim, feleka bêbext her xayîn e.

Tu yî hebûna vê dinya min
kef û şahî, derd û kulan bi xwere tînî.
Ez im canê,
dema te xwest can ji bo te dibaxşîne,
dihesidim, dema tîrêjên rojê li rûkên te dixîne.
Ez, yê te me
tu ya min î
ditirsim, feleka bêbext her xayîn e.



ŞEVGER ÇOLO

DAYIKA BOTÎ

Dayê hat yek botî bu
Xweşik ew wek qotî bu
Bi xemla netewî ve
Ji dil milek sotî bu

Gotin vêya derwêşe
Destê wêya bikêşe
Bila bo me rast bêjê
Lê xwiya dil tejî êşe

Vê civaka tevizî
Ta bi çoka lerizî
Nav xwînê de gevizî
Dil ji bona kizkizî

Êşa dayê girane
Bê xwedî bê dermane
Kesek nayê hewarê
Ji ber pencê gurane

www.kurdi.org

Dêrika Çiyayê Mazî

Eyyup Gûven

Dêrika Çîyayê Mazî di Kurdîstana Bakur de li herema başûrê rojhilat deye. Dema mirov bixwaze dîroka navçê fam bike pewîst e bi du alîyan lê binere. Lênerîna yekemîn avakirina navende navçêye, a dûyemin avakirina şaristanê li der dora navçê ye. Ber vê yekê em dixwazin bahsa avakirina navênda navçê bikin.

Avakirina navenda navçê nezî 450 sal berê ji alî qebîla mala Davidê Kalo hatiye avakirin.Mala davidê kalo bi eslê xwe de Kurd e u Ji eşîra Rutan e. Eşira rutan di navenda Erzurum Hozat û Pulumur eşîrek pir mezin e.

Ev qebîla ji herêma dersîmê ber mêrkujiyê koçber dibe û tê sînorê Amedê yê herêma têrkan. Li vê derê gundekî bi navê rutan ava dike. Li herÊma Têrkan mîrekî pir zilimkar he bû gundê derdora wan giş bi vî mîrî girêdaye. Demek derbas dibe li hev nake mîr û zilamê xwe digre ser qebîla mala dawidê kalo u vê qebîlê talan dike. Şerekî pir mezin derdikeve di vî şerî de xwe digîne mîr , mîr dikuje û ji gundê rutan bar dike dema bar dike bi mala Dawidê kalo re û mala Qeya jî bi wan re bar dike û tê heya sinorê Dêrikê.

Dema ev her du qebîlena tê sinorê dêrikê mala davidê kalo li ser zinarê navçê bi cih dibe navê wê herêmê dibe “Gare Rezê Devid” û mala Qeya li berîyê bi cih dibe navê wê herêmê dibe” Xirbê Qeya” an “Mêrga Qeya”. Di vê demê de navenda navça Dêrikê hîn nehatîye avakirin. Dawidê kalo li kanîya guzê qesrekê çêdike û ji wê demê şûn de navenda Dêrikê tê avakirin. Erdnîgara dêrikê sê aliyê we zinar e û aliyê dinê kasi çav çava dibîne berîye û di ro ava ye navçê de deşta Qerejdaxê, Koçer û pir eşîrên mezin li vê derê jiyana xwe berdewam dikin.

Di navça Dêrikê û li gundê Derikê pir eşîr hene. Li navçê Rutî, Abasi, Mahmudî, Salkî, Xidri, Deliki, û Çayî, li gunda bi navê, Sefî, Sorikî, Sarxwanî, Bêreşî, Hamî, Porî, Menda, Metînî, İzolî, Şeyxî,Terkî,û Dewreşekî, heye û giş Kurd in.

Em li avakirina duyemîn binêrin li derdorê çîya û berîya Derikê şaristanek pir kevnare heye, ev şaristaniya di dema şikefta dest pê dike û berdevam dike û digêhêje mîtannî



Akad,Sumer,Pers,Bizans,Roma,Sasanî, Artuk, Med û heya dema 1923yan.

Heyşt taxên navçê hene. Taxa kelê (Taxa rutan),taxa kanîya guzê(Taxa ebassîyan),taxa çîya,(Taxa Fîllehan ,cuhu û salkîyan) taxa kanîka biçûk,(Taxa mahmudîya) taxa reza, (Taxa eso emikê), taxa heramiya taxa tilbisim û taxa qetaro. Navça Dêrikê di destpêkê de heya 1923yan de bi Amedê re giredayî bû ji sala 1923 şûn de bûye navça Mêrdîn.

Dêrik sê alîyê wê zinar e pişta xwe daye çiyayê mazî, berê we li wêrenşarê û qoserê ye. Berrîya Dêrike ji quntarê çîyayê mazî dest pê dike û her gi bi deştê dadikeve bilindiya xwe wenda dike.

www.arsivekurdi.org

Derik sê alîyê wê zinar e pişta xwe daye çiyayê mazî , berê wê li wêrenşarê û qoserê ye. Berrîya Dêrikê ji quntara çîyayê mazî dest pê dike û her gi bi deştê dadikeve bilindiya xwe wenda dike. Li ser milê çepê sînor û erdê wê digêheje deşta qoserê û îklîma wê zivistan û havînan bi dijwarî derbas dibe. Palê bervaren çîyayê mazî bi piranî dar-û-deviyê berî û mazîn e . Di van salên dawî her gi diçe dar û devîye wê zêdetir dibe. Li berîya Dêrikê her çiqas cihê keraç hebî erdê bereket pirtir e.

Li va erd na wek genim, ceh,nisk û nok tê çandin lê belê li Dêrikê ê pir bi nav û deng zeytûn e. Li navçe nêzî mîlyon darê zeytûna dide heye. Zeytunê herî baş cinsê bi navê ”Xilxalî”ye. Piştî van saliye dawiyê hin bin gav û pêngavên li mintiqayê çêbûn û gelek bir hatin kolan çandina weke pembo,garis,kuncî û bîstanê avî zêdetir bû. Li erdê şehar û heta palên qerejdaxê ji çiltuka birincê tê çandin. Ji xendî wan tiştna şûn de rêzên tirî, bahçeyen hijîra, darê hinara, mişmiş û gûz û ji her cureyê fêkî pêk tên.

Debara kesên li nava bajêr rûdinî li ser deman û cenaniya rêz zeytûn û beşekî biçûk dikandarî û bazirganiyê mijûl dibe. Debara gundiyê li hêla çiya rûdinî li ser xwedîkirina pez hejik û ezingan e, ê li berîye ji li ser çandinî û zireetê ye. Ji xendî zireete tişteki bê kirin tuneye.

Di dîroka mêrdin de kîjan devleta û kîjan şaristaniya li ser mêrdîn hukum kiribe Derik jî jixwe ketiye bin hukumdariya wan. Haya demek nêzîk ji qismek mezin ji rûniştvanên Dêrikê Ermenî bûn. Di van salen davî de ji ber sedemên aborî civakî û siyasî Ermeniyên Dêrike ber bi Stenbolê,Sûrî Ewrûpa û Emerîka koç kirin. Ve gavê yek malbatê wan li dêrîkê maye.

Di dema xwe de sennetkarî di destê ermeniyan de bû, di dêrikê bahsa 5 dêran dike yek ji van dêran yên dîrokî “Dêra Sor”e (Surp Kevork) ku li ser navê ermeniyan maye. Dêrîk ji hêla av û çem û kaniyan dewlemendê heremê ye. Piraniyan çema zivistanan der dibe û havînan dimiçike, çemê xabê, çemê şêbê,çemê zorava, û çemê circibê û kidaba kulêbe hin ji wan çeman e. Ji xêndî wan çeman jî hin gol û barajên ji bona avdanê bi navê Kunreş, Subetan,Qurixî û sepnat ê, ku ji terefê dewletê hatinen çekirin. Kaniyê di navçê de kaniya kulêbe, kaniya guze kaniya buçûk û kaniya misrikê, kanîya paan e, Dêrîk bi ser sînorê Şemrex, Qoser, Sere Kaniyê û Wêranşarê ye. Rû pîvana Dêrîkê 1397 km kare ye 71 gund û 91 mezra heye. Lê berk û statuya gunda hat guherandin bûne tax, bî gîştî hejmara navçê 61.200 e.

Raqima dêrikê 780 metre ye û bilindahiya çîyayên wê 1500 metreyî derbas nake. Çiyayê wê bi navê çiyayê mazî tê bi nav kirin. Dêrik bi beriya xwe li ser sînorên deşta heranê ku heta dighe erdên Nisêbînê ye. Berîya Dêrike bi kevirê şehar in. Girqijotên ji berî dirokê de teqiyane û wan derdora belav bûne. Vê gavê ji wan qirqijotan maddeya ku bi navê “klinker” e û di çêkirina çimento de wek haven tê bikaranin û derdikeve.

Navça Dêrikê di warê siyasî û edebî pir niviskar û rewşenbîr lê mezin bûye. Wek mele Hesenê Tawikî, Melle Eskender kazîm, Seydayê Cigerxwîn, (seydayê cigerxwîn li dêrîkê li cem seydayê mele eskender şagirtî kiriye.) û wek bûka derikya Eyşe Şan. Lê belê ên li Dêrikê xwedê daye wek Reşîdê kurdî,Qedrîcan, Edîp Qarahan û wek rewşenbirê ne navdar Ezîzê Biro, Mecîto, Ahmedê Cimaa, Eliyê Sitika. Ên mîn navê wan nenîvîsandiye nêzî pêncî nîvîskar û hunermendê xwedî behrem û xelatgîrtî ye heye.


Di warê siyasî de gava herî mezin ku li Dêrikê mezirandina “Kurt Kulubi”ye. Lê belê mirovê “Kurt Qulubi” damezirand giş hat girtin an dadgeha mezin daliqandin ji mirovê qulebe xwest. Wek bi navê Heci Seydî û di dema şerê şêx seîd de wek bi navê Mecîto.
Li navçe dîroka şaredariyê di sala 1874an de dest pê dike. Berê navê wê mahfel û paşî bi navê “Xelqebî “berdewam dike. Di sala 1926an de bû “Şaredarî.”

Rolê Edebiyatê Li Ser Demê Koronayê

Elind Mizûrî



Koron (covid 19) ew peĵîka hemû cîhan heĵandî û bûye reşeyek bo hemî mirovan, îro cîhan hemî weke zîndenekê lê kirye, lewra ev serdeme dê bîte qonaxek taybet di hemû beyav û sikterên ĵiyanê de, her weha dibe werçerxanek di beyavên wêĵeyî edebiyatê de, çimkî edebiyat beşek herî mezin e di ĵiyana xelkî de ،û eger ne ĵi egerê vederbendbûna xelkî di malan de, dibe hander ku xelkekê xwendevan zêdetir penayê bibe ber xwandinê û zêdetir nêzîkî pertûkan dibin û bi taybetî nivîskar û rewşenbîr.



Ev qonaxe dibe westgehek edebî wêĵeyî û dê cêwaziya xwe hebît ĵi her qonaxek dî, ger bibînîn yan hest pê bikeyn rêĵek mezin ĵi nivîskaran miĵûlî nivîsînê bûne , heya niha di karim bibêĵim ku hiĵmarek berhemên edebî wêĵeyî hatine nivîsîn ku taybetmendiya vê qonaxê pêve diyar e û zorbeya herî mezin li ser barûdoxê îro yê peĵîka koronayê ye û rêĵeya mezintir helbest bûye, çonke helbest asantirîn rêka derbirînê ye di her kawdanekî de ĵi her miĵareke dî ya edebî , ji ber wê êkê helbest bûye dergehê şîret û amoĵgaryan û hişyarkirna xelkî li ser metirsiya peĵîka koronayê ya ku bûye egerê ĵêk dorbûn û veqetyan û vederbendbûna wan.



Her wesa ger li ser stranê ĵî birawestîn hindîke helbeste stûna serekî ya stranê ye û çendîn stran hatine dirûstkirn ev çende ĵî bûye hokar ku helbest di wê berfirehiyê de bi bihête dîtin çi helbest mîna be yan ya biçûkan be , çonke îro peyama her dû rengan êk peyam bûye û her weha gotarê ĵî rolê xwe dîtiye,l ê goman nîne ku miĵarên dî yên wêĵeyî ĵî dê diyar bin wek çîrok û roman û pexşan, lê çimkî ew zêdetir pêdîvî bi diriştinê û demî karîkteran e, ĵi ber wê êkê demek dirêĵtir divêtin.

www.kurdiyakurdi.org

DI KULTURA KURDÎ DE KOFÎ

Hüsamettin TURAN

Li ba jinên Kurd, gellek babetên girêdanê hene. Em dê tene li ser kofîyê bisekinin. Kofî perçekinceke Kurdî ya neteweyî ku taybetî ji bo jinên Kurd e. Xweşikî û masûmîya jinan îfade dike. Serê jinan piranî bi rengên zer, sor û kesk tên xemilandin.

Kurdistanîbûnê herî zede ev reng îfade dikin. Kofî, perçekinceke jinan e ku bi hezaran sal in wekî aksesûar tê bikaranîn. Çêkirina kofî weha ye: Kofî di textê hunandinê ku ji re "elbik" tê gotin tê hunandin û di nav wê de qedîfeya ku dişibe qûmê hey. Perçeyên bi reng wekî heft guliyên por bi kofîyê tên girêdan.
Herweha li her kofîyê nîv-zêr tên pêvekirin. Li gorî rewşa malbatan li hin kofîyan 24 zêr tên pêvekirin. Hinek jî ji vê hejmarê kêm an zede ne. Li Kurdistanê kofî herî zede ji aliye jin, keçen ciwan û meran ve tê bikaranîn. Berê piranîya jinên Kurdan kofî bikar danîn.
Hin jinên ciwan li ser kofîyê çarçef jî bikar tînin. Jin û keçên ku tene kofî bê çarçef bikar tînin jî hene.

Jinên îxtiyar kofîyan bê çarçef bikar tînin. Lê herêma Serhedê li Kurdistana Bakur, beravajîyê vê ye. Jin berê çarçef li xwe dikin û kofîyê jî li ser çarçefê gire didin.
Li bajaran an jî li riyan wexta mirov jinên bi kofî dibine, ji kofî û kincên wan mirov dikare texmîn bike ku ew ji kuderê ne. Ji kîjan eşîrê ne jî tê texmînkirin. Kofî û kincên jinên eşîretên Kurd li Kurdistanê ji hev cuda ne. Aksesûar ji kîjan malbatê hatîne nişan didin. Li Kurdistanê motîfên kofîyan li herêman cuda ne, ji ber vê jî em dikarin wan li gorî herîman kategorize bikin. Mînak: Herêmên wekî Dêrsim, Serhed, Colemerg (Hekarî), Koçgirî, Amed, Behdînan, Xerzan, Bişêrî, Çikakî, Erdelan, Hewreman, Deşta Berrîyê, Toran nuha jî tên binavkirin.
Di lêkolînên kulturîyên di derbarê folklora Kurdî de divê ev herêmên cuda bên analîzkirin, ji ber ku her herêm xwedîyê motîfa taybetî ye, wekî mînak Adiyaman, Sîvas, Mereş, Meletî, Erzincan, Erzurum, Dêrsim, Agirî, Wan, Betlis, Mûş. Taybetî jî jinên Colemergê kofî bikar tînin.
Li bakur û başûrê Kurdistana Bakur taybetî jî jinên extiyar kofî bikar tînin. Jinên zewicî ku kofî bikar tînin, sîngê wan girtî ye lê bi reng e. Li ba keçikan girêdana serî bi reng e, lê sîngê wan vekirî ye. Ev tê wê maneyê ku ew keçen ezeb in. Jinên zevicî û ezeb ji ber vê yeke kofîyên cuda bikar tînin. Îro ji ber bajarvanî û modernîteyê ev edet asîmîle bûne. Êdî şuna kofîyan, leçek û çît girtine.
Tiştên ku ji zaroktîya min tên bîra min jinan kofî piştî nîşanê gire didan. Berê wê ya serê wan vekirî bû yan jî bi çît digirtin. Maneya wê ev e: Ev kes dergîstiya hinekan e. Bi vê, rê li ber tacîzan jî dihat girtin. Bi gotineke din li ba Kurdan kofî ji keçikî derbasbûna jinbûnê ye. Ev jî bi dergîstîbûnê dest pê dikir. Ev dihat wê maneyê ku ew dê êdî ji hinekên din re nebûya jin. Di derbarê meran de baş nayê bîra min, lê li ba meran ew zûtir dest pê dikir. Ev sosyolojîya Kurdan jî nişan dide. Kofî li hin herîman ji keçe tê hunandin.

Li ser wê jî şar tê girêdan. Jinan, zêr û zîvê xwe yê herî girîng li pêşîya kofîyê gire didan. Biskên xwe bi awayekî gulî dikirin û li nêzî guhan bin kitayê dihatin girêdan. Kitan di bin çenge de beşê sîngê dixemiland. Li gorî rewşa aborîya malbatê kalîte û şiklê kofî dikaribû cuda be. Jinan piştî emrekê kofî ji sere xwe danîn, ji ber ku keçe wekî qûm giranî çê dike û rê li ber serêşê vedike. Lê dîsa jî hin jinên aristokrat heta mirinê jî kofî bikar danîn. Yên kofî derdixistin jî, çît bikar danîn ku ew jî carnan dibû sebebê serêşê.
Îro li Kurdistanê kofî zede nayê bikaranîn, lê li hin herêman hîn jî hene.
Hêvî dikim ku li Kurdistaneke ku bingeha xwe ya taybet û azad temam kiribe, bi beşdarîya kesên ku dile xwe dane folklorê dezgeheke aksesûarê ya Kurdistanê ava bibe. Dikare bi rîya dezgehên weha dewlemendîya folklora Kurdistanê derkeve holê.

BIHARÎSTAN



Biharîstana min

Biharîstana welatê min

Her deverên te bûye gul û gulîstan

Li rûyê te xwezayî şîn bûye

Mêrg û çîmen vebûne

Her alî kulîlkên reng bi reng

Gul û nêrgiz şîn bûne

Li her deşt û newalan

Li her rûbar û berpalan

Baxê lalezeran hatine raxistin

Sor dikin wek xwîna Cangoriyan

Kaniyên kena derbûne

Delav delav co bi co

Wek rûyê dîlber û gulşenan

Her alî ve jê evîn diherike

Xwisîya şevê li ser gerdanê te

Bilqok bilqok dibiriqî

Meya eşqê diciviya

Li nav xalên bin guharan

Ez ê xwe bavêjim meyxana dile te

Bang bikim li saqî

Qedehek mey bîne ji xunava gerdenê

Vexwim avjîna qedîm bimînim li jînê

Li ser rûyê vê dunyê.

Biharîstana min

Stêrk ji ezmanê çavê te dibarîn

Hîv ji şerma rûyê te çûbû ava

Roj li hember bedewiya te

Zer dibû weke şimayê diheliya

Bayê qederê serxweş bibû

Çerxa felekê şikiya bû

Çendik û çend milûk û şahînşah

Textê wan wergeriyan

Û taca serê wan ketîbû

Çend hezar alem hatin

Jiyan li ser parzemîna te û çûn

Çiqas dem borîn çiqas qîrne derbas bûn

Tenê Yezdan ma qedîm

Yek jî tu yê qedîm bimînî heta dawîya dinê

Baharîstana min.!

SEYFEDÎNÊ WELEKORÎ

www.cegiwakurd.org

Gula Ermenî (Gula Keşe)

Evîniya Stranê



NARÎN OMER

Dîroka me Kurdan bi kesên afrêner û cûdawaz di hemî zeviyên jiyan û bexçeyên wê de dewlemend e. Huner û dengbêjî ji wê dewlemendiyê ne.

Huner çiqilekî herî girîng û balkêş e. Em navê gelek hunermend û dengbêjên dilsoz û jêhatî dibînin, lê mixabin gelek ji wan nemaze yên jin hin windayî û hin jî veşartî mane. Hêvîdar im ku karibim çirûskên ronahiyê li ser wan vêxînim.



Gula Ermenî yan Gula Keşe li sedsala nozdehan yek ji wan dengbêj û hunermendên bi cûdawaziya xwe û bi deng û nazikiya hestan navdar e. Navê wê bi navê dengbêjê navdar "Evdalê Zeynikê" ve hate girêdan.

Çîroka Gula Ermenî û Evdalê Zeynikê:

Du çîrok li ser evîniya wan hene. Tê gotin Evdal Zeynikê li gundê Gula Ermenî ahenga zemawenda malbatekê li dar dixist û ji nişka ve çav li Gulê dikevin. Dilê wî bi çavan re semadar dibe û berê xwe dide xwediyê ahingê û wiha diaxive: "Ez hatim li ba we saxlim, nûşîncan û hişmend. Dema çavên min li vê keçikê ketin ez berve cîhaneke din şopandim. Bi Xweda ez ji vir naçim eger tu wê ji min re nexwazî".

Malbat daxwza Ebdêl napejirîne. Lê Evdal bêzar namîne û zanîbû yê bi dengê xwe yê ku çiya dihejîne dê derbasî dil û hişê Gulê bibe. Ew û Gulê di şevbihêrkeke binav û deng de li hev dicivin û distirînin. Gul ji dil û çan jê hez dike û şahiya şûkirina wan li hemî hêlên Kurdan deng dide.

- Çîroka duyem: Tê gotin ku Gul jî hezkirina xwe ji Evdêl re eşkere dike û jê dixwaze ku bibe hevjîna wî. Lê Evdal razî nabe, ji ber ku ew hevjîndar bû, yan din Gul ne ji ola wî bû. Ji aliyekî din vet ê gotin ku malbata Gulê erê nekir. Ji ber ku Ebdal bi jin bû û ne ji ola wan bû.



www.arsivakurdi.org

Çîrok çi dibe bila bibe, lê ya girîng ew e ku navê wan di dîroka çanda Kurdî de hatiye xemilandin û çîroka evîniya wan wek du evîndarên yekcan û yekdil hatiye nîşandan. Dibêjin ku Gulê jineke rind, zanyar û vîndar bû. Lewma di civakê de cihê rêz û rûmetê bû.



Gul hestnazik û peyvxweş bû. Dengê wê mîna solafên Kurdistanê zelal û bi pêl bû. Dikarî bi demjimêran dengbêjî bidomanda. Evdalêl tu dengbêj li hember xwe nedidîtin ku wek wî bistirên, lê Gulê ev yek kir. Sê roj û sê şevan û hin jî dibêjin heft roj û heft şevan li pey hev li beramberî Evdêl stira.

Jidayîbûna Gul: Mixabin li ser jidayîkbûn û kobûna dawî ya Gulê zanyariyên durust neketin ber destên min. Lê rêzdar Mihemedê Ozon dibêje: “Dema Gulê û Evdêl hev nas kirin, Gul pazdehsalî bû û Evdal sihsalî bû.”

Eger Evdal di navbera slên “1913 - 1800” î de jiyaye, helbet Gul jî di sedsala ``19``an de jiyaye û çûye ser dilovaniya xwe. Tu zanarên diyar dikin ku Gul temenekî dirêj jiyaye neketin ber destên min.

Gula Ermenî ji gundê “Xamûrê” bû. Tevlî ku Gul ne Kurd bû, lê dimîne findek ji findên hunera Kurdî. Belê evînî dikare hemî tiştan vajî hev bike û ji nemanê çiraxên hebûnê vede û ronî bike.

Silav û aramî li giyanê dengbêja evîndar Gula Ermenî re.



.....

1. - Ev çîrok di Romana nivîser û romannivîs Mihemedê Ozon de hatiya gotin.

*-Gula Ermenî, tîrêja yekemîn e ji pirtûka min yan bi navê "Tîrêjên vejînê" ye. Pirtûk li ser 18 Stranbêj û dengbêjên jin hatiye amadekirin û çapikirin di çapxaneya SerSera de bi rêvebiriya Dr. Beşar Mistefa. Berlîn, Elmanya.

www.arsivakurdi.org

Hesenê Metê, Nivîskarê Deryaya Ramanan

Mehmed Dehsiwar

Nivîskarê bi nav û deng Hesenê Metê, ku yek ji nivîskarên herî berhemdar e, di sala 1957ê de li bajarê kevn Erxenê hatîye dinyayê. Piştî cûntaya leşkerî ya sala 1980ê wî jî mîna gelek sîyasetmedarên kurd dev ji welatê xwe berda û li paytexta Swêdê Stockholm bi cî bû. Hê di salên destpêka penaberîya xwe de dest bi xebata nivîskarî û wergerîyê kir û di nav salan de bû yek ji nivîskarên herî berhemdar û hezkirî.

Hesen tevî ku nivîskarên bi nav û deng ên mîna Puşkîn, Dostoyevskî, Tjechov û Tunström wergerand kurdî jî, di eslê xwe de nivîskarê çîrok/novel û kurteçîrokan e. Ew bi zimanekî xweş û hêsa xwendevan di nav çîrokên xwe de dixeriqîne û mîna mirîdekî şêxan li pey xwe kaş dike. Dema mirov dest pê dike û dixwîne jî, ta ku mirov bi dawî neyne pirtûkê ji destê xwe bernade.

Naverokên pirtûkên wî têkel bin jî, şik tuneye ku giranîya naveroka berhemên wî civakî û fîlozofîk in. Wî di destpêka nivîskarîya xwe de giranî da kurteçîrokan û ji her awayî ve lê serdest e. Bi zimanê xwe yê hêsan û herikbar ew xwendevanên xwe bi xwe re di çîrokên xwe de lal û bêzar dike. Xwendevan pê re carê digirî, carê dikene û carê jî difikire.

Hejmara berhemên wî gelek in û kurteçîroka wî ya pêşîn Ardû hê di sala 1990ê de hate weşandin. Sala piştî wê Smîrnoff derket. Novela pêşîn Labîrenta cinan yek ji bêtirîn pirûka kurdî ye ku hatîye xwendin û li ser hatîye nirxandin, di sala 1994ê de derket. Epîlog di sala 1988ê û Tofan jî du sal piştre hate weşandin. Gername ku tê de behsa gera xwe ya Kurdistanê dike, di sala 2005ê de weşîya. Gotinên gunehkar di sala 2008 û Îşev jî salek piştî wê gihîşt xwendevanan. Novela Li Dêrê du sal piştre û Pêsîrên dayê jî di sala 2003ê de derçûn. Piştî çend salan novela wî ya bi navê Hevsar di sala 2018ê de hate weşandin. Gelek ji van pirtûkan bi tirkî, erebî û swêdî jî hatine wergerandin. Ez ê hewil bidim ku li ser xebat û berhemên wî çend gotinan bînim ziman.

Hêvî dikim ku ez ê bikaribim bi van rêzan hunera wêjeya Hesenê Metê bi xwendevanan bidim hezkirin.

Di çîroka Îşev û çîroka dawîn de nivîskarekî ku hewil dide ser nivîskarîye xwe tîne ziman. Çendî ku nivîskarê çîrokê hewil dide jî, di nivîsandinê de zehmetî dikşîne û bêjeyên ku dixwaze nikare bîne zimên. Ew ji hêlekê ve li ser difikire û ji hêlekê ve dibihîze ku bi dengekî nizim û ji kûrî ve derî vedibe. Ew guh nadê vê û wisa dihesibîne ku deng şaş bihîstîye. Ew pê ketîye û hewil dide ku jîyana xwe bîne ziman û binivîse, lê bi ser nakeve. Paşê ew serê xwe di ramanên kûr de bilind dike û wê li hember xwe dibîne; porşehkirî û bi bedewîya xwe lê dinêre.

Çend rêz ji Îşev û çîroka dawîn:

”Ez îşev nayêm”, ew devliken dibêje. Ew bersiv nade. Ew wisa bawer dike ku wî nebihîstîye û careke din dibêje:

”Min got ez îşev nayêm. Ez ê hemû şevê bi Şeytên re bim, pê re kêf bikim û pê re razim:”

Ew bersiv nade, lê ew li benda bersivekê ye. Ew naxwaze têkilî pêwendîyên wê û Şeytan bibe, lê ji bo ku gotinên wê bi dawî werin dipirse: ”Û paşê?...”
”Paşê …” ew dubare dike, lê nikare bersivê bide. Ti peyv nayên bîra wê. Û hingê ew peyva dawî ya serpêhatîyên xwe dinivîse: ”Paşê…”
Paşê ew fêm dike ku çîroka wî dê qet bi dawî neyê. Her mîna ku dawîya jîyanê nayê û bi hevdu re nayê girêdanê.
Hesenê Metê pirê caran îronî dike û ji xwendevan re behra ramanan dihêle. Dixwaze xwendevan di serê xwe de hebekî bifikire û bide pey yan jî beşdarî bike.

Tenêtî yek ji babeta ku nivîskar car bi car lê vedigere. Her wiha dojeh û evîn; bêtirîn evîna platonîk û azad. Gelek tiştên ku ew di çîrokên xwe de tîne ziman tabû ne û dikare serê xwendevan têkel bike. Ji ber wê ye ku Xwedê û Şeytan di gelek çîrokên wî de cî digirin. Ew evîna xwe bi awayekî feylesofî bi Xweda ve girê dide lê her wiha qederê jî bi zanyarî mehkûm dike.

Îronî û ramanên ku Hesen dixwaze bîne ber çavên xwendevanan, ji rastîya jîyanê tên. Ew li hember tenêtî û xweragirtîyê giranî dide pêwîstîya hewcedarîya mirovantîyê û pêwendîyê. Ew van tiştan bi hêsantî dike ku bala mirov dikşîne û rê dide ramyarîyê.

Di Çîroka dawîn de nivîskar evîneke qedexe tîne ziman. Behramê şaîr dibe evîndarê jineke bîyanî ku navê wê Yelda ye. Ji ber ku ew zewicîye, pêwîst e ku ew evîna xwe veşartî bihêlin. Piştî ku jina wî pê dihise û zorî didê, Behram soz û bext dide ku dev jê berde. Lê piştî ku Behram dev ji Yeldayê berdide, bi nexweşîneke giran dikeve. Herdu evîna xwe di hundirê xwe de vedişêrin û ji hevdu vediqetin da ku malbata Behram parçe nebe.

Behram ji ber nexweşînê dixin nexweşxaneyê û jina wî dibîne ku mêrê wê roj bi roj ber bi mirinê ve diçe. Ew tavilê tê digihîje ku mêrê wê ji ber evîna Yeldayê nexweş ketîye û dike bimire. Jina wî paşê ti çareserîyê nabîne û nameyekê ji Yeldayê re dişîne ku were û di salên dawî de li ba wî bimîne, pê re bijî. Tevî ku dilê wê pê pir diêşê jî, naxwaze mêrê wê di rojên xwe yên dawîn de bêyî evîna xwe bimîne.
Rojeke dema ku Behram çavên xwe vedike û dibîne ku Yelda ber bi derî ve tê, ew difikire ku ew êdî mirîye û li behiştê gihîştîye Yeldayê. Yelda jê re bi zimanekî şêrîn behsa nameya jina wî dike û alîkarî dike ku Behram bi ser xwe ve were.
Behram tevî evîndara xwe li hember penceşêrê û mirinê tokoşîn dide û di dawîyê de bi ser dikeve. Doktor bi xwe jî heyirî dimînin ku Behram baş bûye.

Piştî ku ji nexweşxaneyê derdikevin, herdu bi hevdu re diçin mala Behram. Jina wî ji nişka ve dibîne ku mêrê wê di gel qehpika Yelda tê malê, nizane ka ku bigirî an jî bikene. Bêyî ku tiştekî bêje, derî ji wan re vedike. Ew her wiha çay û kulîçe jî datîne ber wan, lê ne berê xwe dide jinikê û ne jî pê re diaxive. Ew di vir de dixwaze bandora evînê û nakokîyên wê bi awayekî xweser û guhertî bîne ber çavan.

Çîrok bi serê xwe ne çîrokeke yekane û bêhempa ye, lê ew bi awayekî wisa xweş û bêjeyên wisa guhertî hatîye hunandin ku mirov pir jê hez dike. Stîla ku ew dinivîse mirov bi xwe ve girê dide û dide fikirandin. Tevî ku ev çîrok bi tenê çend rûpel in jî, mirov wisa bawer dike ku mirov pirtûkeke qalind xwendîye. Jixwe Hesenê Metê jî mirov bi vî awayî dixe bin bandora edebîyata xwe.

Hesenê Metê bê şik yek ji wan nivîskarê herî bi bandor e û wisa jî xweş û bi çêj dinivîse. Ew ji kûrahîya dilê xwe dinivîse û di serê xwendevanan de pirsên nû û piralî vedike. Çi mixabin ku xwendevanên zimanê kurdî kêm in, lê heke wî bi zimanekî bîyanî binivîsanda, ew ê teqez bibûya yek ji nivîskarên herî navdar ên cîhanê.

Peyvin Ku Ajalvanên Xorasanî Bi Kar Tînin

Peyam Xorasanî

Her kesî ku kurdan nas bike peyvendiyên wan ser ajalan jî dizane ku xwediyê çandek bingehî ne , ji ber vê yekê ku bo hemû qesmên ajalan peyveke taybet di nav zimanê kurdî de çêbûye.

Lê ji ber vê peyvên ser ajalvanî li Xorasanê zêde neguheriye û esla xwe dagirtiye. Min hinek peyv ser ajalvaniyên Xorasanê amade kiriye lê hîn jî zêde peyv hene ku mixabin dem çê nîne ku hemî binivîsim.

Heywan
Perende/firinde
Mirîşk
Dîk
çêlik : zarokê mirîşkan
elok
pûndik

dewar
Pez
mî/mih
pezkovî
pez qer
pezê sor
pezê sîs : pezê spî
pezê beş
pezê qemer : pezê esmer en rengtarî
pezê beş
pezê qerqaş
pezê serireş
pezê serisîs
Beran
Berx
kavir
Berindîr : berxên mê 1 ta 2 salî
xanberindîr : mihê 2 ta3 salî
berindir : berxêm nêr 1 ta 2 salî
Hogeç : beranê çarsalî
Bizin
Kar
Bizina çûr : bizina bi tiftik
Nêrî : bizinê nêr
Karik : karên hûr
Gîsk : karên 6meh heta 1 salî
Tiştûr : bizinên 1 ta 2 salî
Bizaştir : bizinên mê 2 ta 3 salî



www.arsivakurdi.org



Hevûrî : bizinên nêr 2 ta 3 salî
Qertenêrî : bizinên nêr ku kal bûye
Kerî
Sexel : keriyê berx û karan
Dirûf/dirîv : teto an nîşan kirin
Hevrîng : meqesên gir (bi taybetî bo birrîna hiriya mihan)
Berxbir : kesên ki hirî berxê dibire
Berxşo : kesên ku berxê piştî hirî birîn dişo
Bêrî : cihê ku mih an bizinan didoşe
Dotin/dohtin
Dûw/dûv
Daw : beranê bi daw
Boç/boçik/doçik
Koz : kom kirina ajalan
Xesandin/gon kişandin : Exte kirin
Gom : xaniyê ku pezî yan dewaran yan naxiran an pêrehan
Ga : Ga nêr
Canege : Ga ciwan
Mange : Ga mê
golik : çêlên yan gayên hê biçûk
nogin : çêla êdî ne golik û baqole ye lê hê nehatiye jiyê zanê

Leş
Gan : gandîl
cîcik : gupika memikê
kezeb : cegera spî
çîger : cegera reş
pizdan : hevalzarok
zêdan : rehm
Gurçî : gurçik
şîlaf : şîrdan(jê meya bo penêrê îstefade dikin)
fatik
Hûr : ûr
stû/uskor
Rûvî zirav
Qirtik
Herî : hirî

Nexweşî
Qolinc : zikêşa
zerik/zerdî : nexweşîya Jaundice
nexwşîya reş : Anthrax , hebreş , hebreşk , tebe , hebxurî , şerb , şêrpençe
Mûmar : nexweşîya Intestinal worm
Gurî : nexwşîya gurî bûn
piftik : nexwşîya Blisters
Kunêr : pirzik,pizirûk,xişrûk, zirpik, pizrik, niqteyên sor yên dikevin leşî
Ta : agirê ku jiber nexweşîye dikeve leşê
Gahnreşk : nexweşîya guhan
kurmî : nexwşîya ku leş kurmî dike
keplek : nexwşîya ku ceger kepekî dibe
Nexwaşîya tebeqê : Picorna virus
nexwşîya sil : TB disease , nexweşîek zûxavî ku pircaran mirov dikuje
Nexwaşîya Yaman : nexweşîya Glanders , sîrace (nesaxiya ku navbera însan û hespane)

www.arsivakurdi.org

Bextewarî, Hevaltî, Trajedî û Huner di Ramanên Arîstotalesî de Alî Gurdilî

Arîstotales, B.Z. di sala 384an de, li Madedonyayê ku wê demê Qraltiya Yewnana Kevnare bû, hatiye dinyayê. Bavê wî, doktorekî qraltiyê bûye. Tê zanîn ku piştî demekê Arîstotales wekî hosta û feylesof hatiye nasîn û hêdî hêdî bûye feylesofekî xwedîbandûr. Karê wî ê pêşîn û girîng, mamostetiya taybet a Skenderê Duquloç bûye, ku piştre Skendêr bi armanca keşfa dinyayê ketiye rê. Arîstotales, piştî demekê berê xwe daye Atînayê û bi Platon re xebitî ye, lêbelê li wir jî namaye û rêya xwe berdewam kiriye. Bi navê 'Lîseyê' (The Lacium) dibistaneke piçûk damezrandîye, ku lîseyên fransî îro jî bi vî navî têne nasîn.



ARÎSTOTALES

Arîstotales dema dipeyîviya yan bi yekî re dikete minaqeşeyê, rûnedinişt û digeriya û ji şopgerên xwe re, digo 'peripatetics', yanî digo 'gerok'. Pirraniya kitêbên wî, notên wî yên dersdariyê bûn. Tiştê ku herdem jê şaş û ecêbmayî maye, xebîtîna dinyayê û nesneyên xwezayî bûne û loma jî, gelekî di bin bandûra wan de maye.

Pirsên mîna 'Varikek, di hêkê de çawa mezin dibe?', 'Masiya mirekebê, mirekebê çawa çêdike?', 'Cactus, çima tenê li deverekê hêsîn tê?' û a herî girîng jî, 'Jiyana mirovan çawa û bi çi hawî, dikare başbibe û bi pêş bikeve?' ji bo wî gelekî girîng bûn. Felsefe, ji bo Arîstotales zaniniya pratîkî bû. Loma jî, bersiva gelek pirsên girîng daye.

Yek: Tiştê ku mirovan bextewar dike çi ye gelo? Di 'Etîka Nikamakhos'ê de, hewl daye xwe ku wan faktorên ku bandûrê li jiyanî mirovî dikin, raxe holê. Dibêje ku temamiya mirovên serkeftî, xwediyê hinek wesfên diyar in û xwediyê hinek fazîleta ne. Li gor dîtina wî, divabû em jî têbigihêjine wan wesfan, bibin xwediyê wan û bikaribin wan vebiguhezine hinek kesên din. Li gor nêrîna Arîstotales, yazdeh erdem hene, ku ew jî ev in: wêrekî, maqûlî, azadî, bêhempatî, gewretî, anor, sebir, rastgotî, jîrîtî, hişmendî û nefsbiçûkî.

Arîstotales têdigihêjê ku hemû erdem, di navbera du mezîyetan de cih digrin. Wate, di navbera du wesfên dijraber de ne. Ji vê têgihiştinê dide rê û dibêje 'Rêya Navînî'. Mesela di kitêba duyem ya li ser etîkê de, behsa kêf û şahiya ji hedê xwe zêde û bêhntengiyê dike. Li gor nêrîna wî; axêveriya baş, kilîda jiyaneke baş e. Ji ber vê yekê jî, li rê û rêgehên axêveriya baş vedikole.
Li gor nêrîna wî; hinek mirov, bi ser nakevin. Çimkî ne esprîtuel in. Ev rewş jî, bêhna mirovan teng dike û dibe sebebê, aciziyê. Di rewşekê wiha de jî, dê behsa miroveke ku bi kêrî tu tiştî nayê, xeydok e û bi kêrî têkilî û danûstandina sosyal nayê, bê kirin. Lêbelê kesên din, yarî û henekan wekî rê û rêgeheke bikar tînin. Palyaçoyek, li hemberî henekekî nikare li ber xwe bide. Rêzê ji kesî re nagre û dibe sebebê ken û tîqetîqê. Û gelek gotinên ku hinek nikarin xeyala wan jî bikin, dike.

www.sivanrudi.org

Mirovê xwedîerdem, li vir emelê zêrînî ye. Hişmend e, lêbelê kubar e. Arîstotales tabloya temamiya erdeman, di lewnê emelan de amade kiriye, ku bi rastî ev xebat hêjayî pesinandinê ye. Gotiye ku wiha zû bi zû, em nikarin tevgerên xwe biguherînin. Lêbelê, guherîn pêkan e. Li gor nêrîna wî; başî, encameke kurmên (hînbûnî, habit) mirovî ye. Lewma jî, jê re wext, wêrekî û fersenda kirinê, divê. Dîsa li gor dîtina feylesof; mirovên ku ne dilpak (xwedîerdem) in, ew ne mirovên xirab in; lêbelê, mirovên bêsiûd in. Loma jî tiştê ku pêdiviya wan pê heye, ne şermezarî yan heps e. Pêdiviya wan, bi perwerdehî û mamosteyên, baş heye.

Dido: Huner ji bo çi heye? Di zemanê Arîstotalesî de hunera herî xwedîbandûr, trajedî bûye. Wê demê, Atînayî di mihricanên gel de li şanogehên mezin, li şanoyên xwîndar û tirsdar, temaşe dikirin. Aeschylus, Epirides û Sophocles, wê demê şairên targedyayê yên navdar bûn. Arîstotales, 'kitêba, gelo meriv çawa dikare şanoyên baş binivîsîne?' nivîsandiye: 'Poetika'. Di kitêbê de, zanînên giranbiha hene. Mesela gotiye ku di dema tengasiya lehengan de, hay ji 'poipetia'yê hebin û bikar bînin. Di keştiya Tîtanîk'ê de, Leonardo di Caprio û Kate Winslet'ê bi hev re ne (spehî). Lêbelê, keştî li çiyayê qeşayê dikeve (hêwilnak). Anagnoresis, demekê ronahîdar e ku leheng têdigihêje trajediya jiyana xwe.

Trajedî, ji bo çi ye? Çima hewqas mirov têne cem hev û serboriyên hêwilnak yên lehengekî protogoist temaşe dikin? Ji bo têgihiştina vê rewşê, em dikarin behsa Oidipusî bikin, ku bi şaşîtî bavê xwe kuştiye û piştre jî, bi diya xwe re zewicîye. Piştî ku têdigihêje çewtiya xwe, poşman dibe, çavên xwe derdixe û xwe kor dike.

Li gor nêrîna Arîstotales, ev yek 'catharsis' e. Catharsis, ji xirabiyan destşûştin e. Di vê rewşê de, divê em behsa pakijkirina hestên xwe bikin. Bi taybetî jî, sergêjiya li der û dora, hesta tirs û dilşewatiyê. Li vir, hinek arîşeyên xwezayî xwiya dikin: dema lazim dibe, em bi dilşewatî tevnagerin û meyla me, li ser tirsên ecêb û hêwilnak e. Trajedî, tîne bîra me ku bûyerên xirab, dikarin werin serê me jî. Zelzele yan leqîneke hêdîka jî, dikare jiyana me bi temamî serobino bike. Ji bo vê yekê jî, li hemberî mirovên ku dibine sebebê encamên xirab, divê em bi dilşewatî tevbigerin û ne bêrehm bin. Pêdivî pê heye ku ev rastiyên girîng, bi awayekî hevpar (collective) û li ser bingeheke seculer, werin fêrkirin. Li gor nêrîna feylesof, erka hunerê ew e ku rastiyên jiyanê herdem bîne bîra me û wan, di hişê me de bihêle.

Sisê: Heval ji bo çi ne? Di kitêba 8 û 9 a 'Etîka Nikamakhos'ê de behsa sê hevaltiyên cihêreng dike: A yekem, hevaliya kêf û şahîniyê ye. A duyem, hevnasiya stratejîk e. Ev herdu hevaltî jî, heta ku avantaja hevalan hebe, hevaltî berdewam dike. A dawîn jî, hevaltiya rast û dirist e û a rastîn jî, ev e. Di hevaltiya rastîn de, dibe ku meriv neşibin hev. lêbelê, hevaltiya rastîn xemxwarin e. Derdê hevalê te ê rastîn, derdê te ye. Keyfxweşiya wî, keyfxweşiya te ye û ev yek, li hemberî mirovên din, te xeydok dike. Lêbelê, dibe sebebê hêzdariya te jî. Tu ji sînorên waswas û ramanên xwe, derdikevî. Jiyana yeke din jî, digrî nav jiyana xwe û dilê xwe, fireh dikî. Tu jîrtir, hestnerm û bêtir alînegir dibî. Erdemên xwe, parve dikî û xuy û xisletên xwe yên xirab, tune dikî. Hevaltî, xwebûnê fêrî meriv dike û beşa herî xweş û geş, a jiyanê ye.

Li dinyayeke ku meriv herdem pê mijûl e, raman çawa dikevin serê meriv? Yan jî, meriv çawa dibe xwedîraman? Mîna gelek mirovan, Arîstotales jî di bin bandûra sebebên biserneketina mirovan de mabû. Li çareseriya, vê meseleyê geriyaye. Wê demê li Atînayê biryar, axlebî di civînên aşkere û ayan de, dihatin girtin. Pirranî jî, li Athoratê. Mirov, ji bo belavkirina ramanên xwe yên populêr, diketin pêşbazîyê. Arîstotales, behsa şexs û temaşevanên ku dikevin bin bandûra rewşeke dermantiqî, yan deradetî kiriye û vê dîtina xwe, derbasî ser kaxêz kiriye.

Mirov, vê yekê tehamûl nakin. Ji nîqaşên populêr direvin, lêbelê Arîstotales bêtir dilxwaz e. Hunera retorîkê a ku em niha hê jî bikar tînin, ev e. Arîstotales, ji mirovên xwedîfikr, dilpak û cidî xwestiye ku li hemberî mirovên ku ne di dereceya wan de ne, bi rehm bin, wan kane bikin û vê yekê fêr bibin. Carinan bêwext, bala mirovan daye ser hinek meseleyan: Divê hûn tirsa mirovan bibînin û dilê wan, rihet bikin. Divê hûn aliyên hestyar, a meseleyê jî bibînin. Gelo ma dilê miroveke maye? Ma şerm kiriye? Divê hûn li gor vê yekê tevbigerin. Divê hûn rewşa heyî, veneguherînin rewşeke pêkenînî. Çimkî, mirov herdem bala xwe nadin meriv. Ji bo ku hûn bikaribin ramanên xwe pratîze bikin, dibe ku pêdiviya we bi îzah û mînakan jî hebe.

Çîrokek Li Ser Çîroka 'SOSINÊ'



MERVAN SERHILDAN

Min xwest ku çîrokeke xwe ya neweşandî ji Kovara Bernamegehê re bişînim. Lê fikara ku xwendevanên kovarê bibêjin; “Madem te ev çîrok wek pirtûkekê neweşandiye, ka tu çima raber dikî, ya meriv?” ket ber dilê min. Lewma min çirokek li ser çîroka bi navê SOSINÊ nivîsand.

Qîzek hebû Li Serhedê bi navê Sosinê, bi reng û rewş; qîzek hebû li Serhedê bajarê Wanê zana, serkan û bîrewer; qîzek hebû li Serhedê bajarê Wanê navçeya Kendavê gêrên çavên wê yên kesk, eniya vekirî, dev û lêvên li hev, biskên zer î zêrînî, bejna dirêj û wecê rengîn, nexşîn û strayî difûriyan ser çavên şênî û maliyan... Sosinek hebû li Kendavê, ji kompleksên ezezî yên tije nêm û elem wê de, pir wê de çûbû. Rindî, xweşikî, xeml û xêl, evînî û heskirina takekesî; tevî kirasê xweecibandinê, bi hevre û bi giştî ji xwe kiribûn; ew badbadokên tije sîx û strî zû de, pir zû de ye ku gelekî li dû xwe hiştibûn. Sosinê “rindiyeke ewqasî narîn, nazenîn û hingivîn diheband ku bi nihêrînekê toz û dûxan ji eynikan radikir; bi awirekê dilê birek xort niqir dikir”. Sibehekê bi ser riyekê diket. Lê wê sibehê, di bin awirên ewqasî henûn de, ji eynika dîrokê re tiştin ji hinavê dil radigihand; bi dizî, bi sondên bext û bi miradên nepenî, di navbera xwe û dîmena di eynika pêş xwe de...

Wê rojê çerxeke cuda digeriya û tiştin diguherîn; xem diguherîn, pêwendî diguherîn, ber û bergî diguherîn; sibeh jî diguherî li ber dilan... Ew Sosina ku dema li ser rê û dirban bi xemên yekrengî dimeşiya û nas û nenasan li ser xanî û baniyan bi heyraniyeke bejintewandî nîşanî hev didan, veguherî; wê qîzê, xwediya bişirînên heftrengî, taca ku ji top û tevnên nûranî nisilî; îro vê sibehê bi şahidiya eynika zêrî çarenûsa xwe bi sir û razên qedîm ve distra. Kesayeta wekî zad, bi awirên mîrkutî di curmê dilsoziya neteweyî de dikuta; wê sibehê her tişt, her kes, her teyr û teba diguherîn; Sosinê li ser rê û dirbên din, li ser dika heqîqetê nirx û nexşên bedewiyeke nûjen diafirand…

“Di hinek fitlekên jiyanê de dîrok hîs û hestên mirov çiqasî xweş difirkîne, rastî çawa dil dineqişîne, dinya çi xweş dizîvire dostino. Dem hatibû, qewlê xwe birîbû, biryar wergirtibû; ma rawestan dibû? Rêwiyek bi rê diket malîno, ma ev bêdengî çi bû? Hûn ê çi bipirsin zû heyran, bilezînin, keça we Sosin peyarêkek di nav gir û giharên asoyên xwe re vekiriye û dike bi ser rê keve, ma ewqasî bêdengî ne pir e?.. Jixwe li vî welatî dema ku qîzek biryara çarenûsî weha beloq diyar dike, herkes û kûs li bende ne ku beriya ser û cîranan, beriya welatiyan û beriya fitne û fesadan, malbata wê dest lê werde. Herkes li bende ne ku xetimandina riya heqîqetê, bi destê malbatê be. Herkes li bende ne ku sosinên welêt biçilmisin. Herkes li bende ne ku gul û sosin di bin siya wan de vemirin, biherifin...

Ê de îcar Sosina ku ewqasî bi nav û deng e, Sosina ku gêrên çavên wê ji keska kaliko geştir e, Sosina ku enî vekirî ye, dev û lêv şid û badayî ne, bejna dirêj û wecê rengîn ji bihuştê kişyayî ne, gep û gewrî nexşîn û strayî ne; ew Sosina ku çavkaniya rindî, xweşikî, xeml û xêl, evînî û hestên bîreweriyê ye; ew Sosina ku kîjan xortî dîtiye û ji kê re vegotiye bi êşa dil xistiye; ma dibe heyran, ma dibe ku bi tena serê xwe bi ser rê û dirban keve?..”

Gewrê, di bin çavan re Sosinê dişopîne, bala wê her li ser e, lê her ku Sosinê li hêla wê dinêre, wek zîbeqê awiran direvîne, berê xwe diguherîne. Dixwaze ku rewşê fahm bike. Lê ku Sosinê şaş fahm bike! Jixwe hewce jî nake. Lewra di neqebeke çarenûsî de, di fitlekeke dîrokî de; ew Sosina ku ewqasî bîrbir, serkan û serkeftî ye, guman nîn e ku rewşa nû par ve neke, ranegihîne û zelal neke. Deng li Gewrê dike.

"Dayê, îro pir kêfxweş im, pir"

"Xêr e qîza min, sedema ev rûkeniya te çi ye, ji me re jî ragihîne"

"Min di waneyê de ji mamosteyeke xwe bihîstibû, mirovên ku lêkolînê dikin; divê bigerin, bibînin, bixwînin û bikelijînin. Îro ez ê biçim bajêr bigerim, bibînim, binirxînim û bistrêm"

"Baş e qîza min, tu bi serê xwe yî, bavê te jî hertim 'Sosinê nirxên zanyaran dihebîne' dibêje "

"Ka li ku ye, ez ê destê wî maçîkim û dû re biçim"

"Çûye dikanê, miça wî bi telefonê bişîne"

"Hema tu wekîla wî be û ez destê te maçîkim, ma nabe?"

"Wer, wer, wer hemêza dayika xwe; Xwedêyo te ji me pir heskiriye ku keçeke ewqasî şêrîn daye; serê malbatekê Sosinekê bibexşîne!"

Li mînîbusê siwar bû, piştre saeta birêketina erebeyê ji delal pirsî.

"Erebe di çi de diçe?"

"Saet di neh û pênc deqeyan de dê bi rê keve"

Rêwîtiya bi mînîbuseke nû, bi xişr û nişmî; di pêvajoya teşedana xewn û xeyalên ciwaneke bihuştî de xelatek e belkî. Birêketina mînubusa nû, paqij û spî; Sosinê dageriya nav bîr û bala nixumî. Jixwe dema ku li Enqereyê zanîngeh dixwend jî, dema çûyin û hatinan hertim di erebeyan de teşedana hizr û ramanan, sêwirîna dahatûyê û lêgerîna nirxên civakê; navçe bi navçe, bajar bi bajar û guher bi guher wek nexşeyekê bi kod û şîfreyan ve girêdida... Vayê destê darbeyekê li ber guhê wê ye, dike ku azan bide. Havîna sala hezar û nehsed û heyştê ye; ji tîr û zextên tîrmehê jî diyar e, karesateke rûxîner li ser rê ye. Welatê min di xewa xefletê de ye; ma xema kê ye?.. Kes nelebite, kes dilzar û tengezar nebe, kes îtiraz neke, gelo wê kî me ji binê ev bîra qîrê derîne? Belkî kes nizane, lê meram û mexseda Sosinê ev e; her dihizire, digere ku bibîne, dixwîne ku binirxîne; distrê û dikelijîne ku riyekê veke. Di mînîbuseke wisa nişmî de rêwîtî, ji bo dagerîna nav xewn û xeyalên weha rengîn derfeteke zêrîn e.

"Divê em danezaneke weha binivîsînin ku Kendavê bi yekdengî li dora tevgera azadî û edlayê bicive; li Kendavê divê sînerjiyeke civakî biafire ku wekî polayê herkesî bi ber dika rûmetê ve bikişîne... Ger şoreşa Serhedê bi feraseteke kêrhatî tevbigere; ger karibe sîxur û saloxgeran di nav sînerjiya civakî de bêbandor bike, ger karibe bi baskên fireh bimeşe û hemû dînamîkên civakê bikelijîne, ger karibe plan û provokasyonên ku şidetê vedixwînin rawestîne, ger karibe rêgezan ji xwe re bi al û rêber ke, ger karibe hiqûqeke hevrejiyanê saz bike, ger karibe bi vîzyoneke pirengî û pirdengî ya neteweyî pergala rêvebirin û rêxistinkirinê ava bike û ger karibe muktesebata hemû dînamîkên welêt misoger bike; mizgînî nêzîk e, azadiya Kurdistanê nêzîk e, Serheda azad nêzîk e, hemêzkirina heskiriyan nêzîk e..."

"Sosin, Sosin! Xwişka min em hatine Wanê, ma tu danakevî?"

Sosinê dadikeve û berê xwe dide peravên behrê, parka bin Keleha Wanê ku navenda komeleya mamosteyan bi navê KOMA'yê jî di avahiya ber wê de ye. Çawa ku maseyeke vala dît, di cih de rûnişt; destê xwe dirêjî pênûsa bêrîka xwe kir lê bi rakirina serê xwe re, ji ser sendeliyê pengizî hewayê:

"Zelalê!"

Seroka KOMA'yê ya bajêr Zelalê bi kêf û coşeke mezin û bi kelebêhn ew hemêz kir.

"Bi xêr hatiyî, Sosê! Keçê ev çi kambaxî ye, îcar bêagahî û rûniştina bi çikî tenê çi ye, xaxê?"

"Ji bo teksîrkirina danezanê hatime, di naveroka danezanê ku me bi hevalên mamoste re nivîsandiye de çend tahsîs mabûn, beriya ku ez bêm cem te, min dixwest ku sererast bikim. Lewma bêagahî û bi tenê rûniştim"

Bi ken û kêf derbasî hundir bûn, piştî xwendin û nirxandina metnê, Zelalê çend xalên girîng anîn ziman.

"Di şûna têgeha ku dibêje 'zext û pêkutî', divê em 'polîtîkayên faşîst' bi cih bikin; lê ji ber vêya dozger dikarin we tawanbar bikin. A çê, em bibêjin 'polîtîkayên faşîzan'; lewra hem heman wateyê îfade dike û hem jî dema darizînê riya xweparastinê vedike ku mirov bibêje 'di çarçoveya azadiya hizrî û ramanî de hatiye bikaranîn'. Hevala Sosin, danezan bi gelemperî baş e; lê hewce nake ku em navê komeleyên din hildin. Bi rastî ez meraq dikim, navê Komeleya Gundiyên Çarikan çi îfade dike, kî ne, çi ne?"

"Me bi hevdengî biryar wergirtiye ku di danezanê de navê komeleyan nenivîsin. Jixwe me ji bo wergirtina destûra vê danezanê jî serî li tu meqaman nedaye. Ji ber vê yekê, ger danezan di komeleyê de bi tomarî neyên desteserkirin, tawanbarkirina komeleya me hinekî zehmet e. Komeleya Gundiyên Çarikan, qaşo gundewarên gelî û çiyayî temsîl dike; lê li Kendavê herkes dizane ku kesayetên têkildarî cerdevanan û mirovên ku nêzî qeymeqamiyê ne ev komele vekirine. Herwiha Komeleya Ciwanên Kendavê jî bi pirsgirêk e. Em bi hestyarî tevdigerin ku provokatorên nav van komeleyan negihîjin armanca xwe. Bêguman armanceke me jî ew e; hinek mirovên ku bi hestên xalis tevdigerin û di van komeleyan de cih digirin, em bi ber xeta azadî û edlayê ve bikişînin"

Danezan di dextîloyê de li ser kaxiza turnusolê hat lêkirin û tomareke danezan hat amadekirin. Li odeya rêveberiyê herdu tenê man, Zelalê bi çavên reş î zeytûnî awirên tûj wekî xençerê dan ser Sosinê.

"Ka bibêje Sosina Serhedî, hîn jî kes bi vî navî bangî te dike gelo? Tu dizanî dema ku tê bîra min, bi rojan şehadeta Celadet ji bîra nakim. Gelo me nikaribû ew biparasta?.. Ji kengî de ye ku ez hîs û hestên te, derûniya te û piştî çûyina Celadet teşeya jiyana te meraq dikim"

Gelo ji şerma bû, yan ji ber fikara ku dilê hevala xwe bihêle bû, dema ev pirs ji Sosinê re kirin, wecê wê yê esmer adetî reş xeniqî bû; dev û rûyên zirav di bin siya porê reşde bi kort de çûbûn. Guhên xwe bel kiribûn û ziq li kûrahiya çavên Sosinê yên rengîn dinihêrî... Sosinê kesereke kûr kişand, dev û lêvên xwe li hev jidandin, wekî ku bi venêrîneke sondxwarî xwe temî dikir ku dîrayeta xwe wenda neke û hîn dû re bipeyive.

"Nasnavê Serhedî jî, ji ber helwesta Celadet li min kirin. Em her tim bi hev re digeriyan. Dema ez didam nasandin, digot 'hevala min Sosin' û dû re 'Sosina Serhedî' lê zêde dikir..."

Di vegotina wê çirkê de, kulmeke hêstir ji hinavên dil, xwe bera ser çavan dan. Lê dîsa keserek kişand, bêhna xwe vekir, nefeseke kûr kişand pişikê. Bi herdu destan biskên zer î zêrîn bi paş guhên xwe de kevand û nefeseke din kişand. Piştî xwevenêrînê gotina xwe domand.

"Piraniya hevalên wî Mêrdînî, Amedî û Rihayî bûn. Ev nasnav, ji aliyê wan ve berbelav bû... Diyar e ku di qada sivîl û demokratîk de, hedefgirtina hinek şoreşgeran, ne rasthatinî ye, ne bêhemdî ye. Tirkiye di rojekê de bi ber faşîzmê ve beralî nebûye. Kar û xebateke bi salan, belkî bi dehsalan e. Ez jî carinan difikirim, gelo me karibû ew biparasta? Lê kujer ne kesek e, ne malbatek e, ne jî komek e. Li hemberî konseptên dewletekê bi însiyatîfa takekesî, bi xweparastina takekesî, yan jî bi hewldana çend kesan; pêşîlêgirtina înfazên bi vî rengî zehmet e. Me nikaribû encam biguheranda. Li Enqereyê keys pê nexistana, wê li welatê wî Mêrdînê bikuştana... Piştî Celadet, hinek şop û xêz dimînin di binbîra mirov de. Di çanda me de têgiha ku vê kortalê, vê gorê dadigire 'dilsozî' ye... Di bin giraniya êşên emranede jî, jiyan didome; lê wate ji bîr nabe"

Birînin hene ku tenê şopeke kûr û beloq nahêlin, lê piştî sal û zemanan jî di demên bibîranîna wan de, ji nû ve der dibin; birînin hene ku tenê birîndaran bi girî venakin, hîs û hestên dost û hevalbendên wan jî zelal dikin; birînin hene ku bîra mirov tije êş dikin; birînin hene ku dibin bîrêşk û di nîrê bibîranînê de bi qeysa gul û Sosinên Serhedê, Zelalan jî bi girî vedikin... Ev saetek e ji wan re hatiye gotin ku teksîrkirina danezanê qediyaye, lê îro, vê kêliyê herdu heval wek kor û ker û lalan in...

Tu li vê kambaxiyê binêre Xwedêyo. Qaşo wê hevala xwe biezimanda; qaşo wê rojeke xwe ji Sosina Serhedî re veqetanda; qaşo wê bi kêf, henek û şahiyan ew bi rê kira; qaşo wê Sosinê ji hevaltiya tije sir û raz têrkira; qaşo wê dilê xwe jî jê re vekira... Serçavan me qebûl e, em vêya, wêya û tevahiya tîrên ser dilan fahm dikin; li min porkurê, ma ev giriya bi îskeîsk, ev lerizîna derûnî û bedenî, ev hêstrên bi kulman çi ye, çima nasekine, ev êşeke çiqasî kûr û tîr e Xwedêyo? Ma bîrêşkek bi saetan dil kêr dike; ma pêleke Behra Wanê bi saetan didome û dev û pozên zîndewarên peravan dijidîne?.. Gotina zêde, ne hewce ye. Şahidên hinek bûyeran, xwediyên kul û keseran çi bibêjin jî kêm e...

Çawa ku ji KOMA'yê derket, paşa wê ket Keleha Wanê, êdî li ser Kolana Kelehê bû; li saetê nihêrî û lezand. Her çiqasî barê wê ne pir giran bû jî; di destekî wê de çenteyê wê, di destê din de jî tomara danezanê hebû; meş ewqasî ne hêsan bû. Zelalê çiqasî israr kir jî, alîkarî qebûl nekiribû. Berê wê li Riya Hevrişim bû, li qoziya ew riya mezin dikanên masîfiroşan ji dûranî ve xuya dibûn; ew masîfiroşên ku çendî caran bi wan re têkilî danîbû... Çavên xwe li pêşbirkekê digerand ku tavilê li erebeyeke Kendavê siwar bibe. Çawa ku gihîşt rêya fireh û mezin, Riya Hevrişim li ser piyê çepê zîvirî,

berê xwe da xaçeriya Kendavê... Saet di sisê û nîvan de derbasî ser Riya Kendavê bû û rawestiya; pêdivî pê tune bû ku heta xeracê bimeşiya. Her çi hîkmeta Xwedê bû, di nava çar deqeyan de mînîbusa Zahirê Kor li ber wê rawestiyabû. Zahir, li Kendavê ajovaneke navdar e, lê xwediyê mînîbuseke kevn, gemarî û xerxote ye; herkes pê dizane: Çikûs e, bêyom e, bêmirad e!.. Sosinê ji neçarî siwar bû, li ev pîreduldula Zahirê Kor. Tevî Sosinê çarde rêwî qediyabûn, lê ji hundirê mînîbusê bêhneke ji bêhna sergoyan li poz û pêvilan dida; bêhneke ku dûxan jê difûriya; bêhna berateyên çar gundan; de tew dengê hîbehîb û çîrkeçîrka motor û kaportaya xerxoteyê jî, ji xêra Xwedê re we bi çavê seriyan bidîta! We bi çavê seriyan bidîta, teqez we yê bigota qîrîna hiznî û şîniyan e ku ewqas dengên bi êş û azar li nav hev digeriyan.

Ezbenî, ji vê mînîbusê reşbînî difûriya; reşbîniyeke ku ji vir û heta Kendavê didomiya. Di vê erebeyê de hîs û hesteke qurifok rû dida. Ma kê got, kê vexwend û kê bangewazî da ku îro li mînîbusa vî çikûsî, vî bêyomî û vî xêrnedîtê bêmirad siwar bibe, gidiyano? Sosina rengîn her ku dixwest wekî demên berê li ser pişta xewn û xeyalên xwe bibeze, bifire; bajar bi bajar, navçe bi navçe û guher bi guher bigere, bibîne, binirxinê û bikelijîne; lê teqereqa vê erebeyê, nedihişt li wan deveran bimîne; lê teqereqa vê erebeyê, wekî xençereke bêxêrê di ser dilê wê de diçikiya; lê teqereqa vê erebeyê wek tofaneke ku wê ji darên bêgulî de bixîne, bi qurpîn û pelqîn li devika serî dida.

Berê Sûka Xeratan, dû re Zanîngeh li milê çepê man. Sosinê pelek ji tomara danezanê kişand, bêdeng û hêdîhêdî xwend heta wê çirka. Mînîbusa Zahirê Kor ji nişka ve û bi xijîneke lezgîn li ber qereqola Çemê Reş rawestiya. Li derdora bîst leşkerî mînîbus dorpêç kirin bi helahela. Çawîşekî bi şêwaza çort a leşkerî ferman dida leşkeran û heman kesî serê xwe di deriyê mînîbusê re dirêjî hundir dikir û fermanek jî dida rêwiyan.

“Em venêrîna nasnameyan dikin, nasnameyên xwe bidin”

Rêwiyekî navosere, di ber xwe de dimizmizî, tiştin digot.

“Berê rez baş bû, terezê jî lê da!”

Di wê çirkê de leşkeran rêwî daxistin û di mînîbusê de lêgerîn kirin, berabera. Te digot qey, berê zanibûn ku danezan di ev erebeya xerabe de ne; te digot qey hinekan ji wan re gotiye tomareke danezan di bin palgeha Sosinê de nixumî ye; te digot qey ji kengî de zanibûn ku pêçeka danezanê ji çarsed rûpelî pêk tê; te digot qey bi qest û bi meram ji Sosinê re li sûcan digeriyan; te digot qey Sosinê ji çend rojan, ji çend mehan û belkî ji çend salan berê de ye ku bûye hedefa wan; te digot qey îro, di vê erebeyê de tofan rabûye, tofan. Herkes, tevahiya rêwiyan, ajovan; bi tevahî li derve ne; lê na, hinek rêwî li mînîbusê siwar dibûn, hinek dadiketin; hinek rêwî di kerlalî de rawestiyabûn, hinek rêwî dipeyivîn û diqîriyan; deng û bêdengî, tebat û lebat, hewar û gazî li nav hev digeriyan... Ma qey geşedaneke pir asayî bû ku Sosina bi nav û deng, dîl û perîşan dibû, li nav komeke kurdan? Ma qey rûdaneke pir ji rêzê bû ku semboleke ji nirxên Kendavê tûşî bextreşiyê dibû? Ma qey qewimîneke pir biçûk bû ku xwediya sir û razên vê sedsalê bi qeyd û kelepçeyan derdest dibû?..



Zahirê Kor geh bi vî aliyê mînîbusê de, geh bi wî aliyê mînîbusê de bixiroş, çimomimo û şaşwaz dibeziya. Şanika çavê Koro wek mewîjeke reş a girhebî hildayî, pêşiya dîtinê lê dibirî, herdu çavên sipîsax bêreşik û eletewş dipitpitîn; Zahir di bin giraniya esira vê rojê de diazirî, diqirqilî, diperpitî. Dema ji kêlek de helwesta çawîşan û tevgera leşkeran a tije qisawet didît û vedigeriya li rêwiyên pîreduldula xwe dinihêrî çavekî wî çik, ê din jî pik vediguherî; di bin tirsa ku Sosina Gewrê, taca serê Şêro û periya xewnên xort û ciwanên Kendavê di mînîbusa wî de dihat derdestkirin, îtiraf dikir ku di nav xiroş û peroşeke dijwar de û di bin barekî weha giran de dieciqî. Êdî li pêş çavên herkesî, qidûmê ajovanê 'duldula bi bêhn û berate' dişikest û herkesî didît ku ji çong û çîpan, heta porê qota serî dilerizî.

Ew mewîjoka di cuha çavê çepê de zîldayî, vê çirkê wekî pîzpîzkek ku di bin tava tîrmehê de li dawiya nepixa xwe edilî be, dibiriqî. Ma çi bû, çi diqewimî di vê mînîbusê de heyra? Kê dizanibû ku danezan belgeyeke ji belgeya sûcan e; kê ji kîjan leşkerî re rê û dirbên Sosina Serhedî bi ta û derziyê ve kiriye; kîjan leşkerî perwerdeya têgihên ku di danezanan de ye dîtiye; heta nuha kê dîtiye heyra, kê dîtiye? Kîjan dozger û dadgeran biryar daye ku danezanên li rasta han, bêyî şik û guman, rasterê dikevin stûyê Sosinan?.. Ezbenî deng vedidin li ber guhan, axîn û waxîn dertên ji devê canik û camêran. Li ber dikevin, ma çawa dibe ku sorgula Sosinan dibin, ji nav gurmika wan? Hinek rêwî siwar dibin, hinek rêwî dadikevin ji xerxoteya Zahirê Kor a kambax û wêran. Deng û bilîn li nav hev digeriyan ji çar aliyan, qetqetî dipeyivîn rêwî û şahidên ber qereqola Çemê Reş a li ser stûna bextreşiyan; qîreqîra dilzar û tengezaran, heywax û hewara welatiyên li dorûdorên qereqolê ji pişta qeraçê dildaran hildidan...

"Telefon" digot hinekan, "çawîş nehişt ku Koro telefona qereqolê bi kar bîne, bo ku ev caba nexêrê ji dê û bavê Sosinê re ragihîne"

"Birin, birin" digot hinekan, "destên wê kelepçe kirin û rakişandin, heta dera han"

"Serî netewand" digot hinekan, "çiqasî zor danê jî bi serbilindî di ber xwe dida"

"Sosinê nûreke nûranî ya Xwedê ye" digot hinekan, "bi rabûn û rûniştina xwe, bi tehsîla xwe û bi serkaniya xwe bûye sembola ciwanan. Biçûk û mezin, jin û mêr, kal û pîrên Kendavê; tev jê hes dikin wekî roniya çavan. Qebûl nakin zext û zora ser Sosina dilovan"

"Bilezîne Zahir" digot hinekan, " vegere em xwe bigihînin Sîteya Pîşesazan, em xwe bigihînin malekê, dikanekê ku ji warê xêrxwazekî telefonî Şêroyê Şakir bikin, bila hay jê hebe ku Sosinê li qereqola cedirmeyan a Çemê Reş hatiye derdestkirin, dîl û perîşan..."

Zahirê Kor kir û nekir, çawîşên qereqolê rê nedan ku bigihê cem Sosinê, da ku jê bipirse, "ji bo te ez dikarim çi bikim, ey keça şêr û şepalan?"

Nedixwest ku ji wir biqete, lê li ser daxwaza rêwiyan girrîn bi erebeyê xist û berî da Kendava bav û kalan. Îro vê esirê, çiqasî giran e barê ser milan. Îro vê esirê, tu dibê qey gola erebeyan teqiyaye, çiqasî girgêjî heye li ser riyan. Îro vê esire, serê ajovan û rêwiyan berjêr e, polîpoşman in ku tişt ji destê wan nehat û bêkeys man li hemberî rûreşiyan. Îro vê esirê, ji poşmaniyê jî wê de, xwe sûcdar dikin, çend kesên wekî Zahirê ajovan. Îro vê esirê, ne ajovan û ne jî rêwiyên belengaz nabêjin, "Xwedê, heqê bizina kol ji ya qoçek re nahêle, heyra". Îro vê esirê bajar bêdeng e, navçeya peravên evînê û warê dildarên serhedî Kendavê bêdeng e, dinya alem ker û lal e; îro vê esirê ma qey kes bîr nabe ku bibêje, "Sosina ku ewqasî bi nav û deng e, Sosina ku gêrên çavên wê ji asîmanê şîn geştir û nexşîntir e, Sosina ku enî vekirî ye, dev û lêv şid û badayî ne, bejna dirêj û wecê rengîn ji bihuştê kişyayî ne, gep û gewrî nexşîn û strayî ne; ew Sosina ku çavkaniya rindî, xweşikî, xeml û xêl, evînî û hestên bîreweriyê ye; ew Sosina ku kîjan xortî dîtiye û ji kê re vegotiye, bi êşa dil xistiye; ma dibe heyran, ma dibe ku bi tena serê xwe dîl û girtiya destê qereqolek cedirme be; ma dibe ku destên bi dar li Sosina Serhedî rabin û kiryarên tije êş û elem di nav tebatiyeke seqiyayî re çelenga dil birizîne, bitemirîne û di gola bêdengiyê de bixeriqîne?..



Gelo dibe, yan nabe gelî guhdar û xwendevanan? Hûn jî di vê meraqê de bimînin heta ku nivîskar pirtûka vê çîrokê diweşîne...

XWEŞÎ Û VEGOTİNA ÇÎRÇÎROKÊ



PAŞA AMEDÎ

Çîrok an çîrçîrok (li gor min çîrçîrok xweştir û baştir e) qesta min çîrokên folklorik yên di nava gel de têgotin. Hûn çi dibêjin bibêjin çîrçîrok ji kalanên me gîhîştine kal, pîr, dê û bavê me. Kal û pîrên me tev çîrçîrokan zanibûn. Kêm-zêde çîrçîrok zîndiya xwe hê jî di nav gel de berdewam dike. Ferqa çîrok û çîrçîrokê mijarekî din e. Dîrok, orf û edetên berê, jiyan, êş, hest, bûyer, bîr, hişmendî û çîrçîrok di xwe de dihewîne.

Yên ku çîrçîrokan guhdar kirine, bandora çîrçîrokê li ser wê gelek maye. Ez bi xwe ku li cem min qala çîrok an çîrçîrokê dibe bi heş û aqilê xwe ez diçim zaroktiya xwe, wê demê dijîm û kêfê jê digrim. An ji ku wexta çîrçîrokan dixwînim.

Wexta ku ez zarok bûm şevên me pir caran bê çîrçîrok derbas nedibûn. Bi roj wexta ku dê û pîrên me digot " Hûn vî karî bikin ez ê wexta raketinê ji we re çîrçîrokan bibêjim. " Kêfa me pir dihat. Me sebir nedikir ku êvarbibe, me digot dayê niha bibêje, Dêya me: "Kurê min bi roj çîrok nayê gotin, bi roj xerab e, ne baş e, ard û rûnê mirov diqede. Mirov feqîr dikeve." ku dêya me wer digot, me jî: "Baş e dayê, bila ard û rûnê me neqede." Dîsa me bi kêf karê xwe dikir. Em bi kêfxweşî li benda çîrçîrokên dayîkê bûn.

Me şîva xwe dixwar piştî xwarinê ku wexta cî raxistinê dibû, em bi lez diçûn nav ciyê xwe.

Dêya me jî çi wextî karê xwe biqedanda û bihata nav ciya. Ku dêya me dihat nav ciya em pir bi kelecan dibûn. Di nav ciya de em bira û xûng har dibûn û me qelebalîxî dikir, dêya me digot:

"Qelebalixê nekin, hiş bin, ku hûn har nebin, dengê xwe nekin, ez ê çîrçîrokê bibêjim, zarokno hûn hazir in, em dest bi çîrçîrokan bikin ya na?. Me jî digot: "Erê em tev hazir in û bira kesek dengê xwe neke." Dêya me: "Ez va ye dest pê dikim 'Çîrçîrokê, virvirokê, rûnê rokê…' Bi hêdê hêdî û carna bi dubarekirî. Em jî li bendê bûn ku ka îşev diya me çi çîrokê bibêje (carna bi henekî digot) "Çîroka me qediya, Rehmet li xwediya, rehme li dê û bavê guhdaran. Çîroka min qediya…" Em pir bi xemgîn dibûn û carna digiriyan paşê jî dêya me dest bi çîrçîrokê dikir…

Carna dayîk me dikir şûna egîtan û navên me bikar dihanî,,,em dibûn lehengê çîrçîrokê. Jixwe her tim serlehengê çîrçîrokên qezenç dikirin. Em jî bi kêfa guhdarkirinê û serkeftinê em pê şa û şanaz dibûn.

Çîrçîrokên bi şewat û bi heyecan, carna jî çîrokên bi tirs. Ewqas bandora çîrçîrokê li me dikir ku em ji ber ditirsiyan û xof me digirt ku me serê xwe dikir bin orxanê me li dora xwe mêzedikir ka kî heye. Bandorî heya du sê roja li me dima, bi şev em newêribûn biçûna der. Carnan jî em ber lehengê çîrokê diketin û digiriyan.

Destpêkên çîrçîrokan her tim wiha destpê dikir:
Hebû, tunebû ji Xwedê mezintir tu kes tunebû…
Hebû, tunebû, carek ji caran, rehmet li dê û bavê guhdaran, Ji xeynî eza û mixtaran…
Hebû, tunebû carek ji caran, rehmet li dê û bavê guhdaran, tev der û cîranan. ji xeynî Bekoyê Ewanan…

www.kurdivakuroj.org

Hebû, tunebû carek ji caran, rehmet li dê û bavê guhdaran, tev sêwî û bêmalan. ji xeynî Rom û Ereban…
Hebû, tunebû carek ji caran, rehmet li dê û bavê guhdaran tev birçî û nexweşan…
Hebû tunebû rehmet li dê û bavê guhdaran. Rehme ne li mala wan (malbatên ku jê diqahirîn…) be…
Ev destpêkên çîrçîrokan ji gohê me re pir xweş dihat lê me tew jê fehm nedikir. Ji ber wê me pir goh nedida destpêkên çîrçîrokan. Lê îro em tev baş dizanin ku pîr û kalanên me van gotinên bi wate bi zanebûm hanîne ber hev û hûnandine xistine destpêka çîrçîrokan. Bi van gotinan dost û neyarên xwe diyar kirine, dijminê xwe nîşan dane…



Çîrçîrok di nîvantiyê de jî gelek xweş bû. Carna em diçûn nîvantiya cîranan an diçûn mala yekî, li wê malê kom dibûn û diciviyan, paşê digotin “ ‘Em çi çîrokê an çîrçîrokê bibêjin.’ “Îşev dora filankesî ye.’ ‘Ka herin ba filankesî bikin bila ew jî were. Bê wî şev xweş nabe.’ ‘Bibêje were çaya qeçax e, yê were…’ ” ku çîrokbêjek tunebû an yê ku bi gotinên xwe çîrçîrokan civatê şên û geş bikira li cimaetê neba, hima digotin: “Herin bira Elo jî were”
Carna li hewşan, carna li ber taldên diwaran an li ser xanî û diyaran diciviyan. Qala mesela û bûyeran dikirin. Stranan digotin. Paşî jî li wir jî çîrçîrok dihat gotin bi dor an bi zanebûn digotin: “ ‘bila apo carekî ji me re biçîrîne; çîrçîrokan bibêje’ ” di nava qîr û şematê de dest bi çîrçîrokan dikirin. Bi şahî û kêfxweşî me jî guhdar dikir. Yên ku çîrçîrokan xweş digotin ku li malê bûna, bangê çîrokbêj dikirin, çîrokbêj dihat çîrçîrokên xwe digotin. Ku zû diçû malê ji civatê xatir dixwest û diçû. Civat li pey bangê wî dikirin, digotin: “ Heciyo!
‘‘Sawî mawî, salek din dîsa li va bî….”
Kal û pîrên me ne mekteb xwendibûn û ne jî dersa çîrokan girtibûn lê çîrçîrokan gelek xweş digotin, Her yek wek çîrokbêjekî bû. Ev hostetî, aheng, xweşî û vegotina çîrçîrokan bi çîrokên re xuya bû. Ku yek ji heremên dûr dihat dibûn nîvan, mazûvan wî/wan bê çîrçîrok bernedida; him çîrçîrok guhdar dikirin him çîrçîrokan digotin. Ji hev çîrçîrok dielîmîn. Bi saya nîvan û bazirganan, bi çûyîn û hatina derve… çîrçîrokên cûda û cur bi cur li heremên Kurdistanê belev bûne û gihîştine gelek deveran. Hinek çîrçîrok li her derê an li her heremê tê gotin û dişibin hev; kin an dirêj, waryantê wan gelek in. Çîrokhez û çîrokbêj; vebêjiya xwe bi hûnerî berdewam kirine. Nifş bi nifş weka avê di nav gel de herikiye û berdewam bûye. Berê di nav gel de çîrçîrok pir bi rewac bû.
Hinek taybetmendiyên çîrçîrokan divê em jibîr nekin; di çîrçîrokan de mêr ji jinên egît re rêzdar in. Yê egît mêrxas û sozdar bûn. Egît di dema şer û li qada şer de bi dijminên xwe re, dijmin ji dijminên re xayîntî nekiriye. Yên egît ji bo gelê xwe bi mêrxasiya xwe, canê xwe feda kirine. Serlehengê jin jî gelek in; jin bûne axa û axatî kirine. Ji ber ku kesek wê nasneke xwe kirine dilqên mêran ta ku xwe bigîhîjîne miradê xwe. Carna çîrok li gor gund û herêman bi navê egîtê deverê hatine bi nav kirin.
Vegotin û xweşiya her çîrçîrokê ji zarokan re wek fîlmê qartonî, ji civan re wek fîlm, ji kal û pîran re jî sebir e. Di vê dema teknolojiyê de divê çîrçîrok neyê jibîrkirin, bi çi awayê dibe bira bibe divê ji zarokan re çêrokan bibêjin û bixwînin ta ku neslê nû ji çîrçîrokan pê par nemine û têkiliya nifşên nû û yê berê ji hev qut nebe.
Ev nivîs ne çîrçîroke ji ber ku qala çîrçîrokan dibe ev jî dişibe çîroka çîrçîrokê. Ez jî weka çîrokbêjan dawiya nivîsa xwe dînim û weka wan dibêjim; “Çîroka min qediya, rehme li dê û bavê guhdaran. ji xeynî fesadên li ber dîwaran. Bê cendirme û tehsîldaran.”

www.arsivakurdi.org


Gotin û Bêjîn Di Reh û Rîşeya Xwe De



QENDÎL ŞEYXBİZÎNÎ

Di zimanê îroyin a Kurdî de her du lêkerên “Gotin & Bêjîn” tên bikaranîn di demên cuda de, ango lêkera “Gotin”ê bo dema borî ye weke:
min got, me gotiye, em gotibû
û lêkera “Bêjîn”ê jî bo dema neborî ye weke:
ez dibêjim, em dibêjin, ew dibêje

Lê di rastî de her du lêkeran ango hem lêkera “Gotin”ê û hem jî lêkera “Bêjîn”ê yek lêker in di zimanê kevn ê Kurdî de. Eger em berê xwe bidin zimanê Pehlewanî û zimanê pirtşka Avêstayê, dibînin her du jî yek lêker in. Di Pehlewanî de “Vaxten” e, di Avêstayê de Vaçîîten” e.



bêguman tişta yekemîn ku bala we dikşîne ewe ka gelo “Vaxten”a Pehlewanî û “Vacîîten”a Avêstayê çawa bûye “Gotin & û Bêjîn”?! bi dilniyayî ev pirs pirr durust û di cih de ye, ger kesek şarezaya zimanê kevn ê Kurdî nebe, ev pirs di ramana wî/wê de tê û diçe, lê bo kesên ku
şarezaya zimanê kevn û bi taybetî Pehlewanî û Avêstayê be, dizane çawa hatiye ta gihiştiye îro.

Di Pehlewanî de her peyvek destpêka wê bi “vî, va, vê” hatibe, bûye “gu” bo mînak binêre
*vînas bûye gunas, gunha
*vîzar bûye guzar
*vîzer bûye guzer Û
*vaxten bûye guxten, goxten, goften, gotin
her weha peyvên ku dawîna wê bi “ax”ê hatibe piranî caran di Kurdî de bûye “J”ê û di farsî de

bûye “Z”ê, helbet hin caran jî tenê dengê “x”ê nemaye û dengê “t”ê weke xwe maye bê destdan, bo mînak binêre
XT bo J – Z
*amoxt bûye amoj
*amêxt bûye amêz, hemêz
*pesaxt bûye pesaj
*axt bûye aj
*hêxt bûye hêz
spuxt bûye spuj

her weha
XT bo T
firoxt bûye firot
atexş bûye ateş
soxt bûye sot
doxt bûye dot û
vaxten jî bûye vaten

Bo “Vaçîîten”a Avêstayê jî bi heman awayî û lojîk pirranî peyvên ku dawîna wê bi “Ç”ê hatiye bûye “J & Z” bo mînak binêre
roç bûye roj, roz
vêç bûye vêj, vêz
vaçar bûye vazar, bazar
soç bûye soj

www.kurdivakuri.org

çêr bûye jêr, zêr, zîr û
vaçîîten jî ku reha wê “vaç” e bûye “vaj, vêj, bêj”
Û “vaçvîş û vaçayiş” jî weke lêker-nav e.

Di vir de cudahî û gavên guhertinên her du lêkeran jî ji me re zelal bûn, lê tişta balkêş ewe ku lêkera “vaxten”a Phelewanî weke lêkera “Gotin”ê xwe şêwe kir û lêkera “vaçîîten”a Avêstayê jî weke lêkera “Bêjîn”ê

niha jî di her du zaraveyan de ew qalb û şêweyên kevn a Pehlewanî maye tenê

dengê “x”ê nemaye weke

Pehlewanî weku me got: “Vaxten” e
Kurmanckî “Vaten” e
Hewramî “Waten” e

Her du lêkerên “vaxten & vaçîîten” a Pehlewanî û Aavêsta weke “gotin & bêjîn”ê



xwe şêwe kir. Di rastî de bo demên borî û neborî her du jî her yek lêker bûye di kevn de, her weke me amaje pê da di Pehlewanî “Vaxten” û di Avêstayê de “Vaçîîten” bûye, eger me zimanê farsî ya îro jî biinêrin li ser heman lojîka kevn bo demên borî û neborî her “guften” likar e.

Lê tiştekî balkêş jî em di zaraveyên Kurmanckî û Hewramî de dibînin ewe ku ta

cihê xwe girtiye di zimanê Kurdîya nû de bi awayeke têr û têj digel demên borî û neborî de xwe guncandiye.

Lê her weke agahî û roşnahî bo zimannas û berçavroniya kesên ku bi karê zimên perjan in, mijareke pêwîst û taybet e, gere di warê rîşenasî û etîmolojîyê de mirov rîşeya her du lêkeran bizane.

www.arsivakurd.org

SALNAMEYA GEL



YASEMÎN ELBAN

Gelê kurd ên gundan, li gor şert û mercên hewayê û li gor tecrûbeyên kal û pîrên xwe, ji xwe re salnameyek çêkirine. Bi barîna berf û baranê, bi rewşa hewayê ve pêvajoya salnameyê dest pê kiriye û hesabên xwe tev li gor vê salnameyê li hev kirine. Şert û mercên giran ên zivistanê bandorekê mezin li ser wan kiriye. Bi piranî gundîyan debara xwe li ser heywanan pêk anîne. Ji ber ku demsala zivistanê pir dirêj kişandiye, qût û qelatên heywanan, berîya hatina biharê qedyaye û berxwedana wan ê derktina heya biharê, pir dijwar bihûriye. Ji ber vê yekê, wan rojên zivistanê hejmartine. Li gor wan demsala zivistanê, ji meha Kanûnê dest pê dike, heya meha Çileya paşîn, pir sar û seqem derbaz dibe. Piştê ku mehên çileyê derbaz dibin, îca hêdî hêdî dinya gerim dibe, lê ev yek gelek caran ji ber germahiya hewayê hetine xapandin, wan heywanên xwe ji bo çêrandinê birine zozanan. Lê ji nişkave, ba û bahoz derketiye û heywanên wan tev telef bûne û wan jî ji ber vê qasê her bûyerê navek lê kirine û heta roja îro ew nav mane. Wekê Xaç Xidir Nebî, Zîpedar, Agirê Filan, Sibatê du roj ji Adarê ker kir gîskê li tehtê wer kir Gamêşqiran û hwd.

XAÇ XİDİR NEBÎ

Her sal nîva meha Sibatê, keç û kurên ezep totikên şor dibehtin û derengê şevê dixwarin, di ser de av venedixwarin ku tî bibin. Piştê ku radizan û diketine xewê, di xewna wan de kî tasek av bidaya wan, qedera wan bi serê wî/ê kesê ve vedibû û bi wî/ê kesê re dizewicîn. Gelek caran keçên ezep ev kar pêk dianîn. Car caran xortên malê jî tevlî wan dibûn. Dotira rojê di her malekê de xwarina bi navê poxînê dihate pehtin. Piştî ku kifletên malê, xwarina xwe dixwarin. Keç û xortên gund, bi hev re, her yek ji wan kevçiyek ji xwarina poxînê hildidan û dibirin li serê banê û datanîn dorê kuleka tenûrê. Bi dûv re xwe ji wir dûr dikirin û diman hêvî ka dê kengî qijikek bê poxina wan bixwe. Melume demsela zivistanê qijikan qût û qelat neditîn ku bixwin, giş birçî bûn, di demekê kurt de qijik tev diahtin, her yek nikilek li poxînên wan dixistin û her yek ji wan bi alikî ve difirîn. Wê gavê wan, qijika poxîna wan xwaribû dişopandin ka gelo, dê bi kijan malê ve firde û biçe. Qijik bi alîyê kîjan malê ve biçûya. Ew kes dibû bûk an jî zavayê wî/ wê malê. Hinek gotinokên li ser Xaç Xidir Nebî jî wehabûn. Xaç Xidir Nebî, Şîv hebî taştê tunebî, Wey li wî ku li mala xwe nebî, Jina wî dibe jinebî. Orta Xaç Xidir nebî, Kî ne li mala xwe bî, Qesasê serê xwe bî.

ZÎPEDAR (BÛKA BARANÊ)

Li gor teqwima berî, dawî ya Sibatê keçên gund tev li hev kom dibin, darekî dirêjane bi sexevîlekê ve girê didin. Ew dar ji sexevêlê re dibe wekî du dest. Piştre fîsatanekî lê dikin û poşiyekê diavêjine ser serê wê û wekî bûkekê dixemilînin. Piştre keçên gund herdu milên bûka derewî digirin û mal bi mal digerin. Gava ku diçine li ber derîyê malekê, hemû bi hev re dibêjin:

Zîp zîp e zîpedar e
Sibat here, Adar were,
Heke bibare bihar e,
Heke nebare xedar e,
Kebaniya çeng zêrînê,
Here kunca malê,
Ji me re bîne rûnê malê.

Kebanî diçe ji wan re rûn, savar û hêk tîne dide wan, piştre hema zû bi zû satilek av di ser wan de dirijîne.

Keçik jî bi ken û bi lez ji wir direvin û diçine li malekê din. Malên gund tev seredorî dikin. Bi dûv re savara bi navê maşkule dipêjin. Piştê savar dixwin, radibin milê hev digirin bîrite dibêjin û govendê digerînin.

AGİRÊ FİLAN

Roja 27'ê sibatê, mêrên gund tev li qada gund diciviyan, her yekî gurzekî dar ji mala xwe dianîn. Agirekî gur vêdixistin, bi saetan li dora agir stranên sivik digotin û govendê digerandin. Li gor baweriya wan, wan gunehên xwe diweşandin. Xwarina wê rojê yê taybet jî kiftê tûtiyan bû. Di mala hemû kesan de ev xawrin dihate pehtin.

SİBATÊ DU ROJ Jİ ADARÊ DEYN KİR GİSKÊ TEHTÊ WER KİR

Tê gotin ku di gundekî de pîrekê pênc, şeş gîskên wê hebûne. Bi xelasiya zivistanê re debara gîskên wê qedyaye. Di dawiya Sibatê de rojekê tav derdikeve û sermaya hewayê dîşkê. Pîrê pê dixape gîskên xwe hildide û dibe li zozanan. Germahiya hewayê lê xweş tê, du roj dimîne û henekên xwe bi meha Sibatê dike. Dibe: “Tirt û tirt sibatokê, derketim adarokê min xwarî gangilokê.” Li ser vê yekê meha sibatê hêrs dibe û ji nişka ve ba û bahozek radike.

Pîrê bi gîskên xwe ve, xwe dispêrin bin tehtan. Ba û bahoz, çar şev û çar roj dom





SALNAMEYA ROJA NU Kamuran Bedirxan 3 Gulan 1943

dike, lê tiştek bi wan nayê. Meha Sibatê lê dinêre ku tiştek bi pîrê û gîskên wê nehatiye. Vê carê meha sibatê ji meha Adarê re dibe: “Xweha min ê Adarê Bide min du rojên xedarê, da ez gîzkê ji ser tehtê bînim xwarê. Sibat ji Adarê du roj deyn dike, şeş şev û şeş roj bager dom dike. Zor û zerpa xwe heta dawî nîşan dide. Heya ku pîrê û gîskên xwe ve dimirin.

GAMÊŞQİRAN

Li gor rîwayetan weha tê gotin: Li gundekî, mêrikekî dewlemend hebûye, çil gamêşên wî hebûne, di nîvê heyva nîsanê de hewa gerim dibe û çêre dide der. Mêrik pê dixape, her çil gamêşên xwe dişîne zozanan. Ji nişka ve ba û bagerek radibe û berfeke gur dibare, gamêş tev qir dibin. Ji wê rojê pêve xwediyê heywanan pêtir hay ji qût û qelatên heywanan mane û ji wê rojê re gotine Gamêşqiran. Ev nav heta roja îro maye.

www.kurdiwork.org

SÎWARÊ GOGERÇÎNÊ TAHIRXANÊ QELENYÊ

MİHEMED ERZURUM

Tahirxanê Qelenyê, bi xwe Heyderî ye û ji Torina "Mala Şero ye" Kurdên Eranê di salên 1889-90 an da cî bi cî li pêşya Şahê Eranê serî hildidin. Şahê Ecem leşkerekî mezin dişîne ser serdarê Kurdan yê bi nav û deng Tahirxané Qelenyê.
Di navbera Tahirxan û Şahê Ecem da şerekî mezin çêdibe...Bi texmînî ew şer, di salên - 1890- 92 da diqewime..
Taxirxan û birayê xwe Emirxan li pêşiya leşkerê Eranê lehengiyeke mezin nîşan didin, Berxwe didin û revê bi leşkerê Ecem dixin,Lê paşê tevî Celalyan gellek beg û eşîrên Kurda yên din ku alikariya leşkerê Şah dikin, Tahirxan têk diçe ew û birayê xwe dîl dikevin destê Şahê Ecem..
Pismamê Tahirxan, "Kor Huseyîn Paşayê Heyderî" bi pênsed sîwarê xwe va erişî İranê dike,berê eskerê Ecem dide û hêla Qelenyê wan deran zeft dike...
Li ser vê bûyerê di navbera Romê û Îranê da alozî derdikeve. Peyra berpirsiyarên herdû dewletan hevdîtinan çêdikin Şahê Ecem "Tahirxan û birayê wî Emirxan berdide. Huseyin Paşa jî ji Îranê derdikeve...

EZÊ Bİ DÎHARÊ QELENYÊ DİKETİM..

Ay de lo looo,de lo lo ,de lo lo,de lo looo...
De lo lo,de lo lo ,ez birindarim biranooo...
Dayê rebenê ezê bi diyarê qelenyê diketim
îro şerê Tarxan e
Birano ca rabin sêr bikin
Li Çiyayê Qelenyê Tarxan bi sê denga li Emirxan kire gazî
Go bavê bavê mino,hêla konani jêr bernede!
Şahê Ecem bira bi eskerê xwe nebe gumane
Nebê eskerê mi girane
Yeqîn bizanibe qetla Şahê Ecem
Li birayé te mîna qetla du mirîşka ne
Ez çibkim,ji éxbala mi ra,li pêşya Şahê Ecem
Ji évarda ketye pêsîra mi koma Celalyan e
lo looo,de lo lo ,de lo lo,de lo looo...
De lo lo,de lo lo ,ez birîndarim biranooo...


Dayê Rebenê,ezê bi diharê Çiyayê Qelenyê diketim ha bi dar e
Ji êvara Xudê da ji Çiyayê Qelenyê tê surekî sar e
Taxima destê apê Zezê, Bavê Cemîlê kîraza welatê jêr e,
imama serî karîbar e
Tarxan bi sê denga li Emirxan kire gazî
Go bira hêla konanî jêr bernede
Em du tayê bi tenê ne
Eskerê Şahê Ecem hezar bi hezar di ser me da hate xare
Şane-şunê Apê Zezê Bavê Cemîlê gellek hene
Berî hezar û hefsed mêrê Ecem daye
Pêşî daxistiye Ava Erez, paşî maye li Gêduka Ebaskendê
Mirata beşliyê di desta da zare zare...
Zezê digo Cemilê merumê,
Mi ji te ra nego deng li kekê mi neke
Bira têkilî şahê Ecem nebe
Eskerê Şahê Ecem giran e,eskerê kekê min hindike
Ez ditirsim tu were pê nikare lo lo...
lo looo,de lo lo ,de lo lo,de lo looo...
De lo lo,de lo lo ,ez birindarim biranooo...
Dayê rebenê ,ezê bi diharê Çiyayê Qelenyê Diketim ro berfekê li me barye mînanî hêk e
Xudêyo tu şewitya Qelenyê xirabkî
îro ji berfê spî dike minanî hêk e
Tarxan bi sê denga Emirxan kire gazî
Go bira, miqat be,hêla konanê jêr bernede
Orta min û Şahê Ecem xira buye
Kesekî xwedanê xêra tunine sulha me çêke
Şuda xweş mêra ku ji xudê da neşixule, gellek zor e
Mirata béşliyê di destê birayê te da kelem daye
Heyfa min nayê bi terşu talanê
Şahê Ecem mervekî bê namus e
Ditirsim tu were erz u eyanê me bibe
Serê me herda jêke
lo looo,de lo lo ,de lo lo,de lo looo...
De lo lo,de lo lo ,ez birîndarim biranooo...

Çavkanî Ahmet Aras

www.kurdiyakurdi.org

Evdelê Zeynê û Şêx Silê

Dengbêj Kerem Behsa Wan Dike



Nihat Gültekin

Herema Serhedê; ji bajarê Makûyê bigre heta Erzurum û Qersê ji wir Muş, Bilîs û Wanê tevahî ra tê gotin. Erdnîgariya vê herêmê zêdetir ji çîya û banîyên zehf bilind zozan û çêrgehên pêz û dêwêr gelî û newalên bêser û binî pêk tê. Li gel van bilind waran bi dengê dengbêjên ji wan çîya bilindtir jî navdar e. Dengbêjên deng zîz û zelûlî. Dengên qasî berfa lûtkeya Gilîdaxê qedîm, qasî ava zozanên Eledaxê û Sînekê zelal û helal. Dema mirov behsa çanda dengbêjiyê bike ew herêm tê bîra mirov. Gelek çavkanî destnîşan dikin ku serkêşîya dîroka dengbêjîya welatê me ji herêma Serhedê pêk tê û mêjûyê wê jî digîhêje hayamên kevnar. Di nav wan demên dirêj da hunera dengbêjiya Serhedê bêyî qut be gîhîştîye roja îro. Di wan taybetîyên welatê Serhedê da ji bo zargotinzanan dengbêjî cihekî girîng digire. Gelek dengbêj hê jî di nava cimaetê da bi taybetî tên guhdarî kirin. Ser dengbêjan hîn jî xebatên hêja yê lêkolînê têne kirin. Silqî serê wan lêkolînên ji tûrê dîrokê gelek tişt derxistine holê û bi rûyê rojê xistine, me gelek tiştên nû jê hînkirine.

Ji dusid salî zêdetir e navê Kurdan û zargotina wan li ser zar – zimanê rêwî, mîsîyonêr, tucar, dîplomat û rohilatnasane. Para dengbêjîya Serhedê di vî warî da cîyekî mezin digire. Ji mêj da hunera dengbêjên Serhedê bala gelek nivîskar û lêkolêrên bîyanî kişandiye. Kesên di serdemên kevn hatine vê heremê û çûne di derheqê gel erdnîgarî û çanda devkî da gelek tiştên giranbiha nivîsîne. Gelek kilamên me yên hatine jibîrkirin û winda bûne silqî serê keda wan camêrên avrûpî careka din li me zivirîne. Navê çend nivîskar û lêkolerên rojavayî di sedsala 19an da hatine Serhedê ev qeyd û nîşe girtine û peyra li zimanê xwe wergarindine evin Thêrêse Albertine L.Robinson(1840), Moritz Wagner (1844), Bodenstedt (1844).Em ji nivîsên wan gelek tiştên kêrhatî agahdar dibin. Nivîskar û lêkolêr Mehmet Gültekin di kitêba xwe da behsa Jaubert'ê yek ji wan gerokane û Qasîdê Napolyon biye dike;" Qasîdê Napolyon ê bi navê Jaubert ku di sala 1905an da bi demek dirêj di zindana Bazîdê da mabû, di bîranînên xwe da dinivîse ku kurd kilaman pir dihebînin û dengê hozanên wan gelek xurt in. Jaubert bi berwamî radigihîne ku dengbêjan li ser bûyerên wek zindankirina wî û mirina mîrê herêmê Mehmûd Paşa ji webayê destanek çêkiribûn."

Di dîroka dengbêjîya Kurdan bi taybetî ya herêma Serhedê da dibistanên dengbêjan hebûne. Di vê derheqê de Mehmet Gültekin kitêba xwe de wiha qal dike; "Hin lêkolerên wek Oskar Mann û Basil Nikitin ji qala hebûna dibistanaê dengbêjan ên berê dikin. Mistafa Xelo Heyran jî bi wan zanyariyên ku wî ji Evdal vergirtibûn şagirtên xwe ên wek Kerem û Mihemede Canşah perwerde kiribûn.." Wek nivîskar -lêkoler Mehmet Gültekin di kitêba xwe da destnîşan dike Evdal şevekê xevnek dîtîye û carekê da nebûye dengbêj.

Gelek caran hatiye nivîsandin Evdal di sî salî ya xwe da xewnek dîtîye û jîyana wî piştî vê xewnê guherîye. Dinya serûbin dibe, ji qirrika Evdal hebên garis dirijin û dibe dengbêj. Gor dîtina min ev ne raste, lê mirov fahm dike ku ew şîrove ji qedirgirtina gel a hember wî tê. Evdal jî weke dengbêjên mayî ji ekola vê hunerê tê. Ew jî di dibistana dengbêjiyê da perwerde dîtîye û ji hostayên xwe bi sedan kilam û destan hîn biye. Piştra di pêvajoya sal û zemanan da kilamên ku wî çêkirine û gihîştine dema me repertuara wî dewlemendtir kirine. Evdal bi Şêx Silê ra li Qeleniya Îranê straye.

www.sivakurdi.org

Gorî lêkolînan Evdal, di sala 1800î de li gundê Cemalwêrdî ya girêdayî navçeya Tûtaxa Agirîyê hatiye dinê. Di sala 1913an da jî mîrateya xwe ya giranbiha ji me ra hîştiye û koça xwe barkirîye. Evdal ji ber çend kilamên xwe yên weke Bavê Temo, Sîyarê Gogerçînê û qulînga birîndar hatiye heskirin û naskirinê. Ji ber ku kilamên qala wan tê kirin zêde bi nav û deng bûne navê kilaman mîna mehlesa wî li ser hatine barkirin.

Evdêl gelek salan li gundê Toprakkale ya Eleşgirê dengbêjîya dîwana Surmelî Mehmet Paşa kiriye. Min li gel Mehmet Gültekin û Sidik Uğurlu di sala 2010 an da serîyek li vê Toprakkale ya navê wê hat kirin dabû. Surmelî Mehmet Paşa kurê Behlûl Paşayê mîrê qesra Bayîzdê ye. Behlul Paşa jî, nevîyê İshaq Paşa yê avakarê qesrê ye.

Merî dikare jiyana Evdêl weke du beşa binirxîne. Beşa pêşîn ji zaroktîya wî hetanî dengbêjîya li qesra Surmelî Mehmet paşa (1850-1865), ya din jî piştî kuştina Surmelî Mehmet Paşa û ji ber bayê samê korbûna herdu çavên wî. Evdalê Zeynikê di nava dengbêjên navdar ên Serhedê da yê herî li pêş e. Di heman demê da serkêşê wan dengbêjên sedsala 19an yê ku hin berhemên wan gihiştîne roja me ye. Mirov dikare bi dilrihetî bibêje hîmdarê dengbêjên herêma Serhedê ye. Nivîskar Ahmet Aras di kitêba xwe ya di derheqê wî da wiha dinivîse;" Evdal ne tenê şaîrekî bi nav û deng û dengbêjekî tekane bûye, ew eynî wextê da destanbêj jî bûye. Bêşik destanên Kurdan yên eyan, beriya Evdal jî kilamkî hatine gotin, lê ewî miqamên nû dane wana û ew li ser qaîde û meqamên xwe sitranê."Evdal gelek cîhên Serhedê gerîyaye. Di jiyana Evdêl da çûyîna dîwana Tahirxan gelek taybet e. Gelek kilam li wir hatine gotin û ew kilamana bi awayê nivîskî gihîştine roja îro. Di vê nivîsa xwe da ez dixwazim bi gotinên dengbêj Kerem çûyina Evdêl a dîwana Tahirxan li pêş çavên xwendevanan raxim. Waxtê Bülent Gündüz û hevalên wî ji bo amadekirina belgefilîma "Jiyana Evdalê Zeynike" hatibûn Bayîzdê jîyana Evdêl zêde bala min kişandibû.

Dema alîkarî ji me xwestibûn em ketibûn nava hewldanê. Me dengbêjên Bayîzdê Rikoyê Heqîyê Mozê, Hasan Tanrıkulu, Mecît Tanrıkulu tev anîbûn Qesra İshak Paşa li hev civandibûn. Li wir ji bona belgefilîmê resitala dengbêjên Bayîzdê hatibû kişandin. Dîroka dengbêjîya Serhedê ya winda bûyî saya dengên wan dengbêjan sed sal şunda bi awayekî bêhempa vehindirîbû ser xwe. Me ew çax du-sê roj bi hev ra derbas kiribûn û ez di wan rojan da derheqê huner û jîyana Evdalê Zeynikê da gelek tiştên giranbiha hînbibûm. Yaşar Kemal, Evdalê Zeynikê weke Homerosê Kurdan bi nav kirîbû. Wê hevokê tesirek gelek mezin li ser min hîştibû ku ez ketibûm nav lêgerînekê. Ji wir şûnda min meraqdarî çi kitêbên derheqê Evdêl da dîtin, hemû xwendin. Di kitêba Ehmed Cengiz Çamlıbel da Eskerê Boyik wiha nêrînên xwe anîbûn ziman;" "Zarotyê da navê Evdalê Zeynê wak çirakê pir şemal ketye dilê min. Oda min hebû…Kalên gund, çirokbêj, dengbêj şevên payîz û zivistanê yên dirêj dihatin, li hev dicivyan şevbihêrya xwe dikirin. Navê Evdalê Zeynê tim dihate li ser zimana. Çi rokê derheqa wî da gilî dikirin, bi kilam û gilîkirin derheqa leca dengbêjyê ya wî û Şêx Silê da digotin, çîroka wî û Gula file, Qeymezê Êzdî û şerê Xozandaxê, kurbûna dengbêj, feqîrya wî û qulingê perşkestî bîr tanîn..Heyf wê demê wek niha mecalên degnivîsandin û xweyîkirina zargotina tunebûn, gel jî ewqas serwext nî bû û kesek jî nedifikirî, ku rojekê bê êdî ew nivşê tunebin, ew çîrok û kilamên wan ê bi wan ra herin, bêne jibîrkirin, qîmet û pêwîstya wan çîrok û kilaman jî wê çiqas dem derbas be wê ewqas mezin be…" Piştî xwendina min bêtir fehm kir ku Evdalê Zeynikê dengbêjek, hilbestvanekî hizkirîye, îro jî berhemên wî alîyê gelek dengbêjan de jî tê xwendinê. Paşê min ser wê xebata Evdalê Zeynikê Bülent Gündüz re hevpeyvînek çêkir û di rojnamê de weşand . Her diçû hezkirina min li ser Evdal zêde dibû. Erê çûyîna Evdal Qesra Tahirxan gelek bala min dikişand. Ji ber ku malbavana dayîka min li Makûya Îranê ye. Dema ez diçûm Makûyê dihatim ji min ra carna qala ciyên dîrokî dikirin. Min carek cihê Serdar li wir ziyaret kirîbû, lê ji dewsa cihê Taharxan tiştek nemabû. Ji ber wê sedemê em neçûbûn.

Ew der 60 km ji Makûyê dûr e. Min dema xwendina xwe li ser Evdêl didomand di kitêba Mehmet Gültekin da rastî agahîya dengbêj Kerem ya derheqê çûyîna Evdêl da daye hatim.

Min ji zûva dixwest nivîsarek wiha binivîsim, lê qismet yê îro biye. Ji ber ku ew çax min di derheqê Şêx Silê û Evdêl da gelek agahî guhdar dikirin. Min dema kilamên Şêx Silê û Evdal dixwendin jî min dixwest ez tiştekî binivîsim. Xêncî kurdên Serhedê, kurdên Kafkasyayê jî gelek kilamên wan berhev kirine û kitêbên xwe de çap kirine . Ev tim û tim di dilê min de mabû.

Di nav dengbêjên Serhedê de dengbêj Keremê Kor jî di nav gel da xwedî cihekî girîng e. Taybetiya Dengbêj Kerem ya herî mezin aliyê wî yê mîzahîye û di stranên wî de jî ev tişt xuya dibe. Dengbêj Keremê Kor li Serhedê li gelek wilayet, navçe û gunda gerîyaye. Cihê ku neçûyê, dera ku pîyê wî lê neketiye nemaye. Kerem li ser Evdal, Şêx Silê û qesra Taharxan wiha dibêje; " ….Diwanê da gelek stira, jê ra gotin;"Evdal tu xweş distirêyî, xazila tu rojekê rastî Şex Silê bihatayî, cika tu zor î ya Şêx Silê;" Ê-go- ew li Îranê, ez li Romê, destê me nagihêje hev." Wan jî xilamek danîn li bal Evdal, ew ji Elaşgirê birêket hatin ji vê Bazîda me ra derbas bûn, ji mala Eyîp Axa, ya Evdal Begê Xelikî ra derbas bûn, êvarekê çûn bûn mêvanê mêvanê Taharxan li Qeleniyê. Qelenî çi ye? Nehiya wî ye. Navê zozana wî çi ye? Elegan e, ciyê ku lê datîne, arkoza wî Qral e. Taharxan li dîwana xwe da bûye, êvare cimeat top dibin, dengbêjên wan jî pir in. Dîwana Taharxan e, heyştê kulavên xuristanî radixistin, hepsa wî jî di bin da bû. Xwarin hat, piştra sinî kişiyan. "Kuro-go(Taharxan)- ewî paşxanê bidine wî mêrikî û ewî hafiz, bira ew bixwin." Nizane Evdal e. De Evdal jî dengbêjê Surmelî Memed Paşa bû, ne yê paşxana ye heyran! Wexta ku dane pêşîyê, go, ez naxwim. "Kuro-go- ew hevalê ti çima naxwe? "Ê-go- walle, hêca me li gundê hanê nan xwariye, madê wî naçe." Evdal kor e, lê zane, paşxanê didinê. Sinî kişîyan, cimaetê destê xwe şûştin, Taharxan go;" Kuro- gazî Şêx Silê bikin, bira warê gula me veke".

Şandine pey Şêx Silê hat. De dengbêjên berê li ser piya distiran, rûnediniştin, na. Yê wî axayî pişta xwe dida wî dîwarî, yê vî dida vî dîwarî. Waxta ku efendim hinekî Şêx Silê stira, Evdal jî diricife mîna şiva li nava avê, şair e, aşiq e. Taharxan go; "Rêwiyê min, kurkê mêvanê delal, ew hafiz çima ûsa dike?". Go;" Walle Xan, tu îzîn bidî, bira ewinga jî kilamekê bêje." "Kurê min -go- dengbêj ba dengbêjê nastirên, devê bavê ti dengbêjan neketiye li cem Şêx Silê bistirên." Ê-go- axa, xan, ez xulamê te me, em devdelçî nînin, nakevine qoşê, dilê wî dixwaze, bira ew jî yekê bibêje. Waxta ku ûsa go, Evdal rabû ser xwe, ê jê ra yekî bibêje, cika çi diêje(…)Şêx Silê go;"Taharxan Beg, eva kî ye?" Go;" Walle nizanim, hafizek e hatiye vira, hêçika nan danê, nan jî nexwar." Xulam dibêje ku ew Evdalê Zeynikê ye. Taharxan dibêje;" Peyî, ew dengbêjê Surmelî Memed Paşa ye, hatiye dîtine min. Zûkin jê ra pezekî serjêkin!" Evdal dibêje; "Xan, heta ez û dengbêjê te têr nevêjin berhev ez tiştekî naxwim." Ûsa destpê kirine kilam avitine ser hev…"

Çawa kilama Evdal û Şêx Silê di nava gel da belav biye, kilama Xozandaxê jî ew qas belav bûyî û naskirî ye. Di sala 1865an artêşa Osmanîyan ya di bin fermandarîya Surmelî Mehmed Paşa tevger û êrîşê dibine ser Kozanoğullarî yên li herêma Edenê. Ji ber ku Evdal hozanê dîwana paşê ye ew jî li gel artêşê tevlî seferê dibe.

Ev şer dibe dawîya desthilatdarîya Kozanoğullarî yên Tirkmen. Ji ber ku ev şerekî gelekî xedare tesirek mezin di dîroka êlên tirk yên li herêmê dike. Li ser wî şerî hozanê ji eşîra Avşarên Tirkmen Dadaloğlu gelek helbestên bi nav û deng ristine. Ji ber ku Evdêl jî şer bi çavên xwe dîtîye ewî jî mîna Dadaloğlu kilameka gelek zelûlî ristîye. Evdal di vê kilama bi navê Xozandaxê da vê trajedîyê radixe ber çavan. Ev kilam hê jî li ser zar û zimanê dengbêjên Serhedê bi awayekî zindî dijî. Evdal di kilama Xozandaxê da wiha dibêje;

"Hazer mêri nebe li Xozandaxê winda neke
Perdê bûka li dar ve neke
Me li welatê Serhedê rûreş neke."

Him di vî şerî da û him jî ji ber ku di dema vegera wan da bayê samê li wan radibe, ji koma Sürmeli Memed Paşa gelek kes dimirin. Dema ku ew li ser riya xwe li cihekî diêwirin Mehmet Paşa bi xwe jî di encama êrîşa ziyakî da tê kuştin. Di pirtûkên bi navê Sicil-i Osmani û Tarih-i Cevdet da jî qala van bûyeran tê kirin. Ji ber bayê samê çavên Evdal kor dibin.

Piştî ku ew vedigerin Elaşgirê bûyereka din a girîng diqewime. Osmaniyan ji bona şikandina bandora malbata Sürmeli Memed Paşa li herêma Elaşgirê qaymeqamek bi navê Çerkez Omer bi cih kiribûn. Piştî mirina Memed Paşa, Çerkez Omer êrîşê dibe ser kurên paşê û gelekî zirarê didin wê malbatê. Ahmedê Mirazî di kitêba xwe da di derheqê bûyerê da wiha dinivîse; "Kurê xwe re bêjim, di Toprakqalê da Çerkez hebûn.

Digotin wextekî padîşahê Ûris ew sirgûn kirine. Hukumeta Topraqelê di destê wan da bûye. Surmelî Mehmet Paşa roj nedida serê Çerkeza. Wexta ku Çerkez caba mirina Mehmet Paşa dibhên, Omer Çerkez, mezine Çerkeza, qaymeqamê Topraqalê ji inyata ra dişîne def û zurne tîne û di hewşa xwe da lêdixe…."

Bi hilweşandina mîrektiyên kurdan ra dema dengbêjan li qesrê mayînê jî dawî dibe. Gelek dengbêjên li Serhedê êdî alîkarên hunera xwe winda dikin. Yên wisa bê xwedî mexdûr dimînin yek ji wan jî Evdalê Zeynikê ye.

Dema serdestîya hunera dengbêjiyê jî êdî bi dawî dibe. Ji ber ku kes alikarîya wan nake û kesên xwedî derfet ku wan biparêzin jî namînin. Evdalê bi herdu çavan jî kor bibû, bi qulingekî baskşkestî ku zarokan ew li bestê dîtibûn mijûliya xwe dikir. Wî di kilamên xwe yê nû da ji kurê xwe Temo daxwaz dikir ku ew jî bo qenc kirina çavên wî û cebirandina baskên quling wan bibe ser li hekîman bigerîne.

Zargotina me kurdan da sê tiştên girîng her dem derdikevin pêşîya me. Welat, gel û ziman. Dawîya





dawî da ez dixwazim bibêjim welatê me yî şîrin, gelê me yî qedirgiran û zimanê me yî qedîm. Divê em wan nola ronahîya çavên xwe biparêzin. Dengbêjên mîna Evdal û Kerem zêdetir nas bikin.
Ez dixwazim nivîsa xwe bi kilama Lê yeman, lê yeman biqedînim. Ev kilam ji alîyê zargotinzan Prof.Dr. Celîlê Celîl va hatiye tomarkirin. Di adara sala 1970yî li gundê Kuçuk Vedî ya li ser nehîya Araratê Ermenistanê ji ber zar zimanê Fatîyêv Hamîd hatiye girtin.

Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tu xiravî

Evdalê Zeynê gotê Şêx Silê;
- Şam ji Helebê berjêrtire, goveka vê dinyayê
Wezê diqîrim, dengê min ketîye, sewta min dernayê,
Wezê bişînim ji torina mala Şero
Dermanekî bînin, bixum, biqîrim,
Dengê mine here qîz û bûkê xelîfê vê Bexdayê.

Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tuyî xiravî

Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tu xiravî

www.arsivakurd.org



Şêx Silê gotê Evdalê lawê Zeynê go;
- Raste, gilîye teye, Şam ji Helebê berjêrtire, goveka vê dine Zozanê Tahar-xan Eleganê hêşîn dikin, xal ketinê,

Go, gelî cimetê ji boy navê Xudê, hûn şahad vin, Evdalî lawî Zeynê kalekî herfifîye, ji Antavê heta vira hatye, ruzîyê xwe naxwaze ji Xudê, dixwaze ji mala Şero dengbêjê torinê.

Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tuyî xiravî

Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tu xiravî

Evdalê Zeynê gote Şêx Sîlê go;
- Bejna min ne kine, ne dirêje
Ta rihana devê gelîya, wextê xweda wê şîn dike, şax avêje

Go, ezê yekê binime serê Şêx Silê heta kurê kura rave, bêje

Şex Silê gote Evdalê lawê Zeynê, go;
Raste, gilîyê teye, bejna te ne kine, ne dirêje
Ta rihana devê gelîya, wextê xweda şîn dike, şax avêje

Go, gelî cimetê, ji boy navê Xudê, hûn şahad vin, Evdalî lawê Zeynê
Kalekî herifiye, ji Antavê heya vira hatîye, ew heye ne dengbêj e
Ewa yek ber devê jina rûnî, qewlik bêje.

Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tuyî xiravî

Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tu xiravî

www.arsivakurdi.org

Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tuyî xiravî

Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tu xiravî

Evdê digote Şêx Silê,
Digo;- Dîdeme, xweş Dîdeme,
Çeman û kanîan tên ser meda xuşe-xuşe, ne welle, leme-leme
Alîkî me yek Rome, yek Îrise, yek Eceme
Go, dengê min qewale, zar êmin qeleme
Yêk çoka xwe kutaye çoka Evdalê lawê Zeynê, ew heye Aşiq Kereme
Dimîne li welatê eceme.

Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tuyî xiravî

Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tu xiravî

Şêx Silê gote Evdalê lawê Zeynê go;
- Zozanê me heye wê Elegane
Fzêda rê û dirbin, binîda kalûskê ecemane
Gelî cimetê, ji boy navê Xudê, hûn şahad vin,
Evdalê lawê Zeynê kalekî herifîye
Ji Antavê heta vira hatye
Ezê îro yekê bînime serê Evdalê lawê Zeynê, bira neyê serê gurê çîyane.
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tuyî xiravî

Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tu xiravî

Evdêl gote Şêx Silo, go;
- Gelî cimetê! Ez neyi kalim, zozanê me hene Elegane
Fêzêda rê û dirbin, binîda kalûskê ecemane
Par vî çaxî, li gundê me dewat bû,
Ezê ji Hesepêda ketibûm
Ji pêşîya devê min firîya bûn cot dirane loma
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, lê yeman, lê yeman
Lê yeman, zemano, tuyî xiravî

Çavkanî

** Mehmet Gültekin, Zargotina Kurdên Serhedê, Weşanxana Avesta,*
** Ahmed Mirazî, Bîranînêd Min rûpel Weşanxana Deng rûpel 63-64*
** Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl- Zargotina Kurda 3, rûpel 441-442-443-444*
** Ahmet Aras Evdalê Zeynikê Şairê Kurda yê Efsanewî rûpel 16, Weşanxana Nûbihar*
** Ehmed Cengîz Çamlibel, Evdalê Zeynîkê, rûpel 6-7, Weşanên Deng*
** Arşiva min 27.06.2010 100 Yıl Sonra Ez Evdalım- Rojnama Yeniözgürpolitika*
** https://www.bernamegeh.org/2019/06/19/belgefilme-evdale-zeynike-temase-bike-kurtce-belgesel-izle/*




Neynik û çavên xwezaya jiyanê: Krzysztof Kieslowski

Rûmet Med

"Hez bisemax e, Hez dilovan e. Hez her tiştî tîne û hêvîdar e. Hez qet xelas nabe..."*

Ji destpêka sînemayê bi vir de li seranserê cîhanê, heta niha bi hezaran fîlman hatine kişandin û 'Hunera Heftemîn' ango sînema gelek derhêner û lîstikvan û xebatkarên sînemayê afirandine. Sînema, di sedsala 21'emîn de geşedana xwe bi bandorê zanist û teknolojîyê geştir û xurttir dike. Di dîroka sînemayê de gelek rêbaz û cureyên fîlman derketine holê û sînemagerên serbixwe jî ji aliyekî fîlmên xwe dikişînin. Di vê pêvojaya geşedana sînemayê de gelek derhêneran mohra xwe dane li dîroka sînemayê û yek ji wan jî derhênerê navdar Krzysztof Kieslowski ye.

Dema ku qala derhêner û senarîstê navdar ê Polonî Krzysztof Kieslowski tê kirin, pêşî fîlmên wî yên wekî, "The Double Life of Veronique" (1991), sêbareya; "Theree Colors: Blue" (1993), "Trois Couleurs: Rouge" (1994), "Theree Colors: White" (1994) û fîlmên televîzyonê ya bi navê "Dekalog" ku weke 10 beşan hatibûn kişandin, tên hiş û bîra mirovan. Sînemavanê navdar Krzysztof Kieslowski, hem helbestvan û çîrokbêjekî jidil û hem jî fîlozofekî nûjen e.



Derhêner Krzysztof Kieslowski di sala 1941'ê de li serbajara Varşovaya Polonyayê hatiye dinê û perwerdehiya xwe, yek ji dibistanên sînemayê yên herî girîng ên Ewropa û cîhanê, 'Dibistana Fîlman a Lotzê' xwendiye. Bi kişandina belgefîlman dest bi sînemayê kiriye û gelek belgefîlmên rastîbîna civakî yên wekî "Bylem Zolnierzem"" (digel Andrzej Titkowî,1970), "Fabryka (1971), "Workers" Nothing About Us Without Us" (1971), "Murarz " (1973) û fîlmên xwe ya bi navê "First Love" (1974) ku ji nîv belgefîlm û nîv pevxistinê pêk tê, kişandine. Di van fîlman de qala rewş û mercên jiyanê û takekesiya di nava civakê de kirine. Derhêner, digel Krzysztof Zannusi, Edek Zebrowsk, Agnieszka Holland, Andrzej Wajda re tevgereke sînemayê ya bi navê "Sînemaya Şayîşên Rewiştî" li dar xistin û ev tevgera sînemayê, fîlmên ku armanca wan hêzdarkirina hiş û bîra cîvakî ne, kişandin.**

Derhêner Kieslowski, di sala 1976'ê de belgefîlmê xwe ya "Szpital" (Hospital) û piştî salekî jî belgefîlmê "Z Punktu Widzenia Nocnego Portiera" (1977), kişandin. Bi fîlmê xwe ya "Camera Buff (Amator, 1979) re li bernameya Festîvala Fîlman a Moskovayê xelata Mezin girt û li seranserê hat naskirin. Fîlmê wî ya "Bilind Chance" (1987) di dema derbeya leşkerî de hate qedexekirin û ev fîlm piştî 6 salan derket li pêşberî sînemahezan.

Derhêner, bi demê re baweriya xwe yên bi sîyaset û guherînê winda kir û jê dûr polîtîkayê bû, dest bi kişandina fîlmên takekesî kirin.*** Krzysztof Kieslowski, di navbera 1988-1990an de ji bo televîzyona Polonyayê projeyeke bi navê "Dekalog" amadekir û ev rêzefîlma ku 10 beşan pêk tê, gelek eleqe dîtin û îlhama xwe ji "10 Ferman"ê girtiye, û bêrengî û bêruhiya rewşên cîhana nûjenê nîşanî dide. Di vê demê de li welêt û cîhanê qeyraneke aborî hatibû qewimîn û rewş û mercên jiyanê dijwar bû. Derhêner, bi van fîlman re temaşevanan, jê dûr temaşekirina fîlmên polîtîkayê girt.***

www.kurdi.org

Şert û mercên jiyanê bandorê li ser hiş û bîra mirovan dikin. Rewşenbîr û ramangerê mezin Karl Marx jî dibêje ku "Ji ber ku, tiştê ku teşe dide mirovan mercan in. Divê şert û merc bi awayekî herî mirovî bête avakirin. A rastî derhêner Kieslowski wekî Andrei Tarkovskyî baweriya xwe yên bi guherîn û veguherînê windanekir û bi tenê nerîna wî ya hunerê guherîbû û di hunera xwe de bi awayên cuda û resen afirandibû. Baweriya guherîn û dîyalektîkê, di replîkeke ya beşa 8. a "Dekalog"ê (1989) de jî xwe dide der, "Şert û merc dibin sedema derketin holê ya qencê an jî xirabê (nebaş). Kieslowski, beşên 5 û 6. a "Dekalog"ê weke fîlmên sînemayê jî amadekirin û fîlmê "Krótki Film O Zabijaniu" (Dekalog 5., 1988) li Festîvala Fîlman a Cannesê Xelata Fîlmê Baştirîn û Xelata Taybet a Jûriyê standin. Di fîlma xwe de qala mijara tundî kir û ruh û rewşa kesên ku bêhez hatine mezinkirin nîşanî temaşevanên sînemayê kir. Piştî vê fîlmê derhêner, bi fîlmê xwe ya "A Short Film About Love" (Dekalog, 1988) re Festîvala Fîlman a San Sabastianê careke din jî Xelata Fîlmê Baştirîn girt û di fîlmê de qala mijara diyardeya evînê kir.

Di navbera salên 90'an de pirsgirêkên aborî û polîtîk wekî hemû qadên jiyan û hunerê bandorê li sînemayê jî kiribû. Krzysztof Kieslowski, di vê dema nediyar de, fîlmên xwe yên nû, bi çêkeriya Fransayê kişandin. Derhêner, di sala 1991'ê de fîlmê xwe ya navdar "The Double Life of Veronique" û di navbera salên 1993-94an de sêbareya xwe yên; "Theree Colors: Blue", "Trois Couleurs: Rouge", "Theree Colors: White" kişandin. Derhêner, îlhama sêberaya xwe ji rengên ala Fransayê girtine û di her fîlmekî de, qala rêmaneke cuda dike; rengê "Şîn" azadî, "Spî" wekhevî û "Sor" biratî ne. Fîlmê "The Double Life of Veronique" (1991) jî mîna fîlmên din ên derhêner Kieslowski, di atmosfereke bêhempa û derasayî de diqewime û qala çîroka rastîhevhatinekê dike û di fîlmê de bikaranîna ronî, muzîk û rengan, wekî sêbareya "Sê Reng"ê balkêş û bandorker e.

Li gor derhênerê navdar Krzysztof Kieslowski'yê, derhênerên cîhanê yên wekî; Ken Loach, Orson Welles, Federico Fellini, Ingmar Bergman û Andrei Tarkovsky derhênerên mezin in û bandorê li nivîskarên wekî William Shakespeare, Dostoyewskî û Kakfa'yê de maye.***

"Bi vî rengî, tiştên ku dimînin; Bawerî, hêvî û hez in. A ku ji van herî raser Hez e..."*

Di fîlmên Krzysztof Kieslowski de, ziman û dîmeneke helbestkî berbiçav e û bîkaranîna ronî û muzîk û rengan cihekî girîng digirin û wî çîrokên jiyanê yên cuda û resen afirandine. Krzysztof Kieslowski temaşevanên xwe derdikeve rêwîtiyeke bêhempa û di nava kolanên xwezaya jiyanê de digerîne. Derhêner, deng û rengên jiyanê bi awayekî alegorîk û helbestkî dide der. Çîrokên wî wekî xewneke aram û spî diherikin, û hest û ramanên ruha mirovahiyê nîşanî temaşevanan dikin. Kieslowski, di fîlmên xwe de gelek îza û zehmet kişandine û wateya çêkirina fîlman, di hevpeyvîneke xwe de wiha eşkere dike, "Çêkirina fîlman tê wateyê ku divê mirov her roj saet 6ê de rabe. Tê wateya sar, baran û herî; tê wateya barkirina malzemeyên giran ên ronî.."****

Derhênerê navdar Krzysztof Kieslowski, bi van fîlmên xwe yên dawîn, di heman demê de zimaneke felsefîk jî afirandine û li ser rewşên sar û bêruhiya cîhana nûjenê sekinîne û gotiye ku li jiyanê bi têne bawerî û hez û hêvî dimîne. Derhêner, bi van fîlman li seranserê cîhanê pirrtir hat naskirin û mohra xwe da li dîrok û hunera sînemayê. Sînemavanê mezin Krzysztof Kieslowski di sala 1996'ê de ji ber qeyrana dil jiyana xwe ji dest da.

Çavkanî:


https://tr.wikipedia.org/wiki/Krzysztof_Kie%C5%9Blowski

https://www.imdb.com/name/nm0001425/

** Ji fîlma "Theree Colors: Blue" (1993)*

, ***, * "Dünya Yönetmenlerinden Sinema Dersleri", rûpel: 79, 83, 82. Amadekar: Rıza Oylum. Başka Yerler Yayınları.*

"Kieslowski" - Slavoj Zizek. Encore Yayınları.



LATİF EPÖZDEMİR

HAL Û MERC

Cana hela dêna xwe bidê li her der serhildanek bêdeng
Dîsa yeqîn êş û eleman dorpêç kirîye vê Gerdûnê.
Lewraye Gûlşelîl û Leylûper di xewê de mane dereng
Ne dilşa û şadane di xemê ,melûle dara Zeytûnê.

Teyir û tûr, rûhber û ajal di biharê mehtel mane
Ka gelo çima ewqas maye sitûxwar kûlîlka Beybûnê?
Berfîn û Nêrgiz digel Sosinê,wê rojê rabûn pîyane
Di roja xîretê de, bune pişteva di sengerê hebûnê.

Eger naxwezî li ser singê xwe,hergîz pî û reşpotînan
Li çar alî,di çar werzan;ji nû aj bide tu jî ,hebûnê.
Ma heq, ji te re jî ne heqe,bêpar mayî ji azadîyan.?
Ez ezî na, lê, yekîtî vedike derîyê serxwebûnê..

Binêre li kû? erd û axa kî kirne çar perçe bê riza.?
Sazûmanek bê însafe ku berê te daye tûnebûnê ,
Êdî bese,heta kengê serî xwarkî li ber mûariza?
Jîyanek serfiraz mafê te ye,ne tirse ji zanebûnê.

Bab û kalan ,bi salan te hiştine bê paytext û bê ala
Mixabin serketî nebûne bo pêkanîna hevrebûnê,
Were tu ey bira, ne beze li dû xeyalên pûç û vala
Mirazek bihêle ji bo zarûkan sedem bi bîrnebûnê.

Beralî bike mafên biçûk,wek Xanî mezin bifikire
Bila bi keda te kuta bibe dewra şer û pevçûnê,
Nav xîreta axa Kurdistanê serê xwe bilind bigire
Ku hergav kef û şadî bistîne dil,ji hinav û derûnê.

www.arsivakurdi.org

FEZA ÇI YE?

Kurdî Space

Ji aliyê zanista astronomiyê ve feza, ji ser rûyê erdê 100 mîlango nêzîkî piştî dûrahiyeke 100 kîlometriyan destpêdike û êrdimeke (cih) sêberî ye. Ev dûrahî li gor bilindahiya parastina rêgehan hatiye hesab kirin ku peykên ji aliyê însana ve hatiye çêkirin û keştiyên fezayê bikaribin bêyî ketina atmosferê rêgehên xwe biparêzin. Hin zanyar fezayê wek bêbiniya ku bi her aliyê ve fireh dibe qebûl dikin, hinek jî sînorê wê kifşe dikin.

Di Derbarê Fezayê de Agahiyên Ecêbtir: * Ji ber ku em bikaribin cismeke asmanî wek gerstêrkek qebû bikin divê sê şertan bîne cih. Ev: 1. Divê ji ber girseya xwe xwediyê şeklekî giloverî (kûrewî) be. 2. Divê xwediyê rêgehekê diyar a li dora stêrkekê be. 3. Divê li ser rêgeha wê, ji xeynî wê gerstêrk û cismeke asmanî nebe. Di Rojbendê de Heyşt Gerstêrk Henin. Heya sala 2006an, di rojbendê de hebûna 9 gerstêrkan dihat qebûl kirin.

Lê Yekîtiya Astronomiyê ya Navnetewî Plûtonê ji nav vê senifandinê derxistin. Plûton xwediyê şeklekê gilover (kûrewî) ye û rêgeha xwe ya li dora tavê di 248 salan de temam dike. Lê ji ber ku di rêgeha Plûtonê de ji xeynî wê cismên asmanî yên din jî henin wesfa xwe ya gerstêrkiyê dest dide. Li Venûsê rojek beramberê 243 rojên dunyayê ye. Gera xwe ya li dor tavê jî di 244 rojan de digere. Her weha zivirîna Venûsê an jî bi kurdî Gelawêj ya li dor xwe, li gorr zivirîna dunyayê gelek hêdî lê li gor zivirîna li dora tavê gelek bilez e.

Girseya tavê di nav pergala tavê de xwediyê girseyeke ji sedî nod û neh e. Wek mînak; heger dertefa we hebûya we dikaaribû yek milyonek dunya di nav tavê de bi cîh bikira. Ji bo kesên ku dixwazin bejna xwe dirêjtir bikin, feza derfetên zêdetir pêkkêşî wan dike. Ji ber ku raskêş tune ye zora li ser marîpişt radibe. ji ber vê navbera marîpişt fireh dibin, di hawira fezayê de bejna mirovan bi qasî 5 cm dirêjtir dibe.

Gerstêrkên di rojbendê de ji bo jiyana mirovan xwediyê şert û mercên gelek neyînî ne. Wek mînak; li Neptûnê ba di saetê de digihîje leza (lezeke) 160 kîlomîtroyan. Di valahiya galaksiyan de germahiya fezayê -273 pêlik e. Li Venûsênava rojê germahî heta 500 pêlikê diçe. Di gel vê hûn dikarin li bin baranê asîdên sulfrîk, xulekên romantîk derbas bikin (!).

Di rojbendê de gerstêrka ku herî germ, ne ya herî nêzîkê tavê ye. Gerstêrka ku herî nêzîkî tavê Merkûr e û rûyê wê ya aliyê tavê nava rojê heta 425 pêlikan germ dibe. Lê belê êvaran germahî heta -180 pêlikan dikeve. Lê Venûs her çi qas li gor Merkûrê ji tavê dûrtir be jî. Ji ber taybetiya keşûbaya xwe germahiya wê ya nava rojê heta 500 pêlikan derdikeve. Peyva "astronotê" ji astrona Yunanî tê. peyva astronê jî tê maneya deryavan.

Peyva Nebûla jî bi latînî ye û di maneya ewrê de tê bi kar anîn. Nebûla ew tiştin ku bi alîkariya vejena ronahiyê tên xuyanê û ji ewrên gaz û xubarê pêk tên. Bi saya nebûlayan stêrk û sîstemên pergal nû ava dibin. Germahiya komeke (ewreke) nebûlayê digihîje heta 15 hezar pêikan. di fezayê de dema du mertal li hev bikevin bi awayê kewakirî bi hev ve dizeliqin. Ji bo vê bûyerê kewakirina sar tê gotin û li dunyayê jî ji bo hin teknîkên hilberînê tê bi kar anîn. Kewakirina sar, ji ber taybetmendiya atmosferê li dunyayê pêk nayê. ji bilî vê, dema keştiyên asmanî ji atmosferê derdikevin nihamek ji oksîtê li ser wan pêk tê û her weha kewakirina sar nayê dîtin.



www.kurdi.org



Camida ku bi destê însanan ve hatiye çêkirin û herî dûrê dunyayê, di sala 1977an de ber bi fezayê ve bi navê Boyager 1 û Boyager 2 hatiye pekandin. Keşyiya fezayê ku bi navê Boyager 1, di sala 2005an de ji sazûmaniya tavê derketiye û ji tavê bi qasî 19 mîlyar kîlomître dûr ketiye. Keştiya fezayê, boyager 1, xwediyê plaqekê ye û di vê plaqê de agahiyên ku dunyayê dide nasîn hene. Ev plaq di nav xwe de gelek wêne û dengan dihewîne. Bi 55 zimanîslav û hêvîdariyên (xwestekên) baş lê bar kirî ye. Her sal heyv ji dunyayê 4 cm dûr dikeve.

Her çi qas ev dûrî wek tiştek biçûk xuya bike jî di nav salan de (piştî dûrahiyekê) tê texmîn kirin ku di encama vê dûrahiyê de li ser avhewaya dunyayê gelek bandorek xerab dê pêk were. Lê li gor zanyaran, heyv tu caran bi tevahî ji dunyayê dûr nakeve.


Dîsa li gor zanyaran heger heyv tune bûya di behran de keşûvekêş pêk nedihat, dirêjahiya rojan yê cuda bûya heta li dunyayê însan jî qet yê nebûna. Bi mirina stêrkan ve çalereş derdikevin holê û ji ber rewşa xwe yên nexuya, însanan di meraqê de dihêlin. Ji ber ku çalereş xwediyê rınahiyekê nîn in yek e yek bi çavan nayên dîtin.
Çalereşan bi teleskopên xwedî amûrên taybet ve em dikarin kifşe bikin. Wekî din jî em hebûna çalereşan li gor rewşa madeyên der û dora wan jî dikarin tespît bikin.

Çalereş dibe ku biçûk an jî mezin bin. Li gor zanyaran çalereşa herî biçûk qasî atomekê ye. Her çi qas ev çalereşa qasî atomgirseya wê ango madeyên ku hundur de, beramberê girseya çiyayekî mezin e. Ji çalereşa herî mezin ku tê zanîn re "girseya super" tê gotin. Girseya vê çalereşê beramberê girseya 1 milyonek tavê ye. Di fezayê de rewşa berakêşiyê ji bo tenduristiya mirovan gelek xerab e.
Di hawira bêrakeş de hejmara şaneyên xwînî yên sor kêm dibin û ev jî dibe sedema bêxwîniyê. Ji ber ku yê jêbexşiya kesan bikeve rewşeke xerab, birîndarbûn jî yê derengtir baş bibin. Her weha hêza bingehîn ku hem li dunyayê hem jî li gerdûnê pergalê pêk tîne rakêş e.

Ji bo ku tav germahiya xwe bikaribe biparêze pêwistiya wê bi gaza hîdrojenê heye. Lê hîdrojena ku di tavê de heyî bêdawî nÎn e. Di dawiya dawî de gaza hîdrojenê yê di tavê kêmtir bibe û yê hevkêşeya germahiyê xerab bibe. Di rewşeke weha de yê germahiya tavê bêhtir zêde bibe û di encamê de yê bigihêje asteke wisa ku atmosfera dunyayê li ber bişewite. Bi îhtimaleke mezin vê bûyerê hê çend hezar nifşê me jî nabînin. Agahiyên ku em di derbarê gerdûnê de zanin gelek kêm in.

Ji xeynî texmîna sînor, regendî, destpêk û encama gerdûnê em nikarin pêş ve herin. Li gor zanyaran agahiyên ku em heta niha gihîştinê xwedî pareke ji sedî pênc e. Ango li hemberî me pareke ji hêz û tarîtiyê, sedî nod û pênc pêk tê heye ku me ew hê keşf nekiriye. Ango em li ser gerstêrkeke wisa de dijîn ku li gerdûnê bi qasê serê derziyê jî nîn e. Ji xeynî vê di vê gerdûnê de û li ser rûyê erdê mirovên ku wek zereyek toz jî xwedî cih nîn in, xwe wek tişta herî girîng dihesibînin.

Her çi qas mirov xwe ev çend piş jî bike, li hemberî gerdûnê xwediyê tu maneyê nîn e. ji niha pêve hemû mirovahî di heman demî de bi qîrîn û zarîn tune bibin (helak bibin) tu bandor li ser gerstêrka herî nêzîk jî nake.



www.kurdishakuri.org

TEKNOLOJÎ HÛNERA HEMDEM DIAFIRÎNE

Hogir Ar

Tevî ramana têkiliya teknolojî û hunerê, eşkere ye ku teknolojî ji namzetên ciwan re cîhanek nedîtbar pêşkêşî dike, cîhê xwe diafirîne, û derfetê dide ku

sînoran bikişînin.
Mîna ku di demên kevnare de, nûbûn û kifşkirinên ku bandorê li ser afirîneriyê dikin, ku bertekek aktîf a dema nûjen e, beşek ji xwezaya hunerê ye ku dê

tu carî neguheze.
Pêdivî ye ku em qala dermankirinê yên ku bingeha hewldanên xwe yên dîjîtal ên afirîner ên li ser teoriyên konseptê nagirin jî binav bikin lê ji bilî vê yekê

biryar didin ku balê bikişîne ser visualên pak û estetîkên ecêb.

Hûnera Dijîtal

Hunera dîjîtal; em bi bingehîn dikarin wê wekî formek hunerê ku berhemên ku bi bikaranîna teknolojiyên dîjîtal hatine afirandin, wê diyar bikin. Gava ku

em amûrên ku destûrê didin cewherê bêsînor ên huner û teknolojiyên dîjîtal ku hûn xeyal bikin hilberînek aqilmend bi organên dîjîtal re çêbikin, hunerên

dîjîtal derdikevin holê, Hunera dîjîtal bi hêmanên hunerî yên kevneşopî, komputer û bernameyên cuda yên computer têne çêkirin. Ew ji ber ku ew

celebek hunerî ya bêhempa ye û ji bo afirîneriyê dimenek nû derxistiye holê gelek bêrehm û balkêş e. Bûyera vedîtinên wênekêşiyê yên di sedsala 19-an

de zayîna hunera dîjîtal tê hesibandin. Hunera dîjîtal, ku di salên 90-an de dest bi pêşveçûnê kir, niha taybetmendiyek înteraktîf, tevî temaşevanan,

bidestxistiye. Bi vê taybetmendiyê re, temaşevanan bi têkiliya xebatê re, dest bi ezmûnên cihêreng kirin. Li gorî pêşkeftina teknolojiyê, nûbûnên

pêşkeftinê di hunera dîjîtal de dest bi afirandinê dike.







www.kurdishakuri.org

Bernamegeh

Dergehê Kurd û Kurdewariyê





























www.kurdiva.org